

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatolîyê

bîrnebûn

hejmar 79 | 2020



bîrnebûn

ISSN 1402-7488

Tidskriften utkommer 3 nummer per år.

Çar mehan carekê derdikeve.

Utges av Apec Förlag AB

hejmar 79 / 2020

Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi

Editor: Ali Çiftçi, Seyfi Doğan, Muzaffer Özgür

Koma hevkarên vê hejmarê

Ali Çiftçi, Adem Akat, Altun Başaran, Abdulkaki
Xalisinan, Seyfi Doğan, S. Erdem, Mûlla Evîndar,
Mem Xelikan, Nuh Ateş, Ehmed Milan, S. B. Xell,
Îhsan Türkmen, Mehtab Îdeli, Xizan Şilan,
Hesenê Metê, Seyîdxan Anter, Bêrivan Keskin,
Rohat Alakom, Hızır Akbina, Cutyar T. Hawramî,
Rojvan Enes, Sevim Güvren, Ferîdun, Remzî Kerîm

Adress

Navnîşana li Swêdê

Box: 8121,

SE 163 08 Spånga/Sverige

E-post

info@apetryck.se

Internet:

www.birnebun.eu

Belavkirin / Distribution:

Ewropa: Muzaffer Özgür

Birnebûn

Postfach 900348, 51113 Köln / Almanyay

Tfn: 0049-172 298 24 51

Türkiye

İstanbul

Selahattin Bulut/Medya Kitapevi

İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Biha/Pris:

Europa: 5 Euro

Türkiye: 10 TL

Abone ji bo du salan

Swêd: 400 SEK -Almanya 50 Euro

Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

Numra kontoya li Swêdê:

(Birnebûn) bankgiro: 402-2224

Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê

APEC, "Birnebûn" Bankgiro-Stockholm/Sweden

BIC/SWIFT: DABASESX

IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874

Çap / Baski: Apec-Tryck AB



Foto: Dick Petterson

Du keçên kurdên ji Anatoliya Navîn, ji Heymanê, xwargên bi navê Şilan û Minge Yaşar ji destên Gûnnel Mogârd gula werdigrên. Gûnnel Mogârd wê demê, 1991an de li Uppsalayê şefê bîroya xeriba ye.

Dî meha nîsana 1991an de kurdên li bajarê Uppsalayê, li Swêdê ji bo piştgirîya serhildana kurdên başûr li hember zilma Saddam Huseyn û protestoya li hember bêdengîya welatên Ewropayê çalakîya birçîbûnê kiribûn.

Wênayê berga pêşin: Gula Îbê, 1958an de vefat kiriye.

Wênaya pergê paşin: Ji Cankiriyê, gundê Agzibüyük, 1944

Ji arşîva Dr. Fikret Yıldız

Her nivîskar berpîrsê nivîsa xwe ye.

Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Birnebûnê re tîn, sererast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan nayên vegeandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û

Komela Zîman li Almanayê piştgirên kovarê ne.

Naverok

Ali Çiftçi, <i>Ji birnebûnê</i>	4
Mala Me li Baselê vebû	5
Mekteba Şemiyê li Stockholmê li belediya Botkyrkayê vebû	6
Sevim Güven <i>Ditinên min li ser Mekteba Şemiyê li bajarê Stockholmê</i>	6
Ali Çiftçi, <i>Mektebên rojên şemîyan</i>	9
S. Erdem, <i>Navên navlêk</i>	12
Rohat Alakom, <i>Sînega Êzdiya</i>	17
Îhsan Türkmen, <i>Colo -5</i>	32
Mem Xelîkan, <i>Gili</i>	37
S. B. Xell, <i>Zewac û dawet</i>	38
Seyidxan Anter, <i>Ramana, wêje û du lingên pînika mirîşkan</i>	41
Ehmed Milan, <i>Ji çarinên Omer Xeyam</i>	44
Mem Xelîkan, <i>Kilamên me-5, Birtî</i>	47
Adem Akat, <i>Dil bi birin im Zezê</i>	50
Mûlla Evîndar, <i>Singê te, Dil ma bi tenê</i>	51
Mûlla Evêndar, <i>Dar bêkok, kok bêax nabe "Şêro"</i>	52
Hızır Akbîna, <i>Baqo û "Halkın Yolu"</i>	54
Cutyar T. Hawramî, <i>Memdûh Selim Begê Wanî</i>	56
Nuh Ateş, <i>Gur û heft karik, çirokeke almanî ji yên Grimm</i>	62
Mehtab Îdelî, <i>Di kurmanciya Anatoliya Navîn de guherîna zayenda navan</i>	65
Seyfi Doğan, <i>Qerfê û Quto</i>	69
Xizan Şîlan, <i>Ey mirov!</i>	70
Berîvan Keskin, <i>Wunda</i>	72
Ferîdun, <i>Henek/Yaranî</i>	73
Rojvan Enes, <i>Ji malê dût</i>	74
Seyfi Doğan <i>Were komê</i>	75
Altun Başaran <i>Şare, Fata Xelê</i>	76
Göran Tunström, <i>Jimmy Tulpan - werger: Hesênê Metê -</i>	78
Abdulkâî Xalîsînan, <i>Kovara Birnebûn</i>	84
Remzî Kerîm, <i>Quncikê şagirtan, Tiyatro, Xostin</i>	85

Ji bîrnebûnê

Sala 2020an bi Covid-19an dest pê kir, xuya dike ku em ê bi vê metirsiya pandemiya covid-19an dawîya salê ji bînin.

Divan mehên payizê de ev enfeksiyona covid-19an bi lez zêde dibe. Ew ji li ser însanan rewşeka aloz û dijwar peyda dike û jiyan normal a rojane tê guhartin.

Ji ber vê yekê hewce ye em şiyar bin li hemberî vê enfeksiyonê, ne tenê ji bo demeka kurt, ji bo tenduristî û hêza derûnî û giyanî ya demdirêj.

Heta niha ji ber vê pandemiyê li seranserê dunyayê, pir insan telef bûn, ji me jî nas, dost û hinek kesan merivên xwe yên nêz wenda kirin. Roj tune ye ku em li ser medya sosyal xeberên mirinê nexwînin!... Ji peyamnivîsîna sersaxiyê êdî insan bêzar bûne! Hêvîya me ev e ku rojek pêş de ev aşiyên ku niha peyda kirine dest pê bikin da rê li ber vê pandemiyê bêt girtin.

Herçiqas ev metirsi hebe jî, jiyan bi şînor be jî, berdevam e. Li Swîsreyê, li bajarê Baselê insanên ji gundê Kelhasan di vê dema pandemiyê de hatin ba hev û ji xwe re bi navê “Mala Me” cîyek vekirine ku wek malbatî di şîn û şahiyên xwe de bîn ba hev.

Li Stockholmê bi navê *Mekteba rojên şemîyan* mekteba kurdî hat vekirin. Sevîm Güvenê bi sernivîsa *Dîtînen min li ser Mekteba Şemiyê li bajarê Stockholmê* dilşahiya xwe pir xweş nivîsiye. Mala wê ava! Em bi hêvî ne ji vira ha carina ji kovarê re, bi vî zarê xwe yê xweş nivîsan binivîsîne. Hewcedariya kovarê bi kesên ciwan, ji nesla duyem ên bi fikir û dîtînen nû kovara me dewlementir bikin, heye. S. Erdem, bi sernivîsa *Navên navlêk*, Rohat

Alakom lêkolîneka li ser *Sînega êzdiya*, Îhsan Turkmen bi rêzenivîsa *Colo-5*, S. B. Xell ji erf û edetên me *Zewac û dawet* lêkolînek, Seyidxan Anter ji bo bibîranîna seydayê Cîgerxwîn, bi sernivîsa *Raman, wêje û du lingên pînika mirîşkan*, nivîsandîye. Ehmed Milan ji çarînen Omer Xeyam werger ji farisî bo kurmacî kirîye.

Mem Xelîkan rêzenivîsa xwe ya San kilameka ji gundê Omê ya bi navê *Birtî* bi pêşgotinekê şîrove kiriye.

Cutyar T. Hawramî di derheqê *Memdûh Selîm Begê Wanî*, Mehtab Îdeliyê *Di kurmancîya Anatolîya Navîn de guherîna zayenda navan*, Xizan Şîlan pexşanek bi navê *Ey mirov!*, Ferîdun henek/*yanî*, Abdulkakî Xalisînan, Seyfî Doğan, Adem Akat, Berîvan Keskin, Rojvan Enes, Mûlla Evîndar bi helbestên xwe, Hızır Akbîna bi sernivîsa *Baqo û Hal-kın Yolu*, Nuh Ateş bi wergera çîrokeka almanî ji yên Grimm, *Gur û heft karik*, Altun Başaranê bi *şare*, Hesenê Metê bi wergera kurteçîrokeka ji Göran Tunström a bi navê *Jimmy Tulpan* ji swêdî bo kurmancî, ev hejmara dewlementir kirine.

Me bi navê *quncika şagirdan* quncikeka nû ji bo şagirdên ku dersên kurdî werdigrên vekirîye. Remzî Kerîm berhemeka ji 12 şagirdên ji kurmancên Anatolîyê, ji gundên Omera, Celebê, Încovê û Bulduxê ji sala xwendinê ya 2016-2017an bûye, bi sernivîsa *Tîyatroy Xostin* bi kurtenivîseka ronîkirinê amade kirîye.

Bi hêvîya ku hûn ê xwe û kesên din ji vergirtin û belavkirina coronayê biparêzin, bîmînin di xêr û xwaşiyê de!

Alî Çiftçî

Mala Me

li Baselê di despêka payîza 2020an de vebû



Hevkar û komîta karger

Bi navê *Verein Kelhasan, Mala Me* li Îsvîçrê, li bajarê Baselê însanên ji Kelhasan ji bo şîn û şahîyên xwe di 5/09-2020an de lokala xwe bi şênahîyekê vekirin.

30 sal berê bi navê **Cenaze Fonu** ji bo ku cenazeyên mirîyên xwe bibin li welêt defin bikin, alîkar bin fonek ava kiribûn. Bi hevkarîya vê fonê û **Waqîfa Piştgirîya Kelhasan, KDF** (Kelhasan Dayanışma Fonu) lokala xwe vekirine. Bi vê hevkarîya pîroz êdî maleka kurdan hat vekirin.

Ji vira ha ne hevce ye ji bo şîn û şahîyên xwe li ber derîyê kesên din bicivin!

Em wek hevkarên kovara *Bîrnebûnê* bi vê xeberê dilşabûn û her wiha avahîya **Mala Me** pîroz dikin û serkeftina wan ji dil dixwazin.

Hêvîya me ev e ku li **Mala Me** dê malbatên me bi zaroyên xwe ve li vir carcaran bîn ba hev, ziman, çand, erf û edetên xwe fêrî zarokên xwe bikin, ziman û nasnama xwe bi pêşde bibin.



Navnîşana **Mala Me**
Verein Kelhasan
Neuhausstrasse 21, 4057 Basel

Mekteba Şemîyê

li Stockholmê, li beledîya Botkyrkayê vebû

Bi hevkarîya Waqîfa Kurdên Anatolîya Navîn (Stiftelsen-KAN) û Stockholms Södra Folkhögskolan di 24ê payîza navîn (oktoberê) li taxa Fittjayê, bi beşdarîya dê û bav, hewkarên mekteba şemîyê û zarokên ji 3 heta 15 salî vebû. Mixabin ji ber zêdebûna Covid-19an mecbur man naybeynekê bidinê heta ev sava hinek sivik dibe. Em hêvî dikin bi deştpêka biharê re em ê bikaribin dîsan deşt bi mekteba kurdî ya şemîyê bikin.

Waqîfa Kurdên Anatolîya Navîn



I samarbete med Södra Stockholms Folkhögskola
Lördagsskola för barn i åldern 3-15
Hjärtligt välkomna

Varje lördag kl. 12-14

Mekteba Şemîyê bo kurikên 3-15 salî
Bi xêr bîn!



För registrering och mer info: www.stiftelsenkan.com
Hayrettin Güven: Mobil: 0700416123 E-post: info@stiftelsenkan.com



Kontakt

Här hittar du oss
Besöksadress
Södra Stockholms Folkhögskola
Fågelskärgen 10, hus 3, port 23

Hitta hit
Ta dig till T-banestation Fittja. Ta buss 702 mot Hälunda centrum och kliv av vid busshållplats Fittjaverken eller promenera från Fittja (ca 14 min).

Postadress
Södra Stockholms Folkhögskola
Fågelskärgen 10
145 53 Norsborg

HEM KURSER FÖR DELTAGARE OM SKOLAN KONTAKT





Dîtinên min li ser Mekteba Şemîyê li bajarê Stockholmê

Sevîm Güven



Ez li Swêd li bajarê Stockholmê hatim dinyayê û li vê derê mezin bûm û min xwend.

Niha ez dayîka du zarokan im.

Ji ber ku mêrê min ji tê da kar dikir, min bihîstibû ku Weqfa Kurdên Anatolîya Navîn (KAN) mektebek şemîyê bo zarokan vekirine, min jî zarokên xwe girtin û çûbûm mektebê. Roj roja 24ê cotmehê, sala 2020an bû. Roj roja şemîyê bû.

Ez, keça min û mêrê min, em sibê bi kelecaneke xurt rabûn. Em li erebê sûwar bûn û çûn dikanê ji ber ku çend kêmasîyên mektebê hebûn. Qey te digot me ji mevanên xwe re kêmasî dikirîn.

Em gihîştin cîhê mektebê û bi coşek mezin derîyê mektebê me vekir.

Ji ber Corona xopan me hundirê salona mezin çêkir. Mase û kursî bi şûn kirin gor xwestîyên Daîreya Tendurîstîya Gel ya Swêd (Folkhälsomyndigheten).

Piştî hazirîyê mamosteyên me hatin yek bi yek. Ji mamosteyan yek hevala min a zaroktiyê bû, yek merîva min bû û yên din jî gundên der dora gundê min bûn. Ji Omera, Încovê, Sewikan, Xelîkan mamoste hebûn. Piranîya wan jî jin bûn.

Piştî ku zarok hatin bîranînên min î 20 sal berê hatin bîra min. Ez jî zarok bûm û çûbûm qûrsek bo zarokan ku kurdên gundê ma ava kiribûn. Min li vê derê bihîstibû çîrokên gundan bi kurmancîya me, govend û listikên zarokan. Ê niha dor dora keça min bû. Piştî pir salan mektebek me bû ku mamoste mamosteyên me bûn, kurik kurikên me bûn. Bo wê min mekteb ne wek mekteba waqîfê dît. Wek dê û



din min jî mekteb wek mekteba xwe dît. Min dît ku ne tenê ez, mamoste jî wek mekteba xwe dîtîn û me wek malbatek kar dikir wê rojê.

Piranîya dê û bavan hev nas dikirin û ji ber wê zarokan jî hevdu nas dikirin. Kesî kes biyanî nedît. Nêzikî 40 zarok û 40 jî dê û bav hatibûn. Kelecaneke û şahîyek hebû di hundirê mektebê de û di dilê me de.

Kelecana zarokan û mamosteyan, muzîkvan û dê û bavan xuya dide ku edî waqîf waqîfa me bû, mekteb mekteba me bû. Me pakijî tev hev dikir, govend tev hev dikişand. Mamoste, kurikên me, dê û bav herkes di govendê da bû. Ji ber ku herkesî hevdu nas dikir, hestek ewleyî hebû di hawirdorê de.

Piştî ku zarokan dest pê dersê kirin, em dê û bav li ba hev rûniştin û bo pêşeroja mektebê me hinek gotûbêj kirin. Em wek xwediyên waqîf û mektebê çî dixwazin me behsa projeyên nû kir. Ez pir kêfxweş bûm ku piranîya wan jin bûn û min bi navê waqîfê gelek fikirên nû girtin. Rengîniya fikiran nîşan dida ku pêwîstiyek mezin bo projeyên veng hebû di nav kurdên me da.

Ji ber ku min li Zanîngeha Stockholmê parêzerî xwendibû, zarokên

15-salî dihatin ba min û pirsên xwe ji bo lîseyê dikirin û min jî ji wan re behsa rêya çûyîna lîse û zanîngehê dikir. Lê zarokên 4-5-salî jî dihatin û ji min re behsa şekir û çîkolatan dikirin.

Piştî saetekê zarok û mamoste jî hatin hundirê salona mezin û min dît ku çavên mamosteyan dikenîn û wana xwe didan ber her karî wek çay û qehweçekirinê bo dê û bavan. Wana xwe wek berpirsiyarê her kar û barê mektebê dîtîn.

Zarok bi şahîyek mezin ketin destên mamosteyên xwe di govendê da.

Piştî ku herkes belav bû, ez û mêrê min û çend mamosteyên me, me pakijîya mektebê jî kir ji dil da.

Wexta ku min ji birazîya 6-salî pirs kir ku wê herî pir ji çî hez kiribû, wê got ku wê ji xwarinê, ji govendê û ji ber ku mamoste ji gundên wê bûn jî mamosteyan pir hez kiribû. Ew tişteki pir balkêş û girîng bû ji ber ku piranîya zarokan qet baş kurmancîya me deng nedikirin û çend zarokan qet kurmancî jî nedizanîn, lê wana dîsa jî ji mektebê gelek hez kirin ji ber ku mamoste jî, heval jî, dê û bav jî ji doralîya wan bûn û wana xwe dîtîn di mektebê da, ji ber wê jî ji mekteba xwe pir hez dikirin.

Mektebên rojên şemîyan

Alî Çiftçî

Bi globalîzbûnê re îmkana lêgerîna jîyaneka çêtir û tevgera mirovan a ji welatekî ber bi welatekî din ve zêde dibe, ji ber pir tiştan: wekî perwerde, xwesteka jîyanek rind, hewcedariya kar, revîna ji nakokîyên di navbera koman de, zordariya rejîmên dîktator an jî tofanên xwezayî. Sedem çî dibe bila bibe, dema însanên ji kulturên cûda di civateka nû, welatekî nû de tînin ba hev, hin feydeyên xwe hene ku hem ji hêla zimanî û hem jî ji hêla çandî ve bandorekê li hev dikin.

Ez bi xwe cara sîftê ku ji gundê xwe derketim û bi qasî du salan li bajarê bakurê Kurdistanê, li Sîweregê mam, min ev bandora ji aliyê ziman û çandî de ku li ser min bûbû û cara duyem jî dema hatim Swêdê, bi rihetî jîyam.

Li Swêdê min pir salan bi zarokan re kar kir, yek ji wan karê min ê sîftê karkirina li hêlîna zarokan a duzimanî bû: swêdî-kurdî. Piştî sê salan jî mamostetiya zimanê dê (*modersmålslärare*) li dibistanên cuda yên li Stockholmê kirîye. Ji

ber vê jî çî lêkolînên li ser "Girîngîya zimanê dê di pêşketin û fêrbûna zarokan de" dibûn, qasî ku ji min dihat min ev lêkolîn dixwendin.

Beriya her tiştî, ez bawer dikim ku zimanê dê girîng e ji ber ku ew nîşana nasnameya çandî ye, ji ber ku her zimanê li cihanê tê dengkirin, mîraseka çandî ya bêhempa û zelal, stranên melodî û xwarina xweş, ku mirov hest pê dike, nîşan dike. Ji ber vê yekê, ez bawer dikim ku zimanê dayikê di avakirina nasnameya kesayetî, çandî û civakî de roleke girîng dilîze.

Kesayetîyê pêş dixê

Zimanê dayikê zimanê me yê yekem e. Dengê bedew ê ku meriv di zikê dayikê de berî zayînê dibihîze û pê re nas dibe, di girêdana raman û heştên me de xwedîyê roleke pir girîng e. Pêşveçûna psîkolojîk û kesayetîya zarok girêdayê wê yekê ye ku zimanê dayikê çawa bi kar hatiye û çî hatiye veguhaştin. Gava bi zarokan re diaxivin divê vegotin û peyvên zimên bi baldarî werin hilbijartin, ev

hişmendî pir girîng e. Zimanê dayikê di dil û mejî de ji ziman e. Gotineka Nelson Mandela ya balkêş heye li ser zimanê dê. *“Eger hûn bi kesekî re bi zimanekî ku ew jê fêr dike deng bikin, ew ê bikeve serê wî. Eger hûn pê re bi zimanê dayîka wî deng bikin, ew ê bikeve ber dilê wî.”*¹

Fêrbûn bi zimên dest pê dike

Pêşxistin û zanîna zimanê dayikê bingeha fêrbûna zimanekî din e.

Famkirina zarokan a cîhanê, her weha fêrbûna têgeh û hînbûnê, bi zimanê ku pêşî li zarok tê hîn kirin dest pê dike. Di nav gelek lêkolîneran de yên wek Kenneth Hyldenstam, profesorê Navenda Lêkolîna Duzimanîbûnê, Sofia Tingsell ku li zanîngeha Uppsalayê li Enstîtuta Ziman û Bîranînên gelerî wek zîmanzan kar dike, Ulrika Magnusson, lêkolînerê Beşa Dîdaktîka Ziman a Zanîngeha Stockholmê û gelek lêkolînerên navneteweyî yên wekî Jim Cummins, profesorê Zanîngeha Toronto diyar dikin ku ew zarokên bingehê wan a baş di zimanê dayikê de hebe, di fêrbûna zimanên din de û di têgehên hînbûna mijarên din de jî çêtir dibin. Ji ber ku ev dide xuyakirin zimanê dayikê çiqas bihêztir

be, ewqas hêsan e ku zarok fêrî zimanên nû bibin.

Di van deh salên dawî de, gelek însan ji ber sebebên ku min li jor destnîşan kiribû, bi taybetî ji ji welatên rojhilat ber bi welatên rojava yên Ewropayê ve hatine û tîn, bûye sebeba ku partiyên nijatperest û populist bi pêş dikevin û ji aliyê hinek siyasatmedarên van partiyên ku li dijî hatina xerîban in, li dijî perwerdeya zimanê dê derdikevin û dibêjin: "Perwerdeya zimanê dê dibe asteng li hember fêrbûn û entegrebûnê."

Hemû lêkolînerên min li jor behs kir, diyar dikin ku tu bingehên lêkolînîyên zanistî tunene ku **zimanê dê** bibe asteng ji bo entegrebûnê. Bilakîs hemû lêkolîner hemfikir in, ka çiqas girîng e ku xwendekar zimanê dê fêr bibin. Ez qet bawer nakim ku hînkirina zimanê dayikê qutbûnê diafirîne, ji ber ku ez bawer dikim entegrasyon dikare bi zanîne ve were girêdan û ji aliyekî din ve, kêmîbûna zanîne dikare bibe sedema qutbûnê.

Di perwerdeyê de rola zimanê dê ji bo fêrbûnê wekî beşek ji qabiliyeta rewşenbîrî girîng e, ji ber ku ew ziman e mirov ji çêbûna xwe ve fêr dibe. Ew di pêşveçûna derûnî,

1 *Språktidningen* nr 2013/11, *Makten går till den som kan språket* (Hêz diçe yê ku ziman dizane) av Östen Dahl

exlaqî û hestyarî de alîkarîya zarok dike. Pêşkeftina civakî û rewşenbîrî ya pêşeroja zarokekî li ser bingehe zanîna zimanê dayikê ye. Ev jî tê vê wateyê ku divê zimanê dayikê di perwerdeyê de bibe xwediyê roleke navendî.

Hînkirina zimanê dayikê ji bo pêşveçûna giştî ya zarokan pir girîng e. Û ziman, zarok bi çanda xwe ve girêdide, pêşkeftina têgihiştinê çêtir dike û ji fêrbûna zimanên din re dibe alîkar. Hemû lêkolîn bi zelalî nîşan didin ku xwendekarên ku fêrbûna zimanê dê dibînin, dikarin baştir û zûtir zimanekî nû fêr bibin.

Niha ji bo hînbûna zimanê dê yanê kurmancîya malê ku em wek Waqîfa Kurdên Anatolîya Navîn (Stiftelsen-KAN) li Swêdê bi ve- kirina mektebên kurdî (Mektebên rojên şemîyan) dest pê bikin û hînkirina zimanê dayikê bidomînin tu cûdabûnê an qutbûnê çênake.

Nimûneyên me yên di destpêka salên 1980î de li Swêdê hene. Ev kesên ku ji neslê duyem, çi ji bajarên Kurdistanê bin û çi jî ji kurdên me yên Anatolîyê bin, ku wan salan dersa zimanê kurdî wergirtibûn an jî çûbûn mekteba rojên şemîyan ji bo fêrbûna zimanê dê (kurdî) piraniya wan hem di xwendina xwe de û hem

jî di entegrebûna civata Swêdê de serkeftî ne.

Xwendekarên bi ziman, çand û hevkarîya cuda di navbera mamosteyên zimanê dê û mamosteyên polê (sinifê) de li heman dibistanê di warê zanîn û entegrebûnêka baş û her weha pirrengî de encamên erênî nîşan didin.

Dema ku her kes fersenda fêrbûna zimanê dê bi taybetî ji bo me kurdan ku niha li piraniya welatên Ewropayê hene, bi kar binin û bixwazin ziman û çanda xwe bêtir pêş ve bibin, ev dem demeka baş e.

Em ê wek Waqîfa Kurdên Anatolîya Navîn (Stiftelsen-KAN) di salên pêş me da li ser mektebên rojên şemîyan li seranserê Swêdê kar bikin. Ku daxwaz hebe, li welatên din jî em ê bibin alîkar ku dest pê bikin.

Ziman giştik wek hev hêja, xweş û girîng in!



Navên navlêk

S. Erdem

Di warê zimannasî de navên kesan, di asasê zimên de cihekî girîng digirin. Di heman demê de di dahûrandina têkiliya ziman û raman de, di famkirina awayên ku têgîn têne vegotin de û li gorî vê ew rêberîyê, ji diyarkirina têkiliya di navbera lênêrîna jiyanê ya neteweya ku bi zimanê tê de diaxive û awayê jiyanê dike. Di vê çarçoveyê de navên navlêk/ navdêr ku wekî celebêg navên kesane, mîna navên xweser mijarekê ku heqê lêhûrbûnê ne. Ji ber ku ji hêla ol, qanûn û edetan va destûra xwe-nav dayîne, hatiye dayînê merivên wek mînak; dê û bav an xizm û merivên din, pir caran nav ji hêla van mêrivan va tê dayîn. Her çend sedemên diyarkirina tercîhên navên xweser, hema hema her gav ji bilî warê nava bin jî, navên navlêk piranî ji ber sedemên kesane têne dayîn. Di vî warî de sedema dayîna navlêkan, diyarkirina şikil û helwesta navlêkirinê ye û navdêr bi xwe jî dihêle ku razên têkiliya ziman û ramanan veke. Navdêr, paşê tîna dayîn û ew merivên navê xwe bi navdêr, ji navê xwe cûda bi wê taybetmendiyê ku pê navê navdêr hatiye dayîn, tîna nasîn (Coşar, 1999:27). Ji bo ku em tevkarîyê li lêkolînê li ser navên merivan bikin, di vê xebatê de em ê çend mînakan ji navên navlêk ên gundê me (Gundê Hesina/Şereflî Koçhîsar / Enqere) bidin û wan şîrove bikin.

1. Li gorî sedemên dayîna navên navlêk:

Sedema dayîna navdêran bi gelemperî ji hela taybetmendiyên mirovên ku leqeban digirin ve tê diyarkirin. Nav û sîfatên çeşîd bi çeşîd ên ku bi helwest û tevger, xisletên xeysetê, xûy, xuyabûna fîzîkî, awayê jiyanê, çêj û behreyên taybetîyên merivan pêşwazî dikin an tînin bîra, dikarin wekî leqeb bi wan ve were girêdan. Mînak: bi kesên kurt û qelew re dibêjin Qîlot - Bes Qîlot, Eş Qîlot- an bi kesên zerî re dibêjin Yî / Yê Zer, Yî / Yê Sor- Erebi Sor, Fatê Sor -û hwd.

Carinan kêmasîyên laşên mirovan ji bo wan dibin navdêr. Mîna ku bi kesên ker an kwîr re dibêjin filanî / ê ker / kwîr / topel / çoleq û hwd (Tablo-1).

Tablo 1. Yên li gorî taybetmendî û kêmasîyên beşên hatinê dayîn

Navên navlêk (yên mêran)			Navên navlêk (yên jinan)
El Kutuk	Hopiş	Kwîr / Yê / Yî Kwîr	Çîrîk
Erebî Sor	Hotgir	Qere	Çûr / Çûrîk
Çav Kesik	Heckwîr	Qere Hesên	Eş dirêj
Çav Zer	Huskwîr	Os Kilot	Eş Kel
Çîlo	Înce Elî	Sari Osman	Lev Riş / Lev Reş
Çolak	Kel o	Tat Ereb	Naz ê Dirêj
Dev Kort	Kel Mamo	Topal	Qilot
Hese Reş	Ker / Yî Ker	Tato / Totto / Tatik	Qol / Qolik

Di hin rewşan de, deverên ku meriv jê hatî jê re dibe leqeb. Dibe ku ew dever welatek, bajarokek an gundek be, an jî parêzgehek an herêmek din be. Wekî mînak, Fatê Malê Heciya, Zebê Qeynerê, Rabê Mihînê. Li vir Malê Heciya, navê gundê Fatê, Qeyner navê gundê Zebê û Mihîna jî navê gundê Rabê ye. Carinan jî netewê merivan jê re dibe leqeb. Eger hin kesên ji neteweyên cûda werin û li nav civaka cûda bi cîh bibin, ew kes bi navê neteweyê xwe bi nav dibin. Mînak li gundê me bi merivên tirk re dibêjin Dedeyî Tirk, Besê Tirk, bi meriven muhacir re dibêjin Gulê Muhacir, Xayalê Muhacir, Husînê Muhacir û hwd. Di vî warî de em dikarin mînakekê jî ji Koreli re bidin. Ew merivê pê re dibêjin Koreli, li Korê leşkeri kiriye, bi ser vê de navê wî yê navlêk, wek Koreli maye (Tablo-2).

Tablo 2. Yên li ser bingeha ku meriv jê hatî yan demekê lê mayê hatinê dayîn

Navên navlêk (yên mêran)	Navên navlêk (yên jinan)
Dedeyî Tirk	Fatê Malê Heciya
Koreli	Dedeyî / Kamilê Tirk
Mistî Gera	Rabê Mihînê.
Muhacirî	Gulê / Zaxê Muhacirê
-	Zebê Qeyner e.

Navên navlêk ne tenê ji bo pesandina (pesnandin) merivan, di heman demê de ji bo şermazarkirina wan jî tên bikaranîn. Çimkî navdêr, dikare

wekî navê duyemîn yê ku piştî navê ew kesî/ê tên dayîn ku, me kêmasî û raserîyen wan kesan diyar bike. Ji ber vê sedemê, gava ku hin kes bi leqeba xwe serbilind dibin, lê dibe ku hinek ji leqeba xwe hez nekin¹. Ji ber vê yeke, navên navlêk ên bi mirovên ku navên wan ne xweş in pir nayên bikaranîn. Wek mînak: El e Dîn, Deli Hecî, El î Tûr, Eş Koçek û hwd. (Tablo -3).

Tablo 3. Yê li gorî xislet û xûyen merivan hatinê dayîn

Navên navlêk (yên mêran)		Navên navlêk (yên jinan)
Belali (Nurî)	El Kok	Eş Koçek
El Kutik	Delibaş	-
El e Dîn	Deli Bayro	-
El î Tûr	Deli Hecî	-
Elgincik	Dîno	-
El Kêço	Hes e Dîn	-

Hin navên navlêk li gorî hin taybetmendîyen zarokan, li wan tên dayîn û bi wî awayî ji merivan re dibin nav û weng timen. Wek mînak ji ber ku ji du birayan, bi yî piçûktir re gotine çûko, navê wî wek Çûko maye. Bi heman rengî, ji ber ku bi zarokê kurîn re gotine lawiko / loko, bi zarokê keçin re jî gotine pitê, navên wan kesan wek Lawiko / Loko û Pitê maye (Tablo-4).

Tablo 4. Yê ji zaroktîyên de mane

Navên navlêk (yên mêran)	Navên navlêk (yên jinan)
Çûko	Pitê
Kûto	-
Loko / Lawiko	-
Qingo	-

Di rewşên ku hin taybetmendîyên merivan de bi ajalan re tên şibandin jî navdêr tên bikaranîn. Mînak hin meriv, histûyê xwe mîna kûsiya di navberê milên xwe de digirin, bi wan re dibêjin kûsî. Bi merivên çavên xwe mîna tota (bûma) beloq re dibêjin, filan kesî / î mîna bûma yan çavtot. Carcaran jî navê ku hatî dayîne ajalan, ji merivan re dibe leqeb. Wek mînak, merivî bê re dibêjin Bobî, kûçikekî wan yê piçûk hebûye û navî wî kûçikî Bobî bûye. Ji ber ku ew meriva jî hûrik bûye, leqebê wî wek Bobî hatiye dayîn (Tablo-5).

¹ Özdemir & Erdem, 2016: 249-250

Tablo 5. Yê n ku ji ber şibandina merivên bi ajalan re hatine dayîn

Navên navlêk (yên mêran)	Navên navlêk (yên jinan)
Bobî	-
Contir	-
Çavtot (Bûm)	
Çîro	-
Gornapiş / Mîna Gornapişa	-
Heftar	-
Kûsî	-
Mîna Bûma	-
Xoroz	-

Hin navdêr, li gor paşnav û navdêrên merivên din tên dayîn. Li gor paşnavan, meriv bi paşnavên xwe tên binavkirin. Wek mînak Hecîyê Kosê yan Kosê. Paşnavê Hecî, Kosê ye lê bi Hecî re pir caran dibêjin Kosê yan Kosê Hecî. Carinan jî ger navê merivekî bi leqeb, hatiye dayînê zarokekê, leqebê wî merivî jî têye dayînê wî zarokî. Mînak navî Qetîl. Navî Qetîl bi rastî Osman e. Leqebê wî merivî navî xwe Osman, Qetîl bûye û ji ber ku navê wî wek Osman dayine Qetîl, ew leqeba jî derbasî Osman î biçûk bûye û leqeba wî jî wek Qetîl maye.

Tablo 6. Yê n ku ji ber paşnav û derbasbûyîna leqeban re hatine dayîn

Navên navlêk (yên mêran)	Navên navlêk (yên jinan)
Kosê / Hecîyê Kosê	Pîrik
Qetîl	-

Li gorî xuyang û tevgera merivan jî navên navlêk tên dayîn. Ger xuyang û tevgera hin merivan, ji yên dora wan cuda bin, li gor ewî xuyang û tevgeran navdêr li wan tên dayîn. Mînak, bi merivên tevger û axaftina xwe nerm re dibêjin, “Mîna avê nemeyî” û “Nerm e germ”. Bi heman rengî bi yên tevger û axaftin û kinc û kolên xwe hovîtî re jî dibêjin “Mîna gewende”. Bi merivên ku bi xeml û xêz re jî dibêjin “Suslu”.

Tablo 7. Yên ku li gorî xuyang û tevgera merivan hatine dayîn

Navên navlêk (yên mêran)	Navên navlêk (yên jinan)
Mîna avê nemeyî	Kumxarê
Mîna gewende	Nermegerm
Suslu	-

Hin navên navlêk hene ku, wateya wan bi tevahî ne diyar e û meriv nizane ku ji ber çi ew navên navlêk têne bikaranîn. Di vê xebatê de me jî nezanî ku navên wekî Çako, Galo, Kimo, Tongo û hwd, çima têne bikaranîn û wateya wan çi ne? Ji ber vê yekê ye ku me ew nav kirin kategoriya navên navlêkên ku wateya wan bi tevahî nehatî diyarkirin (Tablo-8).

Tablo 8. Yên ku wateya wan bi tevahî ne diyar in

Navên navlêk (yên mêran)		Navên navlêk (yên jinan)
Çako	Kindir	Seri xelî
Çipit	Kompîr	-
Çîvo	Mil Elî	-
Galo	Xençer (Nurî)	-
Galbagli	Qirmeli	-
Ginco	Qîjo	-
Hoko	Solax	-
Jojko	Tongo	-
Kimo	Tepet	-

Di hin rewşan de bi bandora avahiya kevneşopîyê navdêr, derî hole dikevin. Mînak, di kevneşopîya kurdan de, ji ber ku ew fedî dikin, hevjin bi navê hev, hevdu navnişan nakin. Ji ber vê sedemê bi taybetî jî jin, navên navlêk didin mêrên xwe û bi van navan bangî mêrên xwe dikin. Wek mînak: Yaxip, Kelo, Dîno, El e Dîn û hwd.

Çavkanî

- Coşar, A. M., 1999, "Trabzon'da Kullanılan Lâkaplar Üzerine Bir Derleme / Değerlendirme", *DergiPark / Türk Dili Araştırmaları Yıllığı*, Cilt: 47, Sayı:1999, s.26-40.
- Özdemir, S. ve Erdem, R., 2016, "Akademik Örgütlerde İdari Personel Arasında Kullanılan Lâkaplar Üzerine Bir Çalışma", *Süleyman Demirel Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi*, Yıl: 2016/3, Sayı:25, s.247-261.

War û stareke dîrokî:

Sînega Êzdîya

Rohat Alakom

*... de lê lê dinê zozanên Sînegê çem kanî ne
de tu rabe destê min evdalê Xwedê bigre
nava çem û kanîyan, gul û gulçînên Sînegê bigerîne...*

(Ji kilameke kurdî)



Warê gundê Baş-Sînegê (Foto: Ahmet Çolak)

Herêma Sînegê di navbera sinorên Qulp/Îdir û Agirîyê de dimîne, herêmeke çîyayî ye. Li dewsa Sînegê gelek caran îfadeyên Çîyayên Sînegê û Zozanên Sînegê tê bê kar anîn. Dema mirov ji Qaxizmanê derdikeve berê xwe dide Îdirê, di qezaya Qulpê (Tuzluca) re derbas dibe. Mirov dema li Qulpê disekine û li ser milê rastê dizivire ji dûr ve çîyayên bilind dibîne, ew herêma Sînegê ye. Sîneg heta sinorê Agirîyê dirêj dibe, warekî ji seviya behrê 2000 metro bilind pêk tîne. Gola Mesîyan jî li jora çîyayên herêma Sînegê cîh

digre. Navê vê golê yê tirkî (Balık Gölü) di kurdi da jî tê bi kar anîn: Balıxgol. Di nav sînorê Agirîya îroyîn da dimîne. Ev gola bi masiyên xwe yên deqsor (*ala balik*) hatiye nasîn. Gola Mesîyan havînan ferahî, bedewî û jîndariyeke bêhempa tevî herêma Sînegê dike. Mezinahiya wê 30 km² û ji behrê 2.241 mêtro bilind e. Di nav golê da giravek jî heye. Jîneke bi navê Xana Osman ku berî gelek salan ji Sînegê koçberî Ermenîstanê kiriye û di sala 1987an de 106 salîya xwe tijî kiriye di derbarê Sînega Êzdîya de wiha dibêje: “*Me ji destê xûnxwarên romê de Sînega xwe, Balıxgola xwe, cî-warê xwe hişt em hatine vîra*”.¹ Piranîya vê herêma Sînegê li aliyê Qulpê dimîne. Peyva Sîneg herwiha navê gundekî ye jî. Angorî Salnameya Qefqasê (Kavkaskiy Kalendar) di sala 1909an de qasî 174 kes li gundê Sînegê mane. Tiştêkî balkêş di eynî çavkanîyê de navê gundekî bi navê Baş-Sîneg jî li herêmê cîh girtiye. Mîrov baş nizane gelo ev heman gund in yan jî du gundên cihê ne.²

Kurdên êzdî li Serhedê bi sedsalan di nav sînorên Agirî, Îdir, Qers û Rewana îroyîn de jiyane. Ji destpêka sedsala 19an heta sedsala 20an di navbera dewletên herêmê de bi taybetî di navbera osmanî û rûsan de gelek şer çêbûne. Ew cihên ku kurdên êzdî lê diman, gelek caran dest diguhirandin. Di van demên qûrffar û şkestî de kurdên êzdî jî çawa em dibînin, ji xwe re warên ewlekar, emîn digeriyan, piştî hewldanên mezin derbasî nav sînorên dewlet û bajarekî din dibûn. Bona jîyana xwe bidomînin û debara xwe bikin, ew jî mecbûr mane ji xwe re dost û hêzên stratejîk bibînin. Bi rûs, ermenî û kurdên nêzî rûsan re wek kurdên Şemsedînov re hevkarî kirine.

Êzdîyên vê herêmê di sedsala 16an de hatine li Ayıntabê cîwar bûne.³ Navê nehiya Ayıntabê di sala 1894an de dibe Tutax ku bi qezaya Eleşgirdê re girêdayî bûye. Ev devera niha di nav sînorên Agirîya îroyîn da dimîne. Paşê çawa xuya dibe ew li herêmê belav dibin, warên nû ji xwe re peyda dikin. Di dawîya sedsala 19an de nîfûseke mezin yên kurdên êzdî ji nehiya Ayıntabê koçberî aliyê Dîgorê dikin, li wir qasî 16 gundên êzdî ava dikin. Ji berê de beşeke kurdên êzdî jî li hêla Surmelîyê, Bazîd û Rewanê diman. *Mehmed Hursîd Paşa* dema nivê pêşîn yê sedsala 19an de li herêmê lêkolînan dike, hejmara xaneyên kurdên êzdî ku li qezayên sencexa Bazîdê dimînin wek 376 nîşan dide.⁴

1 Egitir Xudo, Pîrka Xanê qurnekê zêdetir jiye, *Rêya Teze*, 24/1 1987.

2 Kavkazskij Kalendar Na 1910 God, Tiflis, rûp.201, 365.

3 Harun Aydın & Meryem Aydın, Cumhuriyet Döneminde Tutak İlçesinin İdari Yapısı ve Nüfusu (1923-1970), *İnsan ve Toplum Bilimleri Araştırmaları Dergisi*, nr 7/2018, rûp.2571.

4 Zekerîya Kurşun, Mehmed Hursîd Paşa'nın Seyehatnâme-i Hudud Adlî Eserine Göre XIX. Yüzyıl Ortalarında Bâyezîd Sancağı, *Türk Kültürü İncelemeleri Dergisi*, nr 2/2000, rûp.111.

Beşeke kurdên êzîdî di sedsala 19an de ji Bazîdê derbasî aliyê Sînegê dibin. Paşê ew vê herêma çiyayî wek warekî mayende ji xwe re hildijbêrin. Di navbera herdu herêman de (Dîgor û Sînegê) robarê Erez dikişê, herdu herêm ji hev bi dûr dikevin. Hemû şênîyên van gundên êzîdî li herêma Serhedê, di salên rev û bezê de (1918-1920) dikevin rê, derbasî nav sînorên Rûs/Sovyetê dibin. Êdî di destpêka sedsala 20an de li Welatê Osmanî / Tirkîyê tu kurdên êzîdî namînin. Ev kurdên êzîdî ku bi qasî sedsalî li Ermenîstanê û cîhên din mane, di sala 1991an de piştî serobinobûna Yekitiya Sovyetê vê carê ev herêma hîştin, terkiserî dinê bûn, li hemû cîhanê belav dibin. Beşeke wan ya mezin diçe welatên Ewropayê û hundirê Rusya-yê. Divê em li vir wê gotina pêşîyan ya kurdên êzîdî, careke din li vir dubare bikin: “*Me du mirîyên xwe li tu cîhekî gor/çal nekirin!*”.

Du tekstên li ser Sînegê

Berî demekê ez raştî du tekstên balkêş hatim. Yek ji van tekstan di dawîya pirtûkeke gramatikê ya zimanzanê kurd Çerkez Bakaev de (1912-1998) cîh girtiye. Pirtûk di sala 1983an de di derbarê raştîvîsa kurdî de hatiye weşandin. Di vê çavkanîyê de bi hezaran peyvên kurdî bi tehrekî alfabetîk hatine rêzkirin. Di dawîya pirtûkê de teksteke kurdî qasî 33 rûpelan cîh girtiye. Ev teksta bona raştîvîsîna peyvên wek teksteke minak hatiye dayîn. Di dawîya rûpelê pêşîn yê kurdiya tekstê de redaksiyona pirtûkê bi şêrkekê cîh daye dazanînekê. Li wir tê gotin ku ev teksta ji aliyê nivîskar de hatiye amadekirin û teksteke otobîyografîk e. Wisa xuya dibe kal û bavên Çerkez Bakaev ji vê herêmê bûne. Ji aliyê din tekst wek çavkanîyeke erdnîgarî (coxrafîk), edebî û dîrokî jî dikare bê hesabîn. Ev teksta bi navê Rojên Buhurî ji çar beşan pêk hatiye: Gundê Me, Fêrîk û Sûsik, Rev, Etîmxane.⁵ Teksta din perçe-romana nivîskar Qaçaxê Mirad e (1914-1979). Qaçaxê Mirad berî mirina xwe dest bi nivîsîna vê romanê kiriye, lê belê pê re negihandiye vê berhemê xelas bike, wek destnivîs li pey xwe hîştîye. Ev romana nivcomayî ji 87 rûpelan pêk tê, navê wê jî Rev û Star e. Nivîskar vê tekstê wek “romana nekutakirî” dide nasîn. Piştî mirina wî ev teksta ligel çend çîrokên din wek pirtûk hatiye weşandin.⁶ Em ê li jêr bi hûralî qala van herdu nivîskarên sînegî ku herêma Sînegê bi me didin nasîn, bikin.

5 Ç. X. Bakaev, *Osnovi Kurdskey Orfografi*, Izdatelstvo Nauka, 1983, rûp.202-235.

6 Qaçaxê Mirad, *Min çi dit?* 1981, Sovetskaya Grog, rûp.148-235.

Sînega Ezdîya

Ew herêma ku gundên kurdên êzdî lê bûne di kilameke Evdalê Zeynikê de wek “Sînega Êzdîya” derbas dibe.⁷ Yek ji wan êlên mezin yên êzdîyan êla Hesînîya bûye. Di destpêka sedsala 19an de ji Bazîdê derbasî qezaya Surmeliyê dibe. Wê demê herêma Surmeliyê di bin hikimdarîya rûsan bûye. Paşê ev kurd li herêma Sînegê cîwar dibin.⁸ Tê gotin ku kurdên êzdî berê li herêmên aran/qişlan diman. Dema havînekê derdikevin zozanan ew wê demê Sînegê keşf dikin. Ew mêze dikin ku ev der cîhekî gelek xweş e, êdî payîzê danakevin jêr, hema ji xwe re li wir gundan ava dikin. Angorî Ahmedê Gogê hejmara van gundan 7 bûne.⁹ Nivîskarê kurd Erebe Şemo di romana xwe Şivanê Kurmanca de dîyar dike ku ew berî Şerê Cîhanê yê Yekem çûye Sînega Hesînîya, Tendûrek, Sarîbulax û Qiznefer, nas û xizmên wî li wan gundan hebûne.¹⁰ Dema diçe gundê Qizneferê li wir dibe evîndarê Kidê (keçxatîya xwe). Gundîyekî ku îro li gundê Zerebxaneyê dijî hejmara van gundên êzdî wek 5 nişan dide: Aştalî, Baş Sîneg, Dutax, Onbulax, Zerebxane. Zozanên Sînegê berê wek warê kurdên êzdî hatiye nasîn. Dema salên rev û bezê de (1918-1920) qasî 600 kurdên êzdî li zozanên Sînegê bêçare û bêgav dimînin, nizanin çi bikin.¹¹ Angorî Silêman Kutlay li herêma Sînegê qasî 8 gundên kurdên êzdî hebûne. Silêman Kutlay di bîranînên xwe de dibêje ku dema kurdên êzdî malên xwe bar kirin çûn Ermenîstanê, kesên ji eşîra wan li van 8 gundên êzdî cîwar dibin. Bavê Silêman Kutlay ji diçe gundê Tendûrekê (Yaylacik) dimîne. Ev yeka nişan dide ku wê demê li Tendûrekê kurdên êzdî mane. Li gundê Eslanlîyê ji kurdên êzdî jîyane.

Dostanîyeke nedîtî

Dema kurdên êzdî di nav erdê rûs de dijiyan ligel komeke kurd ya misilman Torina Mala Kose re têkilîyên gelek baş pêk danîne. Carina bi kurtî ji vê komê re Torin dibêjin.¹² Rûsan navê van kurdan danîbûn Kurdên Şemsedînov û di nav eşîra mezin Zîlan de cîwar dikirin.¹³ Wek mînak, gundên wan di çavkanîyên rûsî de hin caran li ser eşîra Zîlan hatine hesabîn.

7 Ahmed Aras, *Evdalê Zeynikê*, 1996, Weşanên Deng, rûp.55-56.

8 Pîr Dîma, *Êzdîyên Serhedê*, 2011, Weşanxaneya Do, rûp.95.

9 Ahmedê Gogê, *Dengê Kal-Bavê Me*, 1997, Erevan, rûp.16.

10 Erebe Şemo, *Şivanê Kurmanca*, 2009, Weşanxaneya Lîs, rûp. 118-124.

11 Mûcahit Özden Hun, *Îğdır Sevdası* II, 2002, rûp.215.

12 Celadet Bedirxan di binê helbesteke xwe de peyva torin ji aliyê gramatikî de dide nasîn. Çawa hin deng ketine û peyva tovrind di zimanê devkî de paşê çawa bûye torin wiha şîrove dike: “*Tovrind: ştexaliyê de torin tête gotin. Eslê wê tovrind e, yê ko tovrê wî rind û pak, malbata wî nas. Tîpa –v– ji navê û -d ji paşîyê ketine*”. (Herekol Azîzan, Bêriya Botan, *Hawar*, nr 25/1934).

13 Rohat Alakom, Şemsedînov Kürtleri, *Kürt Tarihi*, nr 1/2012, rûp.30-35.

Torin wê demê û niha jî li Serhedê wek giregir û arîstokratên kurd hatine nasîn. Di sedsala 19an de jî vê koma Torinê, axayê kurd yê herî hêzdar Huseyîn Axayê Çonk-Deve alîkariya kurdên êzdî kiriye bona ku ew li Sînegê cîwar bibin.¹⁴ Huseyîn Axa bi xwe jî havînan bi tevî eşîra Zilan li Sînega Mam Zeydî dima.¹⁵ Angorî Jaba dema Huseyîn Axayê Çonk-Deve wefat dike, li gundê Pîfîka Jêrîn (Pîfîka Şêxan) nêzîkî Qaxizmanê tê binaxkirin. Şênîyên gundên Torina Mala Kose ku berê havînan diçûn zozanên Sînegê, paşê jî xwe re zozaneke nû li aliyê Dîgorê nêzîkî wan 16 gundên êzdî dibînin. Heta niha jî ev kurd jî baharê heta payîza dereng li vê zozana bi navê Nebîyurdê dimînin. Piştî mirina Huseyîn Axayê Çonk-Deve, jî heman malbatê kesî ne din sereketiya Kurdên Şemsedînov dîkin. Ji wan hin kes paşê dibin general û serbazên rûs wek Gulî Cewar Axa, kurê wî Elî Eşref Paşa. Mezînekî din Hemîd Beg bû. Kurdên êzdî û kurdên Torina Mala Kose wek alîkar û piştgirê rûsan hatine nasîn, hevkarîya wan, ew di jîyana rojane de jî nêzî hev kirine. Warên wan jî nêzîkî hev bûne. Ji Qaxizmanê, Pervavûd û Qulpê bigre heta Îdirê gelek gundên Torinê hebûn. Dengbêjê navdar Evdalê Zeynîkê jî di kilameke xwe de navê Sînega Êzdiya û navên çend mezinên Torina Mala Kose bi hev ra dide:

... Lêxe, di Sînega Êzdiya re

Di Çemçe re, di warê Huseyîn Axa de xar be

Li ber derê Gulî Cewar Axa

Axayê Torina Kose û Huseyîn Axayê Çonk-Deve peya be

Fîncanek qawe vexwe

Bira can û bedena te belav be

*Bira ji bona kekê min zewk û şîfa be...*¹⁶

Tê gotin ku di sedsala 19an de axayê kurd Huseyîn Axayê Çonk-Deve bi xwe jî havînan bi eşîra xwe ya bi navê Zilan li zozanên Sînega Mam Zeydî dima.¹⁷ Wek mînak li gundê Onbulaxê gelek mînakên dostaniyên birîqî, germ û nejbîrkirî di navbera kurdên êzdî û kurdên Torina Mala Kose (Kurdên Şemsedînov) de derbas bûne. Bi taybetî jî giregirên Torina Mala Kose wek Gulî Cewar Axa û kurê

¹⁴ Angorî agahiyên devkî Huseyîn Axa gelek xurt bûye, bona vê yekê navê wî danîne Huseyîn Axayê Çong-Deve. Binêre: Rohat Alakom, *Torin-Arîstokratên Serhedê*, 2009, Avesta, rûp.60-65.

¹⁵ Mehmed Hurşîd [Paşa], *Seyâhatnâme-i Hudûd*. Çevrimyazi: Alâattin Eser, 1997, Simurg, rûp.264.

¹⁶ Ahmed Aras, rûp.55-56.

¹⁷ Mehmed Hurşîd [Paşa], rûp.264.

wî Elî Eşref Paşa (generalên rûs) gelek hewl dane bona ev dostanî her mayende bimîne.¹⁸ Kurdekî Ermenîstanê Qeymezê Mihê Pîrê ku 120 salî bûye di bîranînên xwe de qala van mezinên Torinê û rojên bihurî dike.¹⁹ Em di edebîyat û folklorê kurdî de jî rastî hebûna wan tên. Mijara keçên Torinê yên bedew wek mînak di vê kilama bi navê Sînegê de jî şopa xwe hîştiye. Di cihekî kilamê de em van rêzan dibînin: “*Torinê ez ê terka çav û birûyê te yê belek nadim/heya ser ruhê min peya nebe qasidê vê felekê*”. Kilama Sînegê cara pêşîn ji aliyê dengbêj û hunermend Ordîyê Kotê de hatiye gotin, şaxeke wê ya ku Hozan Şemdîn dibêje jî heye.

Romantizma zozanên Sînegê

Havînan gelek gund û êl derdikevin zozanên Sînegê. Sîneg bahar û havînan gelek şên dibe. Hewa wê zef paqij û hênîk e. Bedewî û xweşîkbûna çîyayên Sînegê bala nivîskaran kişandiye, Seidê Îbo di gelek destpêkên beşên romana xwe ya bi navê Rêwî de çîyayên Sînegê wek bûkeke xemilandi dide nasîn. Wek mînak dema bahar tê nivîskar wiha dibêje: “*Li quntara çîyayê Sînegê kerî pez kito kito bûbû diçêriya. Wexta merva dûrva lê dinêriya, te diqot zozan xalîçe ye, kerîyê pêz nexşekî wê*”.²⁰ Dema payîz tê herême, vê carê nivîskar wiha dibêje “*Kulîlkê Sînegê êdî çîlmisibûn... Te diqot Sîneg pîr bûye*”²¹ û “*Çîyayê Sînegê xemla xwe dawêşand*”.²² Hin lêkolêr dibêjin ku peyva Sînegê ji peyva rûsî snag (berf) tê, Sîneg jî tê wateya herêma bi berf. Wisa xuya dibe peyveke hîndo-ewrûpî ye.²³ Ev peyva di zimanê tirkî de jî tê wateya mêş yan jî vizik.

Ne tenê ev tekstên pexşan, çend berhemên zargotinî, bi taybetî hin kilamên kurdî jî me dibin Zozanên Sînegê. Wek mînak kilama Sînegê ku bi dengê hunermend Ordîyê Kotê hatiye gotin balkêş e. Di şaxeke vê kilamê de ku Hozan Şemdîn dibêje em rastî van gotinan tên: “*De lê lê dîne zozanên Sînegê çem kanî ne /*

18 Ahmedê Gogê, rûp.17.

19 Generalên kurd Gulî Cewar Axî, kurê wî Elî Eşref Paşa hin caran çûne Zozana Sînegê: “*Bi gotina Qeymezê Miho, di şerê Loris Mëlikov de (ewî şerê rûsan-tirka yê li salên 1876-77-an re usa diqot) ew 20-25 salî bûye. Ew li gundê Baysizê li Ermenîstanê jî dayikê bûye. Qeymezê Miho navê gendêrê rûsan yê bi eslê xwe ve kurd Gulî Cewar Axî Şemşedînov baş dizanibû. Lê kurê Gulî Cewar Axî – Elî Eşref Beg, ku di sala 1851-ê hatiye dinê, kalkê Qeymez li sala 1914-an ew ditibû û bi wî re dabû-standibû. Elî Eşref Beg Şemşedînov wî çaxî bi rutbê gendêrê eskerên rûsan bûye. Qeymez Miho bîr danî, wekî berî şerê cihanê yê yekemin, hukûm û tesîra Elî Eşref Beg li Serhedê zor bûye, li çayên Sînegê û Tendûrekê girti hetanî deştê Îdirê, her waha berpala başûr-rojavayê çîyayê Elegezê jî di bin bandûra wî de bû. Elî Eşref Beg gendêrê rûsan bû, terbiyet-torê wî bi qanûnên dewleta Nikolayê Padîşê rûs bûn*”. Binêre: Prîskê Mihovî, Qeymezê Mihê Pîrê 120 salî ye, Malpera Avesta, 16/9 2012.

20 Seidê Îbo, *Rêwî*, 1979, Sovetskaya Grog, rûp.4.

21 Seidê Îbo, rûp.72.

22 Seidê Îbo, rûp.188.

23 Spasî lêkolêr Mucahîd Hun dikim bona ku wî bala min kişande ser koka peyva Sînegê. Bi rûsî peyva snag tê wateya berf (bi swêdî jî berfê re snö dibêjin), ji peyva snag peyva snejniy jî hatiye efrandin.

De tu rabe destê min evdalê xwedê bigre / Nava çem û kanîyan, gul û gulçînên Sînegê bîgerîne". Di kilama bi navê Sînega Hesînîya de jî wiha tê gotin: "*Kawê Sînega me Hesînya wê bi xarda/Morî-mircanê xelqê têlî delal giran in, ser sîngê zer silav da/Bira Xwedê mirazê miraxxaza bike, mirazê min kawa-kubar ji êvarda*".²⁴ Şeroyê Biro di kilama Şevavê de dirêji Sînegê dibe: "*Ez teyr im teyrê van bilindan, ketime bereka Sînegê...*" Di dawîya kilamê de Şeroyê Biro dengê xwe bilind dike: "*De negrî nelorîne, van hêşiran li ser suretên sor-gevez de nebarîne*". Yek ji wan kilamên Aramê Tîgran jî ser Sînegê ye. Ev kilama bi navê Sîneg, bi vê rêzê dest pê dike: "*Sînegê ber zînêr de*". Di cîhekî de rêza "*Min jimêrî sed sî mal tê de*" derbas dibe, ev yeka nîşan dide ku dîlketiyê mêrîn berê xwe daye gundê Sînegê. Paşê em van rêzên evîndariyê dibînin: "*Ez hatim yalê we de... Şiklê min paşla te de*". Mirov baş dibîne van salan di kilamên kurdî de romantizmeke Sînegê ya mezin peyda bûye.



Jiyaneke aram di bin konên reş, çadirên spî û di nav kerîyên pêz de

Teksteke otobîyografîk di derbarê Sînegê de

Zimanzan Çerkez Bakaev di destpêka teksta xwe ya ku qala Sînegê dike, pêşiyê gundê xwe Zerebxaneyê dide nasîn.²⁵ Li vir tê gotin ku gundê Zerebxaneyê li devera "Çela Sînegê" cîh girtiye. Du navên gund hebûne: Zerebxane û Gundê Mîstê Kalo. Navê vî gundî di tekstê de wek Zerîbxane derbas dibe. Di hin çavkanîyên din de wek Zerîfxan²⁶ yan jî Zerîfxane²⁷ hatiye nivîsîn. Di cîhekî de jî

24 Ordixanê Celil û Celilê Celil, *Zargotina Kurd I*, Izdatelstvo Nauka, 1978, rûp.412.

25 Li herêma Qaxizmanê jî gundekî bi navê Zerebxane heye.

26 O. C. Calilov, *Siranên Kurdaye Tariqiyê*, 2003, Sankt Petersburg, rûp. 455-457.

27 Ahmedê Gogê, *Dengê Kal-Bavê Me*, rûp.16.

wek Zarîbxana derbas dibe.²⁸ Ev gunda li hêla Sûrmeliyê, nêzî bajarokê Qulpê li herêma Sînegê bûye.²⁹ Li gund qasî 25-30 mal diman. Angorî Salnameya Qefqasê sala 1909an di vî gundî de 295 kes hebûne. Herdu navên vî gundî di kilamên kurdî de jî derbas dibin. Di kilama bi navê Ahmedê Hesîyê Dûdê de wiha tê gotin: “Çawa dengê tvinga Elî, Ahmedê bira kekê Karê, apê Bedir, Zurbê nayê gundê Mîstê Kalo, Sînega şewitî, Zerîbxanê, binatara gêlî”. Di kilamê de qala “Gul û sosinê zozanê Sînegê” tê kirin: “Li Sînega xopan gul û sosin hevra tev seridîn”.³⁰ Ji alîkî de jî stranbêja jinî ji ber girtin û kuştina hersê birayan vê zozana xweş wek cîhekî “şewitî” û “xopan” dinavîne, êş û kederê wê mezin e. Ev kilama ku ji alîyê Şeroyê Biro de jî tê gotin wek kilama “Gundê Mîstê Kalo” û “Ehmedê Hesê Silo” jî tê nasîn. Ehmed, Elî, Emer, sê bira bûne. Elî keçeke Sîpkî direvîne dibe gundê Xirbê Sor. Li wir şerek derdikeve ev hersê bira kesine din dikuji, malbat tarumar dibe. Kilam ser van hersê birayan e. Şeroyê Biro di kilama Gundê Mîstê Kalo de wiha dibêje:

“Heyfa mi tê li wê heyfê, heyla korê nemayê/Çawa mal da mane cote bûkê ser-bixêlî”.

Angorî teksta Bakaev gundê Zerebxaneyê bînpêya çiyakî mezin, li ser dûzekê cih girtiye.³¹ Navê wî çiyayî Dûmanliyê bûye. Serê çiyayê Dûmanliyê wek di wênayê gundê Zerebxaneya îroyîn de jî xuya dike gelek zinar û kevîrên mezin hebûne:

*“Wexta meriv li wan zinarêd terikî dinhêrî, ecêb dima, saw dikete dilê mêriv. Wekî ew nişkêva ji ciêd xwe bileqîyana, ewê rast tot bibûyana ser gundê me û wî çaxî wana wê di nava çar û pênc deqada gund batmişkirana. Lê bi bextê gundiara ev yek nediqewimî. Wan kevira wusa ser hevda pal dabûn, hev mehkem girtibûn erdêda çûbûn, ku tu qewata nikaribû wan ji cî bileqîne. Eva xilxilê kevira cîê gura, rûvîa û tabêd dinê bû, lema jî navê wî danîbûn “Xilxilê gura”. Vira gele mar, margîşk, dûpişk jî hebûn. Nava van kevirada şîlan û pincarêd başqe başqe hêşîn dibûn, lê gundî tîrsa gura û mara nedîwêrîn biçûyana wê derê ew berevkirana, kê jî dil dikir, wan bi mêşoka tirşo, şîlan, catirî û pincarêd mayîn danîne malêd xwe”.*³²

28 Kavkazskij Kalendar Na 1910 God, Tiflis, rûp.201, 255.

29 Di hin çavkaniyan de wek Sîneg derbas dibe.

30 O. C. Calilov, *Stranên Kurdîye Tariqîyê*, rûp. 455-457.

31 Ahmet Çolak jî Îdirê di meha Tirmixê/2020an çû gundê Zerebxaneyê ziyaret kir û çend wênayên vî gundî û gundên cînar kişand, ji me re şand. Gelek spasî wî dikim.

32 Ç. X. Bakaev, rûp.203.



Gundê Zerebxaneya îroyîn (Foto: Ahmet Çolak)

Çerkez Bakaev di vê teksta xwe de bi hûralî qala şivanên gund dike. Şivanên bi navê Memo (apê nivîskar) Çoloyê Kalo, Sûtoyê Kakil û Kotê Emo mî çêrandine. Mistoyê Dado û yên din ku ji gundê Asîblaxê hatine jî kavir diçêrandin: *”Şuxilê şivana wê demê zefçetin bûye. Apê minî Memo jî (birê bavê minî helal) şivan bû. Ewî nava şivanêdê la hesinîanda dihate hesabkirinê çawa şivanekî başî pîspor... Memo usa jî dengbêj, bilûrvan û çirokbêjekî eyan bû, ewî gele serhatîdê başqe başqe jî zanibû... Êvarekê, çaxê mîna berê oda meda dîsa tijî merî bûn, ewî eva serhatîa hana, ya ku hetanî naha jî ji bîra min naçe, hazira ra gilî kir”*. Wek li vir jî dîyar dibe yek ji beşên dirêj yê vê tekstê, ango serpêhatîya Fêrîk û Sûsik e ku ji aliyê şivan Memo de hatiye vegotin.

Serpêhatîya Fêrîk û Sûsik

Di nav teksta Bakaev de beşa here balkêş bêgûman serpêhatîya Fêrîk û Sûsikê ya trajîk e ku li herêma Sînegê derbas bûye. Dema şivanên gundê Zerebxaneyê pezên xwe dibin serê çiyê bona çêre, ew li wir raştî du kesên nenas, xortekî bi navê Fêrîk û keçeke bi navê Sûsikê tîn. Paşê rûdinên ew xwe bi şivanan didin nasîn. Fêrîk qala hemû serpêhatîya xwe û Sûsikê dike. Ew ji gundê Tendûrekê bûne. Dayîkên wan qîzapên hev bûne, xwestine Fêrîk û Sûsik dema mezin bibin bi hev ra bizewicin. Dema

salên wan yên xortanîyê û keçanîyê tèn, êdî dilê wan dikeve hev. Paşê dê û bavên Fêrîk diçin xwezgînîyê Sûsikê, wê ji kurê xwe Fêrîk re dixwazin. Dema diçin xwezgînî, qelend dibirin û şîranîyan dixwin, êdî lingê Fêrîk bi şabûna erdê nagrin, dixwaze wek teyran bifire. Berbe êvarê dikeve nav mitalan, dibe pirtepirta dilê wî. Paşê mizgînî tê, êdî nûçeya zewaca Fêrîk û Sûsikê zû li gund belav dibe.

Demek derbas dibe, bavê Fêrîk nexweş dikeve û paşê dimre. Vê carê bavê Sûsikê, Mîlo poşman dibe, tîne keça xwe dide kesekî din, Sosinê kurê Sebrîyê Kalo. Sebrîyê Kalo kesekî dewlemend bûye, xweyê 600 serî pez û gelek dewar bûye. Sê jin û gelek kurên wî hebûne. Piştî ku Sûsikê bêdil didin Sosinê kurê Sebrîyê Kalo, êdî dinya Sûsikê tarî û reş dibe, hildiweşe. Paşê Fêrîk û Sûsik bi dizîka gotinên xwe dikin yek, cîhekî hev dibînin, rojeke bi baran, dema ewr dikin teqereq ji gundê Tendûrekê derdikevin, berbi aliyê çîyayê Dûmanliyê direvin, li wir xwe di şkeftan de vedişêrin. Dema Fêrîkê ji gundê Tendûrekê gotinên xwe bi dawî tîne, şivanên gundê Zerebxaneyê dixwazin alîkarîya wan bikin, wan bibin gund. Ew çî dikin nikarin wan îqna bikin. Şivan kêr û şiveke xwe didin wan, paşê ber bi pezê xwe diçin. Di vê navberê de çend roj derbas dibin, şivanên Zerebxaneyê dişa berê pezê xwe didin serê çîyayê Dûmanliyê bona ka mêze bikin Fêrîk û Sûsik hela hê li wê derê cîhê xwe yê berê ne, yan na. Diçin digerin, diqîrin, diqîjin lê belê tu bersîvekê nagrin, rastî tu kesî nayên. Paştê dişa vedigerin nav pezê xwe.

Çend roj derbas dibin şivanên Zerebxaneyê biryar digrin rojekê berê xwe bidin aliyê topên Tendûrekê, gundê Fêrîk û Sûsikê, belkî ew rastî berxvanên vî gundî bèn û fêr bibin ka tiştek nehatîye serê vî xortî û vê keçikê. Ew di rê de rastî berxvanekî tèn, hevalekî Fêrîk bûye. Paşê ew ji van şivanan re dût û dirêj qala çîroka Fêrîk û Sûsikê dikin. Piştî ku kur û xulamên Sebrîyê Kalo hîn dibin wekî Fêrîk aniye Sûsik revandiye hemû çek û sîlahên xwe hildidin, li pey şopa wan dikevin. Demekê lê digerin wan nabînin. Wextek derbas dibe, carekê mêze dikin ku Fêrîk û Sûsik li ber şkeftekê rûniştine. Diçin pişt ve lêdixin Fêrîk dikuvin, ji jor de davêjin jêrê.

Wê demê Sûsik jî direve hildikişe ser kevirekî bilind disekine. Sosinê mêrê wê dema nêzîkî wê dibe, ew mêrê xwe dixapîne bona aliyê din binêre, nişkêva kêrê ji piştê xwe derdixe Sosin dikuje. Paşê ew tîne xwe jî davêje jêrê can dide. Paşê 6 kurên Sebrîyê Kalo û xulamên wî bedenên Fêrîk û Sûsikê li wir dihêlin, tenê bedena Sosin hildidin, vedigerin gund. Kirasê Fêrîk yê bi xwîn jî dibin nîşanî dayîka wî didin bila ew bizanibe ku êdî kurê wê can daye. Dema dayîka Fêrîk dibihîse û

dibîne ku kurê wê kuştine, dîn dibe: *"Gelek wext ji wê rojê bûhuriye. Lê gilî dikin, wekî heta naha jî, şivan, gavan, rêwî li çîa dengê wê jinika marûm dibihên, ew gazî kurê xwe dike: Fêrik... lawo... were mal, were"*.³³

Koça ji Sînegê

Bakaev di dawîya teksta xwe de cîh dide salên rev û beza kurdên êzdî ku di sala 1920an de Sînegê vala dikin. Kurdên êzdî ku li Sînegê mane piştî Şerê Cîhanê yê Yekem dijiwarî û tengasiyên mezin dibînin. Dixwazin derbasî Ermenîstanê bibin. Berî ku koç bikin çend kesên serwext wek Reşî, Cemal û Arşakê ermenî ji gundê cînar dişînin Ermenîstanê bona ka bizanibin rewşa wan çawa ye û angorî wê jî ew tivdarekê xwe bikin. Dema ew vedigerin, êdî kurdên Zerebxaneyê bahara sala 1920an ji gund bar dikin, diçin Ermenîstanê. Rêber didin pêşîya koçê, rê nîşanî şivan û koçê didin. Ev cara yekem bûye ku ji gundê xwe derdiketin, berê xwe didan welatên nenas û gumanên teze. Wan zanibûye êdî ew heta hetayê lingê xwe navêjin vê axê: *"Çaxê koç hinekî ji gund dûrket, mêr û jin gelem çaran disekinîn, paştî dizvirîn, li gund û malêd xwenê avîti dihêrîn û hineka ji wana xwe nikaribû zewtkira, çavêd wana tijî hêsir dibûn"*.

Di nav robarê Erez re derbas dibin, tîr Ermenîstanê. Pêşîyê li gundekî dimînin, paşê berê xwe didin kûraya welêt. Çerkez Bakaev di dawîya teksta xwe de qala jiyana xwe ya di nav êtimîyê de derbasbûyî, dike: *"Min nedixwest, wekî şagirt, hevalêd min zanibin, ku dê û bavê min tunene, ku ez êtim im. Mim şerm dikir, ku ez êtim im, lema jî pey dersan ra ez diçûme bûlvarê. Li ku hembel û pale berev dibûn, hîviya xebatê disekinîn, wekî merikîra pevkevîm ku ew çawa bavê min bê bal direktorê mektebê"*.³⁴

Bakaev di dawîya teksta xwe de dîyar dike ku herdu kurapên wî Biroyê Memo û Rizganê Memo di sala 1929an de ligel komeke kurd diçin Lenîngradê. Ji wan Rizgoyê Memo di sala 1930an de nexweş dikeve, li wir dimire. Biroyê Memo jî piştî xwendina xwe vedigere Rewanê û çend salan dibe serekê Teknikûma Kurdaye Pedagogîyê ku li wir mamosteyên kurd perwerde dibûn. Bakaev jî di heman dibistanê de dersdarî kiriye.³⁵

33 Ç. X. Bakaev, rûp.213.

34 Ç. X. Bakaev, rûp.234.

35 Ç. X. Bakaev, rûp.235.



Dîmenek ji zozanên Sînegê (Foto: Ahmet Çolak)

Romana Qaçaxê Mirad: Rev û star

Nivîskar Qaçaxê Mirad ku li gundê Tendûrekê hatiye dinê, di destpêka perçe-romana xwe de pêşiyê qala çirokbêjî û destanbêjiya kurdî dike. Yek ji wan çirokbêjan Şêx Şeroyê ji Sînegê bûye ku berî sedsalî koçberî Ermenîstanê kiriye. Nivîskar wî, wek “Padişahê çirokbêjan” dinavîne. Di derbarê van çirokbêjan de jî nivîskar wiha dibêje: *“Her yek ji wan kitêbxaneke terix û medeniyeta cimaeta xwe ye zêndî bû”*.³⁶ Ev çanda devkî: *“mîlkê wan ye neparevekirî”* bûye. Beşa yekem ya vê berhemê bi xweşî û bedewîya herêma Sînegê dest pê dike.³⁷ Piranîya bûyerên romanê li gundên Sînegê û Tendûrekê derbas dibin. Li gundê Sînegê axayekî navdar diji, Kolos Axa. Bi zilmkarîya xwe hatiye nasîn û bi paşayê tirk Demîrlî Paşa re hevkarîyê dike. Xizmetkarên wî jî wek wî kesine xirab in. Malbata Eslan û malbata Abas kesine belengaz û xebatkar in, bi keda xwe jiyana xwe didomînin. Evîna kurê Eslan yê bi navê Şîrin û keça Abas ya bi navê Nazê di nav gund de zû belav dibe. Him cînarên hev bûne, him jî dema alîkarîya hev dikirin Şîrin û Nazê gelek caran hevdu diditin:

“Gundîyan texmîn kir wekî Naza bîstsalî û Şîrin bin çavada hevdu dinêrin û surek orta wanda heye. Dê-bavên wan jî ev yek texmîn kiribûn û gîlî dabûne hevdu, wekî Nazê Şîrin ra bixwazin. Lê van mehêd paşin da îdî hemûyanra eyan bû, wekî zûtirekê bizna kûvî wê destê Şîrinda bibe ya kedîkirî. Neferêd mala Abas û neferêd

³⁶ Qaçaxê Mirad, rûp.49.

³⁷ Qaçaxê Mirad, rûp.57.

mala Eslan, ewqasî nêzîkî hevdu bûbûn, wekî ne ku tenê xebatê da alî hevdu dikirin, lê derheqa pirsêd ferz da li hev dişêwirin".³⁸ Carina dema kar malbatên wan alîkarîya hev dikin, Şîrin û Nazê jî tevî wan dibin, ji xwe re laqird û henekan dikin, carina Nazê "soromoro" dibe.³⁹ Dilê kurê Kolos Axa, Têmûr jî dikeve Nazê. Kolos Axa dixwaze wê ji kurê xwe re bûk bîne. Diçe xwezgînî jî. Naza ku wek "Xezala çîya" tê nasandin, dema vê yekê dibihê bi çolê dikeve. Şîrin paşê wê dibîne. Di dawîyê de Şîrin tîne Nazê direvîne dibe mala kirîvê xwe Xêço ku wê demê bi zarokên xwe ve tevayî li Qersê dimîne. Kirîvê mala Eslan, Xêçoyê ermen ev qasî sî salan e her baharê tê Sînegê, li wir kar dike, payîzê careke din dikeve rê diçe Qersê. Di navbera wan de dostanîyeke neditî di van salan de pêk tê. Dibin destbirakên hev. Kurên Xêço, Surên û Karo jî gelek alîkarîya malbata Eslan dikin. Dema Şîrin, Nazê direvîne têkilîyên axayê hêzdar Kolos Axa û gundîyan berbi xirabîyê diçe. Di navbera zîlamên Kolos Axa û gundîyan de şer derdikeve, gelek kes tên kuştin û birîndar dibin. Paşê ev gundî ji gund Sînegê bar dikin, diçin li gundê Tendûrekê cîwar dibin.⁴⁰ Qasî 8 salan li wir dimînin. Êdî Eslan û kirîvê wî Xêço ne li jîyanê ne, mirine. Jina Eslan, Şemê jî diçe dighêje kurê xwe Şîrin ku li Qersê dimîne. Şîrin carekê tê Tendûrekê dixwaze here Sînegê heyfa bavê xwe ji Kolos Axa hilîne. Lê birayên wî bi aqilane li hemberî vê sergermîya Şîrin derdikevin, nahêlin.

Di dawîya Şerê Cihanê yê Yekem de (1918) hemû kurdên êzdî yên li alîyê Dîgorê/Qersê û êzdîyên Sînegê/Surmeliyê berê xwe didin Ermenîstan û Gurcistanê. Navê vê romana nîvcomayî ya Qaçaxê Mirad, "Rev û Star" jî van salên mihacirîyê tîne bîra me xwendevanan. Wê demê şer, belangazî, xela, gelek kul û derd di carekê de ser hev tên. Dema gundê Sînegê vala dibe, hêrsa Kolos Axa bilind dibe û gotînen tehdîtkar ji devê wî derdikevin: "*Hûn diçin bibin xulamê uris û ermenîyan. Poşman nebin! Bira lingê we daha li Sînegê nekeve! Kî ku para vegeriya sax ji destê min xelas nabe*".⁴¹

³⁸ Qaçaxê Mirad, rûp.61.

³⁹ Qaçaxê Mirad, rûp.62.

⁴⁰ Qaçaxê Mirad, rûp.118.

⁴¹ Qaçaxê Mirad, rûp.122.

Di vê koçberîyê de kurdên êzîdî dikevin rê dero dero dibin. Şîrin bi zarokên xwe yên piçûk jî tevî koçê dibin. Di rê de dayîka xwe Şamê û keça xwe ya piçûk Kawê – hezkirîya xwe ya delal di rê de winda dike. Ev berhema êdî ber bi dawîyê tê. Zarokên mayî birçî ne, nan dixwazin, ew du roj û du şev in di rê de ne. Bavê zarokan Şîrin dilezîne, dixwaze here gundekî nêzîk bona parî nan bibîne, lê belê ji paşva venagere.

Alîyên hevbeş yên herdu tekstan

Cîh û demên bûyerên ku di teksta Bakaev de derbas dibin, vê teksta Qaçaxê Mirad tîne bîra me. Warê kal û bavên herdu nivîskaran jî Sîneg e. Bi vî awayî herêma Sînegê û bi taybetî jî gundê Tendûrekê di van herdu tekstan de jî derdikeve pêşîya me. Di teksta Çerkez Bakaev de kesên bêçare ji Tendûrekê direvin û di teksta Qaçaxê Mirad de jî kesên di tengasiyê de berê xwe didin Tendûrekê.

Çerkez Bakaev zêdetir gundê Zerebxaneyê û Qaçaxê Mirad jî gundê Sînegê derdixe pêş. Bona ku ev nivîs di hişê xwendevanan de şopekê bihêle divê ez piçekî bala wan bikşînim rojên îroyîn. Dema îro qala Tendûrekê tê kirin, tavilê navê nivîskarekî me yê nûjen Naci Kutlay tê bîra min. Çimkî ev gund, gundê kal û bavê wî ye. Ew di bîranînên xwe de diyar dike ku di gundê wan Tendûrekê de berê kurdên êzîdî û hin malbatên ermenî hebûne.⁴² Di gund de niha gelek malbatên bi paşnava Kutlay dijîn. Bi saya van tekstan em xwendevan jî dikarin di vê coxrafya zêde nenas de derkevin seyranekê edebî, folklorîk, dîrokî û coxrafîk.

Herdu çavkanî jî ji xwendevanan re du serpêhatîyên evîndariyê yên bi dilşewad pêşkêş dikin. Bakaev evîna Fêrîk û Sûsikê, Qaçaxê Mirad jî evîna Şîrin û Nazê bi zimanekî gelek xweş vedibêjin. Peyva dil di van herdu tekstan jî rolekê mezin dilîze. Di herdu çavkanîyan de ji dilketî gelek hewl didin bona biçin bigêjin mirazên xwe, bi mirazê xwe şa bibin, wek dawîya her çîrokekê. Lê belê gelek caran jî wek di folklorê kurdî de jî cîh digre, ew dibin kesine “bêmiraz”. Tevî ne bi daxwaza wan be jî dil wek hêzeke efsûnkirî formekê dide jiyana van evîndaran. Ev yeka kilama Mihemed Şêxo ya bi navê “Dilperîşan im” û kilama Şakiro ya bi navê “Dilê rezîl” tîne bîra me. Şakiro têgehê diguhirîne jî: “Rezîlo

42 Naci Kutlay, *Anılarım*, 1998, Avesta, rûp.12.

dilo”. Di kilameke kurdî de jî em rastî vê bêgavîyê tèn: “*Lawiko destê min berde/ Evînî kul û derd e*”. Çawa em dibînin tam berî sedsalî li zozanên Sînegê evîndariya dilketiyan jî ber çend tengasî û dijiwarîyan bûye derdekî bêçare.



Çend jin û zarok ji gundê Tendûrekê, ji malbata Nacî Kutlay (Piştî koça êzdîyan)

Encam

Piştî serobinobûna rewşa polîtîk li herêmê êdî em dikarin bêjin ku Sînega Êzdîya jî sala 1920an vir de heta niha jî bê êzîdî dimîne. Rengekî etnikî yê herêmê êdî diçilmise. Ji vê çandê tenê çend kilam, çend wêne û du tekstên dirêj jî me re şunda dimînin. Di dema amadekirina vê nivîsê de ew kilamên Şeroyê Biro, Ordîyê Kotê, Aramê Tîgran û Hozan Şemdîn yên li ser Sînegê min bi dehan caran guhdar kirin. Çend wêne û fotoyên xweşik jî ez hercar birime Sînegê. Bêgûman zêdetir tekstên Çerkez Bakaev û Qaçaxê Mirad jî min re rêberî kirin. Li jor bi alîkariya van herdu tekstên kurdî ku ji aliyê Çerkez Bakaev (1983) û Qaçaxê Mirad (1981) de hatine nivîsîn, me bala xwendevanan kişande ser war û ştareke kurdên êzdî ya berî sedsalan: Sînega Êzdîya.

A di dilê Colo da bêhemdi hatibû ser zimanê wî. Poşman jî bûbû, lê gotin ji devî wî derketibû.

Meleka bêbext di cîhê xwe da hişk bû, nizanibû ka çi bersîvê bide birayê xwe yê lome jê kêm nedibûn. Di nav bihîstekê da bi hazaran tiştên nebixêr hatine bîra wê. Colo ne merivekî xirab bû, ji dost û dujminan ra, ji her kesî ra bi mafqê bû. Jê were xwestin yan na, alîkarîya herkesî dikir. Ji bo karê ku dikirî, heqê wî bidana, nedigo “na”, lê nedabana jî, dengê xwe nedikir, bi parîyek nan, bi aveka sar jî razî dihat. Colo şivantî jî dikir, lê ew kar ne bi dilê wî bû. Ji mehbetê pir hez dikir û bi xwe jî pir deng dikir. Coloyê me yê ku devê wî du deqa nedisekinî wê li çolê bi kê ra deng bikira, bi ker û bi bizinan ra? Ji ber wê jî piranî karên di nava gund da dikirin. Li ber destê hostayên diwaran diçû û dihat, kerme radikirin, ka diavête hundir, genim û ce bar dikir, diewirand...

Colo li çavên Meleka ku nizam ji tirsê, nizam ji kelecane benz lê veqitî

bû, mes kir. Wî dixwast ji Melekê ra behsa mesela xwe bike, lê nedizanî ji ku da dest pê bike. Melekê çavên xwe kiribûn çavên Colo, wekî ku bêje „De bêje, ka te dîsa çi kir?“ Bêdengîyeke giran xwe avêtibû ser oda ku ew tê da bûn. Ji Colo pirtir Melek di bin wê bêdengîyê da aciz dibû. Melek bê ku gotinekê bike, piştî xwe da Colo û çû aşxanê. Colo jî da pê wê. Çû xwe bi piştê sparte stûnê nava aşxanê, “Tişt tune lê, ewa mala Kino bi min kenîya.” Qala Fata bûka Kino, jina lawê wî yê mezin Ûskê dikir. “Çing bi te kenî?” Melekê bédil li Colo vegerand. “Fatê tim bi te dikene, ê bi xwe jî dibê, ê pir yare te ye.” Melek li hêviya bersîveke ku ji devê Colo derketa bû. “Erê lê, pir yare min bûye, min di, çiqas yare min e.” Colo bi pilepil ji aşxanê derket û çû xwe li ser piştê avête ser mindera quncê odê. Demekê xwe vir da û wê da bada û dawîya dawî kete xewê.

Melekê hat di ser Colo ra mes kir. Colo ketibû xewa kûr. Çû betanîya şêrmûyî ji ster dîna avêta ser Colo û wekî xwestibe dengê xwe bighîne Colo go „bêxem û tûro“.

Melekê jî dizanî ku Colo ji wê ra qala meselê nake, birayê xwe nas dikir. Bihîstekî xwe da kêleka Colo rûnişt, lê gotina Colo şik kiribû dilê wê, tu hizûr tê da nehiştibû. Bê ku deng derxe, rabû şimikên xwe kirin ningê xwe, derî hêdî girt û berê xwe da mala Kino. Melek pir nedigerîya, hevalên ku ew here ba jî tunebûn. Rojê carekê çatîya xwe dikire dest xwe diçû ser kanîyê. Bi rê da, yan jî li ser kanîyê kesek bidîya û wan ji wê pirsek bikira, deng dikir, wekî din serê xwe dikire ber xwe diçû û dihat, karên din ên wekî danûstandinê jî Colo dikirin. Yek jî serî carê diçû mala Kino, ba Fatê, ew jî piştî ku Fat wekî bûk hate wê malê. Fatê dilnerm û bi rehm bû. Ji wê re ne heval be jî, Melekê xwe li ba wê baş hîs dikir û dikaribû bê ku têkeve nav şorê, bi saetan li ba wê rûniştiba.

Melekê derîyê xarima Mala Kino yê hesinî vekir û kete hundir. Bi ketina wê a hundir va Kino ji ser sikanê daket û go „Were keça min! Tu hatî ba Fatê? Ê li hundir e, de here.“ Melekê xwe da kêlekê da ku Kino bikane derbas be. Melek hurik hurik bi pêlekanên sikanê da helkişt û hat li ber derî sekinî. Bi dengê ku belku bi xwe jî nebihîstî go „Fatê“. Deng ji hundir derneket. Careke din

go „Fatê“. Vê carê divîya ku Fatê bi-bihîsta. Tepe tepa nîngan bihîst. Fat hê negihîştibû ber derî go „Melek, tu yî?“ Heta ku Melek bê «erê», Fat hatibû ba wê. Fatê „Melek tu rûne, ez sifrê berhev kim, ez tîm.“ go û çû hundir. Melek di cîhê xwe da rûnişt û xwe da benda Fatê. Pênc deqe, deh deqe çûn Fat nehat, nîv saet çû Fat nehat. Qe deng jî ji hundir nediahtin. “Him va sifrê vê çaxê çî ye” Melekxwe bi xwe fikirî. Xwulî bûbû, xwest here mal, lê nikanî. Tam rabûbû ser xwe, derîyê xarimê vebû . Kino bû. Kino hat li ber Melekê sekinî û jê ra go “Melek, ka Fat?” Melekê bi dengê ji halê xwe nerazî go “Nizam, qey ê di hundir da ye.” Kino dengê xwe nekir, kete hundir, derîyek vebû û dîsa hate girtin. Melek her diçû xwulî dibû ku, derîyek dîsa vebû. Di dengê birêçûyîna ra Melekê zanîbû ku ev Fat e. Fat derket derva. Carekê çû û hat, li ber Melekê sekinî û dengê bi mafqe “Melek, Apkî hatiye, divê ez jê ra xwarinê çêkim. Tu here mal tu ya paşê werî, dilê te bixwaze. Melek neçar bû, dengê xwe nekir, mîna ku hatî, ji sikanê peya bû. Heta ku ew ji xarimê derket, çavên Fatê li pey wê bûn. Bêdil nîngên Melekê ew ber ve mal dikişandin. “Ax dayîka min hebûya, wê destê xwe di ser

vî berdoşî ra bigirta, wê li me xwedî derketa. Hahoy xêra kesî ji kesî ra tune.” di ber xwe da fikirî.

Hat li ber derîyê malê sekinî. Tê-kuta hundir, yan na. Tu derbas nebû, derîyê malê vekir û rasterast çû oda ku Colo tê da raketî. Bi pozê ningê xwe di henava Colo kuta. Colo di xwe da nelivî. Melekê careke din tê-kuta. Bi têtukanê ra Colo vecinîqî, bi zorê serê xwe bilind kir. Colo şaş mabû, nizanîbû ka bê çi. Xwanga wî ya bi rehm û mafqe, tim di dora wî, mîna gurekî devbixwîn di ser wî re sekinîbû. „Çi ye Fatê, tu dîn bûyî, va texbete te yê veng çi ne? Ez rabim, ez ê yekê di cênigê te da vêdim. Di qula belê nim ha, bi şanakî li malka xwe pênc deqa rakevî.“ Colo bi hêseki go, lê dizanîbû ku Fatê çima ew bi vî halî rakirîye. Rabû rûnişt, du cara bawîşk anîn. Fatê go „Colo!“ Fatê qe tu cara ji birayê xwe ra negotibû Colo. Mistefa bû navê ku dê û bavê wan li wî kirîbûn. Mistefa jî nedigotin. Miço bû navê wî yê rastî. Dapîra wî, diya wî û yek jî Melekê ji wî ra digotin Miço. Yê mayîn digotin, biçûk û mezinan digotin «Colo.» Fatê careke din go “Colo!” “Meyîtî min li ber te, tu ê ji min ra qalê bikî ka çi di navbera te û Fatê da qewîmî. Ez berê bihîstekê li mala Fatê bûm. Fata

ku ji min, ji te ewqas pir hez dike, li serçavên min mes nekir. Te çir kir, te çi anî serê jinikê? De bê birongo, de bê, min mebehecîne.”

Colo bêdeng bû, nedikarîbû li rûyê Melekê mes bike. Ji nişka va go “Fat” û birî. “Fat heyê le, bi heft qurana be, ew jineka ê dîn e. Mimagayê ji ku da hat li min qelivî. Min heta niha têderneexist, lê virqeke bi serê xwe bûye.” Colo him digo, him jî di serê xwe da dibir dihanî, ka hertiştî bavê ser Fatê yan na. „Dameweste, bê ka te çi kir?“ Melekê bi hêrs go. Tu temel tune yî, ka were rûne, ez ji te ra yek û yek qala meselê bikim. Melekê xwe da bilingên Colo.

– Do Kino bane min nekir?

– Erê, ji bo kermerakirinê.

– Hi! Min xwe da pê Kino em çûne gomê. Kino go, ji stûna jor heta stûna ber derî divê ez kerma rakim”. Min go “temam.” Me tu pazari jî nekir. Bêla min ê li ba min bû. Ez rabûm bi pozê bêlê min şopa xwe tîş kir. Ji jor da dest pê kir. Nizam qorê duduya bû yan qorê sisiya bû, Fat hate ber derî, go «Colo ji te ra aveke sar binim?» Min go «Erê!» Tu neçû, Fat di dest da bi surehikî tijî av û bi qedehekî va hat. Ava min tijî kir da min. Li dîndara min sekinî. Min av vexwar û qedeh dîsa da wê. Gava

min qedeh dirêjî wê kir, destê wê bi destê min bû. Bi zanatî bû, nizam lê, cîle gupikên wê sor bûn. Min jî fedî kir, serê xwe kire ber xwe.

– Tûû ji we ra! Melekê bi hêrs go. Colo dewam kir.

– Deqekê hiş be. Paşê Fat çû, ez jî çûme ser karê xwe. Tu neçû, Fat dîsa hat. Vê carê jî di destê wê da paketeke marlboro hebû, go “Colo were ji te ra. Aman ma Kino pênehese. Tu venaxî lê, bibe mal, weng rokê nîvanekî te tê, tu ê îkram bikî.» Min destê xwe dirêj kir, dîsa destê min bi destê wê bû. Vê carê ez sor bûm. Te ê bigota xwînê di serçavên min re tavêje, ewqas.

– Fatê çi kir? Melekê ji Colo pirs kir. Colo ji pirsra Melekê aciz bûbû.

– Çi bike, mîna kera kenîya. Bi wê gotinê ra kenê Fatê ku Colo şengi-zandî hate bira wî.

Colo pir dikenîya, xelk jî dida kenandinê. Lê kenekî mîna yê Fatê yê wê rojê, heta niha qe nedîtibû. Di cîhê xwe da helîyabû. Di şûna xwe da bûbû kevir.

– Êê!

– Tam min xwast marlboroyê bikim berîka îşligê xwe, di destê min ra girt.

– “Wîîî” qîrnî bi ser Melekê ket.

– Çi wî? Hewlîyê rameke. Min destê xwe nekşand, wê jî destê min

berneda. Wê go „Kino çû nav zevîya. Yê din jî her yek li derekê ye, zû zû kes nayê mal. Çing wer go, min zanî ku nêt û fêlê wê yê pîs in. Cîle xofekê girtê ser min. Destê min tam kire destê xwe û go „Tirsoneko“. Ninge min cirifin hendik ma ez li erdê kevim. Destê min di destê wê da, xwe nêzikî min kir û ji min pirs kir „Tu dixwazî min paç kî?“ Min dengê xwe nekir. Ew ne, vê carê jî destê min bir da ser pêşîrên xwe. Dilê min qetî, min destê wê kişand û xwe avête derva.

Ji vir şûnda Colo bihîstekî sikinî, ava li ber pencerê girt, vexwar. Nedi-karîbû ji Melekê ra kat bikira, ka paşê çi gewîmiye. Him fedî dikir, him jî nedîbû ku meriva bi xwanga xwe ra li ser tiştê weng deng bikira. Mecbûr bûbû ku çend derewan di nav ke.

Bi wê tirsê min xwe avête der, bêhemdê xwe min go „Kino.“ Ew jî di pê min derket û bi lez xwe avê-te malê. Ez tirsîm, min go, eva dîn a here ji Kino ra bê, Kinoyê min bikuje. Bi wê qîlêrê min çiv da. Ez çûm min xwe di şikeftê da veşart. Paşê çûm ba destbirakê xwe Husîn. Şevêkê li wir mam. Min mes kir, tu hewli tunen, ez fikirîm min go, herhal Fatê ji kesî ra qal nekirîye, ez hatim gund. Hal mesela min va ye xwangê. De bê suçê min çi ye?

Melekê Colo baş nas dikir û ji ber wê ji dizanî ku, Colo meselê wekî qewimîye kat nake.

– Derewa meke Miço! Te tişteki pîs nekir, ne weng e? Bê welle min xwe rû da berneda?

– Pee temel îfade te tunin. To-be ku min tişteki weng kiribe. Na welle xwangê, dilê min qetîya, hîn ji kutekuta dilê min e.

Colo rehet bûbû, Melek ji herwiha.

– Şale Fatê ji kesî ra qalê neke. Suç yê min be jî, yê wê be jî, mêrê wê ji Almanîyê were û ew ê diduya di min da sar bike, nebû ew ê me di Fîzanê ra derxin.

– Na na tişt nabe, Fatê yare te ye. Melek poşman bûbû ew gotina dawî kiribû.

– Erê lê, ê yare min e. Hindik ma min bi qurbana xwe ke. Lê ez... go û gotina wî bi derîyê ku vebûbû ra di dev da ma. Fat bû, hat kete hundir. Bê ku li hal xatirê wan bipirse, “Colo, Kinoyî bi cina kete. Ji min ra go here ji wî berdoşî ra bêje, ma hema were kerma rake. Hê ku gotina xwe xilas nekiribû, Melek keta navberê:

– Fatê, tuyê dibînî, î nexweş e, di nav cîya da ye, nikare. Fatê guh neda ser Melekê, li Colo mes kir.

– Temam, were, metirse, tişt nabe.

Colo bi gotina dawî a Fatê ra, zanibû ku, kes bi meseleyê nehesîyaye. Dilê wî rehet bûbû û xwe hebki tope serhev kir:

– Temam Fatê tu here, ez dest û serçavên xwe bişom, ez ê werim.

Melek gēj bûbû. Nizanî bû ku çi bêje.

– Colo, tu qewata li jinikê nakî, ne. Mîna ku te gotibe, çima jinik were derîyê te?

Kêfê Colo hatibû şûnê. Mîsin kire destê xwe, dest û serçavên xwe şuştin û di mala Kino ra derket.

Colo derîyê xarime vekir, bi tirs kete hundir. Kes tunebû. Di şûna xwe de sekinî. Paşê Fat derket berve wî hat û bi hêrs ji Colo ra go:

– Eow, bêla te yê di gomê da ye, hîn ku Kino nehatîye here kerma rake! Colo dengê xwe nekir, berê xwe da gomê. Fat ji çend gav şûn da di pê wî dihat.

Bi ketina Colo a hundirê gomê ra Fatê devê xwe vekir:

– Wehşo, te qet jin nedîne. Erê te blûze min dirand tu çima min gez dikî. Kero! A va ye ez ê ji te ra dibêjime, tu ji kesekî ra qala vê meselê bikî, eza te ji birayê xwe ra bêjim, ew ê te bi çinî çinî bikin û bavêjin ber kûçikan. Heywan! Fatê tişteki din negot, derket çû.

“Heywan”, Colo xwe bi xwe ev stuyê Fatê gez kiribû. Bi ser vê va
 gotina dubare kir. Bi rastî jî mîna Fatê xwe ji destê Coloyê ku bi carekê
 heywanekî kiribû. Piştî ku Fatê ra bûbû wehşekî xilas kiribû û xwe
 destên wê dabûn ser pêşîrên xwe, avêtibû der.
 Colo nizanibû ku çi bike. Bê hemdî Tîrsa ku paşê bi Colo girtî û mese-
 xwe raheştibû bluzê Fatê û bişkov la wî jî hûn dizanin.
 qetandibûn, bi ser da jî mîna kera



Gilî

Li qada bajarê mezin
 Zarokekî Kurd û penaber
 Bin baran a hûr hûr dibarî
 Li kevokan kûr kûr dinêrî
 Kevokên hebên genim nikul dikirî
 Azad û xwaşik bûn
 Ew kevokên ref bi ref
 Dadiketin qadê û difirî
 Kî dizane
 Dibe ku dilê xwe de
 Gilî dikirin ji Yêzdanê diloan re
 "Xwedê yê mezin
 Xwazî ne penaber bûma
 Ez jî kevokek ji van bûma"

Mem Xelîkan

Zewac û dawet

S. B. Xell

Gotina zewac di zimanê kurdî da bi her şiklên gramatikê bi şûn girtîye. Çendî ku ez pê dizanim li alîye Hakkariyê ji bo zewacê “şû” jî te gotin (hevjin, çûyîna mêr). Wekî din jî di çêrokên alî me de zewac nedihate bikaranîn. Li şûna wê “mar kirin” dihat bikaranîn. Wek mînak: Lawikê egît kela (birc) zept dikir û keçika xezal li xwe mar dikir. Alîkariya heft bira dikir, dujmin ya jî dêw gêr dikir. Xwanga/xûşka wan li xwe mar dikir. Va mîsalana hîn jî zêde ne. Di axaftinên mezinên me de jî pir caran gotinên wek “li xwe mar kir”, “ew herdu li hev mar kirin” derbas dibûn. Bi texmîna min va gotineka kurdî ya pir kevn û qedîm e û eleqa xwe bi kelîma erebî “mehr”ê tune. Çima ku ji “qeling” şun va mehr tê girêdan.

Xwazgînî

Qerara zewacê “bi serî kirinê” ya dê û bavê û malbatê bû. Têsiira kal û pîra gelek zêde dibû. Ji lawikê berzewac pirs dikirin, dilê wî dikirin. Her wekî xortên berzewac keçika di dilê xwe de îşmar dikir; dê û bav, malbat guhbiştî dikirin. Keçikan ew fersend, îmkanên xwe tunebûn, qerara dê û bava bû. Pir caran keçikan ew qerara bê dil qebûl dikirin. Li der dorên me hîkayetên dilgirtinê pir zêde ne. Kilam û stranên îroj

em dinasin, dibêjin yên dila ne, yê ku keçik û lawikên ne giheştine hevûdu, bext û mirazê dilê xwe neînandine şûnê ne. Car caran jî rev dibû, dilgirtîyan qawilê xwe dikirin yek û bi hevûdu ra direvîyan. Velew kî; digotin felan xortî felan keçik revand. Ji dû revandinê li gora edatan ya aşîti çêdibû, ya jî di navbera malbata de dijminatîyaka diwar û dirêj dest pê dikir. Di mesela revandinê da îtibar û prestîja malbatan gelek roleka mezin dilîst. Yên xi-

zan, bêkes pir caran mesele bi aşîti derbas dikirin. Xelkên xizan boyî ne dayîna qeling jî rev tercih dikirin.

Malbata lêwîk bi çend mezinên xwe va diçûn keçik dixwestin. Li gora edatan lihevatinê şûnva cotik gar bi guhê keçikê va dikirin û bi şênayî zixiltiyan şîranî dixwarin.

Di ser nîşan û fatihayê re du yan jî sê sal derbas dibûn. Digotin ma keçik xort, gihêştî be, îş û karê malê bievîsîne, çêyîzî xwe amade bike, alîkarîya dê û bava bike, ma lawik here eskerîya xwe bike. Bêrîya pêz, dotin, şîrlêkirin, mast û penêrçêkirin, tevnkirin, risandin kar û barê jinan bûn bi rû da jî zamanî zevî, ceh û nîskçinandinê alîkarîya mêran dikirin. Heyat û xebat hîn muştêrek bû.

Nîşan, şerbet

Daveta mezin, ya jî bi gotineka din dîlan û şahî piştî xermanan, li devdevî payîzê dest pê dikir. Li dora pir derên Anatoliya Navîn bi vê roj û bûyere re digotin nîşan, şerbet, helaw. Çimakî şerbet (xwêya lîmonê, şekir, fişne, boyaxa rengî fişne) vexwartin adet bû, şîranî jî helaw û qozîyên helawê bûn. Helaw, reçel. Şerbet û xwarin mala lêwîk dianîn. Dawet li mala keçikê çêdibû. Mala keçikê nanê dawetê

dadihinan (şorbe, goştê pêz, xoşava çîran zad/pîlava bulxur), dûva jî bi qozî qozî, çikin çikin helaw li kurikan û mêvanan belav dikirin. Wê rojê mala zava zêr û rela bûkê (ji bûkê ra fistan, xeftan, gore, şarpe, şar, kinc) pêşkêş dikirin.

Şahî, şênayî, listik, bazdan, govend di dîlanê da şûnaka mezin digirt, li gora aborîya xudanan dawet sê çar rojan, heftekî jî diajot. Bi qor û qor, bi xelqe xelqe jin û mêran tevhev govend çerx dikrin. Dol û zirne, bilûr lédiket, kilam dihatin gotin. Bi awayî kilaman govendgerandin gelek xweş bû. Du kesan kilamên dîlanan li dû hev digotin yekî dest pê dikir yên din eynî neqerat ducare dikirin. Ji kurikan re listikên temsîlî wek jina cazû û kalê parsek çêdibûn. Listika qamçî, gulaşê jî cihekî giran digirt.

Ji gundên doralîyan, ji derûdorên pehlîwan, qamçîger dawet dikirin ku ma huner, quwet û qudum, xurtbûyîna xwe bimînin. Pehlîwanên ji derhatinî bi yadîgaran va (wek xalî, pêçik, gore, nemazlix) bi rê dikirin. Li gora adet û rusumên berê bûk û zava tevî şahîyên dawetên nedibûn. Bûk bi çend berbûk/berbûçan va li cîranekî, zava bi hevalek û duduyan va li dereka din dawet temaşe dikirin. Ji merasîma nîşanê şûnva

nezîkî du sê salan keçîka bi bûk be li mala bavê xwe dima. Digotin ma îş û karan hîn bibe, ma alîkarîya dê û bave xwe bike, ma zane û jîr be. Ma lawîk jî here eskerîya xwe xelas bike. Zava xwe ji mezinên malbata keçîkê, bûkê jî xwe ji malbata lêwîk hetanî xwandina nikahê vedişartin. Lawîkê zava bi destûr û alîkarîya xasîya xwe, jinên malê dihat dergistî, yanî bi dizîkî hevdiştina dergistîyan çêdibû.

Heqîw, henne û sîyarkirina bûkê

Salekê ji şerbetê şunva hazîrîya bûksîyarkirinê dest pê dîkir. Herdu alîyan navbera xwe da qelîng dibirîn. Qelîng perên ku bavê lêwîk didan bavê keçîkê. Dê û bavê keçîkê bi va peran diçû bajêr xercê bûke (cotîk xalî, kulav, balîvên dîwara, sandîq, qaw qecax kêmasîyên elzem, w.d.) dîkir.

Herdu malan bangîya heqîwê dîkirin. Mêrîvatîyê/eqreba, nas, ciran, heval û hevrûyan hediye (kinc, xeftan, gore, qimaş, pêçîk, şarpe, şar,

w.d.) dihanîn û pêşkêş dîkirin. Wê şevê malbata lêwîk ekserî jin û kurik hene, êmîş, çerezê xwe heldianîn dihatin mala keçîkê heneya xwe li hev dixistin, şîva malhazîrî, çêrez dixwarin, bazdan, govend çerx dîkirin, hene li keçîk û kurikan belav dîkirin û diçûn.

Dora dinê rojê, mala zava bi zixiltî, tililî dol û zirnê dihatin mala keçîkê. Govend çerx dîkirin. Tiştên bavê keçîkê ji bajêr kirî, cîz, rela keçîkê li derva radixistin, neqew êlan dîkrin. Xocê gund due dixwand. Ji rela bûkê cotek gorê rîsînî yê destkirî didan xoce.

Pîştî teramûsê (Trablus), -hîn bere bere- tasa zivînî didan ser bûkê, bi hesban, erebên hesban (hîn paşê qamyon û teksî derketin) bûk sîyar dîkrin, neqew û rihâl li ereban bar dîkrin bi zixiltî, dol û zirnê bûka xwe sîyar dîkrin nav gund, dor gorîstana gund digêrandin dihatin mala zava. Malê nanîk dadîhanî. Li dûv nanxwarinê herkes belav dibû. Evarê jî xoce dihat dua nîkahê dixwand.

Raman, wêje û du lingên pînika mirîşkan

Seyidxan Anter

Dengbêj û hunermendê muzîka rapê Şakiro, di kilama *EMRO* de wiha dibêje: "Ez çûme Helebê dikê serê sibê li min xul-xuland." Li vir dik qasidê berbangê ye.

Ger me bala xwe dabûyê, serçopiyên govanda Amedê, pîkola dikan dikin û hindik dimîne ku bifirin ji. Serçopî mina dik huner û marîfetên xwe ji beşdarên govandê û temaşevan re pêşkêş dike.

Nivîskar û helbestvanê Ingilîz D.H. Lawrence ku Salih Agir Qoseri di bin navê "*Zilamê Mirî*" de wergerandiye kurdî, bi vê metaforê dest bi romana xwe dike: "Gundiyeke nêzikî Qudsê, ji xwe re dikeke hûrik û gevcilî peyde kiribû, her ku ber bi biharê ve diçû û darên hejîran dibişkivîn û êdî pelên xwe vedikirin, xeleta porteqaliyî dora stûyê dik, ezametek mezintir dida wî cesûrtir xuya dikir." Rê ji gotina zêde re nemaye.

Ji ber wesfên dik yê wek çavderê civatê û parezerê bahwerîya xwe, li jora gelek kilîseyan dik çikandine.

Dîk wiha danîne ku ba ji kijan alî ve tê dik berê xwe dide heman alî û ev yek ji tê wateya ku dik li diji nebaşiyê radiweste.

Di serdema şerê navxweyî li Spanyayê (1936- 37) bi helbesta José Antonio Ferlosio ku Jacob Branting bi *Den svarta tuppen* (dikê reş) wergerandiye swêdî da du core reng dane wan:

Dikê reş, gava ku tu bang didî û dengê te tê me, roj dibe tarî û şev di-de dû. Lê çaxa ku dikê sor bang dide em dibin şahidên berbang û ronahî bi dûv de.

Trubadurê swêdî (ku bi eslê xwe holandî ye) Cornelios Wreswik ji dik û mirîşk kirine rojeva xwe. Ji ber kêf û kirinên xwe nav li dik nekiriye lê navê mirîşkê "Magda" daniye. Ma ne ji xwe, mirîşk hêka dike, kurk dikeve, xwedî li çêlikên xwe derdikeve û ...

Gelek pesin û saloxên dikan hene. Mîna Keyên ku peykerên wan li hemû bajar û bajarokên cihanê hene, dik ji patriakal e.

Şexmûsê Hesarî yê ji Xerzan,
ango helbestvanê me yê hêja û
naskirî Cîgerxwîn, bi saloxdanên dik,
çûk û ajalên din, pêwendiyên politîk,
civakî û pîsikolojîk yên serdemeke
kurdan vedibêje.

Havîna par, dema ku li Kitebxana
Kurdî-Stockholmê, beşdarî civîna

Li welatê me xerza

Dîkek hebû şareza

Rokê çû nava dîka

Ji wan re go hêdîka

Rabin bêjin mirîşkan

Bes xwe bidin enîşkan

Dîk û mirîşk bûne kom

Berê xwe dane cem bûm

Leşker tev bûne lek

Hin çeleng û hin kulek

Berê xwe dane çolê

Tevlî koç û tev êlê

Teyra di ko nagehan

Hatî leşkerî giran

Tevde firîn ji malan

Berê xwe dane balan

Ew jî li hev bûne kom

Yekî rabû gote bûm

Ey padişahê teyran

Wey serbilindê Tûran

Rabe ser xwe tu mîro

nasandina pirtûkan bûm, ev helbesta
li jêr hat bîra min û çaxa min helbest
xwend, ne tenê Kurdistan lê carek
din Stockholm hat hişê min. Îca rê
bidin min ku ez bi helbestekê dawî li
nîvîsa xwe bînim û Cîgerxwîn jî bi bîr
bînim!

Ji bo me bêje îro

Ev leşkerê bê jimar

Gelo heye jê zirar

Bûm kenî û gote wan

Ba kin bazê pehlewana

Hudhud rabû serferaz

Wî çû bi lez gote baz

Go rabe ey tu bazî

Şah te îro dixwazî

Baz çû cem şah li banî

Destê xwe l' ser hev danî

Go ey xwendekarê min

Zû li min ke barê min

Bûm gote bazê xwîn xwar

Bi lez rabe here xwar

Bazî rabû weke şêr

Firek da xwe hate jêr

Bazê terî bi rêşî

Hate cem dîkê pêşî

Destê wî girt û hejand

Nûtq'ek jêre dirijand

Olan sen nerelîsen
Go em xelkê bedlîs in

Sizin bûrde ne îş war
Dîk xeyidî lê da dar
Bazî eşeda xwe anî
Dîk jî darê xwe danî

Go bi zor û bi gazine,
Em heqê xwe dixwazin
Baz go kîye serleşker
Go tu nizanî ey ker

Ezim paşa ezim mîr
Ezim şahê cihangîr
Bazî çû cem dîkê dî
Dî ko ewjî wekî wî

Tevan go paşa û mîr
Kesî nego ez wezîr
Nefer bûne yûzbaşî
Heta giha ê paşî

Bazî rabû çû banî
Liber destê bûm danî
Tilûr tev lê bûne kom
Qale ya ey-yûhel qewm
Ev hatine ji mala xwe

Divên istîqlala xwe.
Bûm go bazê dilawer
Gelo kî ye serleşker
Go tev paşa û mîr in

Bê wezîr û gizîr in
Bûm hêdî rabû serxwe
Taca xwe da serê xwe

Go bi taca serê min
Kes nîne hemberê min
Rabin wek pehlewana
Dê em herin ser wana

Hatin teyrên duv birek
Ba kirin kund û qirek
Go hon werin binêrin
Ka em îro çi mêrin

Dîka xwe da enîşka
Bû qid qida mirîşka
Go fermana we rabû
Koma we jihev bela bû

Ê ko kuştin ê ko man
Hatin gundan bê goman
Wan jî weke me kurdan
Destê xwe jiber xwe berdan

Elok û tûtîk û qaz
Têde bûne belengaz
Tev de ketin koxê rêş
Çîroka me jî we re xweş

Wek seydayê Cegerxwîn
Hemî bûne dilbirîn

Ji çarînên Omer Xeyam

Wergera ji farisî: **Ehmed Mîlan**

Dunya dibînî û her çi dibînî hêç e
Û her weke dibêjî û dibihîzî hêç e
Li seranserê afaqê¹ birevî û bigerî hêç e
Û ewa ku di mal da velezi jî hêç e

Dewrana cîhanê bê mey û saqî hêç e
Deng û awaz û neyka² eraqî hêç e
Her çiqasî di ehvala³ cîhanê dinêrim
Hasil hemû îşret⁴ e û baqî⁵ hêç e

Hebûn wek terkîba⁶ sirûştên⁷ xemilandî ye
Bo çi avîtî nava kêr û kêmasiyê de
Heke baş hat, kestandin ji bo çi hebe
Eger baş nehat, kêmasiya fêlbaziyê⁸ kê ra ye

¹ Afaq: alem, erd û esman.

² Neyka: ney, bilûr, saza lêvkî.

³ Ehval: hal û kêf, xweşî û ne xweşiya jiyanê.

⁴ Îşret: êşret, eyaşî, xweş derbaskirin.

⁵ Baqî: yê mayî, yê di, her çi mayî.

⁶ Terkîb: têkel kirin, tevhev kirin .

⁷ Sirûşt: tebîet, xûy.

⁸ Fêlbazî: hilekarî, xapandin.

Nika ku gula bextewariya te pir gul daye
Deştê te çima ji cama meyê bêkar⁹ e
Meyê vexwe ku zemanê¹⁰ dijminekî xedar¹¹ e
Peydakirina rojek û firsetek wakîne dijwar e

Başî û nebaşî ku di nihada¹² beşer¹³ da ye
Şadî û xemgînî ku di qeza û qeder¹⁴ da ye
Bi çerx¹⁵ ra meke hewale¹⁶ ku li gor rîya eqil
Çerxa felekê ji te hezar caran belengaztir e

Temenê¹⁷ me ra reş û tarî, û karekî ne zelal e
Zehmetên hemîya zêde û rehetiya hemîya kêr e
Şokir îzed¹⁸ ra ku her liştikên bela lê radibe
Me ra bes e, ji kesekî dinê ne pêwîst e hebe

⁹ Bêkar: destbetal û vala ye.

¹⁰ Zemanê: rojgar, dewran.

¹¹ Xedar: zalim, sitemkar, bêwefa.

¹² Nihad: binyad, hindir û batin, xîlqet, xû û exlaq, sirûşt.

¹³ Beşer: mirov, însan, xelq, gel.

¹⁴ Qeza û qeder: çarenivîstî, sernivîşt, ênînivîs.

¹⁵ Çerx: çerxa felek.

¹⁶ Hewale: sipartin, şandin, rêkirin.

¹⁷ Temen: omir, emrekî dirêj, çendîn sal.

¹⁸ Îzed: yezdan, xwedê, ehûra mezda.

Ji menzîla¹⁹ kufre²⁰ heya dîn²¹ ra, yek nefes e
 Ji alema şik²² hey yeqîn²³ ra, yek nefes e
 Rûmeta vê yek nefesa hêja, baş bizanibe
 Ku hasila me di vê berhemê da yek nefes e

Dibêjin ehlê behîştê²⁴ bi horîyan²⁵ ra xweş e
 Ez dibêjim ku ava tirî xweş e
 Vê neqid²⁶ biştîne û dest ji wê deynê berde²⁷
 Ku bihiştina dengê defê ji dûrva xweş e

¹⁹ Menzîl: mal, karwansera, ode.

²⁰ Kufir: kafer, bêjeyên nerind, navnûçik.

²¹ Dîn: ayîn, mezheb, tae't,

²² Şik: gumankirin, dudilî.

²³ Yeqîn: béguman, bawerkirin

²⁴ Behîşt: bihişt, cennet, firdûs.

²⁵ Horî: perî, firişte, melayîke.

²⁶ Neqid: neqit, pêşîn.

²⁷ Ez; *yek çuncik li dest da, ji çil çuncik li ser darê baştir e.*

Birtî*

Mem Xelîkan

Birtî, straneke kurdên Anatoliya Navîn (KAN) a dildariyê ye. Strana gundê Omê (Gordoxli – Zincirlikuyu) ye ku girêdayîye Kuluya Konyayê ye. Strana Birtî cara siftê ji aliyê hunermendê heremê Serbilind Kanat ve di qesetê de hate xwandin. Straneke li heremê gelek tê hezkirin. Ji Serbilind şuva, wê stranê di gelek qesetên hunermendên kurdên Anatoliya Navîn de cih girt. Lê hena ji wan navê stranê Bertî, hena jî Birtî lê kiribûn. Bi dîtina min, di zimanê kurdî de bertî peyveke bêmane ye. Peyva birtî di zimanê me de heye. KAN di axaftina xwe ya rojane de wê peyvê bi kar tînin. Mînak: Têbirt (*gözden çıkardı*), têbirtî (*gözden çıkarılmış*) hwd. Ji bo wê, di vê nivîsê de min bi navê *Birtî* nivîsand.

Li gundê Omê keç û xortek ji hev hez dikin. Dil digirin. Texmîni sal 1930-40 e. Demeke dirêj evîneke reş û veşartî dijîn. Qut jî, ciraneka wana

ye. Jinebî ye. Destbiraya herduyan e. Di navbera herdu dildaran de diherê û têye. Ew xorta, ji mala Kumê (Bi mala Omê ve eynê malbat e.) ye. Ew xorta û evîndara wî Eş, çiqas dikin nakin malbatên xwe razî nakin ku dilê wan here seri.

Herdu dilgirtî dizanin ji dest xêrnexwazan ew ê negêhine ber miradê xwe. Biryara xwe didin ku birevin. Qut xeberê dide Eşê ku filan rojê bi şev dilgirtiyê wê were û birevine. Dixwaze Eş xwe amade bike û kesî pê nehêsin e. Qut di bin wana de darê dibire. Dikeve navbera dilê wana. Wana dixapîne, ji bo ku çavê Qutê jî li vî xortî ye. Saeta revê, bi xelatî dide wê. Bi şev tê cem Eşê, dibê: „Tu here mitfaxê û wek her roj qaw qacaxan bişo û doralîyê paqij ke. Kes nere sesintiyê û şîyar nebin.“

Demsal payîz e. Baranê dest pê kiriye. Şeveke reş wek dilmata û bi baran e. Dilgirtiyê Eşê, xortê bejnzirav û çeleng li hespê xwe şîyar dibe û bi

*Çavkani: Serbilind Kanat

kelecaneke mezin tê li paş mala bavê Eşê dadiweste. Eşê hay ji tiştêkî tune. Qutê xwe xemilandî bixça xwe di dest de, hildikişê ser kevirê li paş malê û xwe diavê terkîya dilgirtîyê Eşê. Ew xorta jî mînak Eşa xwe ya delal li terkîya wî ye xenê û xedar bi rê dikevin.

Ew şeva reştarî, herder herî şili û şepelî ye. Lingê hespê wan diterişe û gêr dibin. Hê ji nav gund derneketine, di nav gund da ne. Gundî dicivin

û wana digirin. Dibînin ku Qutê revandine. Dildarê Eşê jî wê demê pê dihesa ku herdu evîndar hatine xapandin. Erf û edet hene. Gundî dikevin navberê herdu malbatan li hev tînin. Evîndarê Eşê tiştêk ji dest nê. Teslîmî kevneşopîyan dibe. Qut bi ser vî xortî de maye. Qutê jê re dikin bûk. Eş jî dilê xwe neçûye seri û negihîştîye miradê xwe. Evîna xwe û serpêhatîya xwe bi vê kilama **Birtîyê** tîne ziman.

Birtî

Birtî birtî qurban birtî
Birtî birtî heyran birtî
Sala yek bû dilkî xwe girtî
Qut pîrokê ji dest min girtî

Baran barî herd mişmişî
Canîyê tor bû ling terişî
Xelkê go çingî berdûş e
Min go xort bû di xwe qerîşî

Birtî birtî qurban birtî
Birtî birtî heyran birtî
Sala yek bû dilkî xwe girtî
Qut pîrokê ji dest min girtî

Jêr de tê yê te xwe ba kir
Dûmanê cixarê li xwe belav kir
Xelkê go çingî xort e
Min dilê xwe de maşelle kir

Birtî birtî qurban birtî
Birtî birtî heyran birtî
Sala yek bû dilkî xwe girtî
Qut pîrokê ji dest min girtî

Ava bîra germa kelî
Li ser peya bû hezret Elî
Ez çûm dest lingê wî kalî
Go dilê we ma duna walî

Birtî birtî qurban birtî
Birtî birtî heyran birtî
Sala yek bû dilkî xwe girtî
Qut pîrokê ji dest min girtî

Vê pîrokê ez xapandim
Qav qacax bi min xaşandin
Mala dundê Omê bişewite
Ez nexwastim ez helandim.

Birtî birtî qurban birtî
Birtî birtî heyran birtî
Sala yek bû dilkî xwe girtî
Qut pîrokê ji dest min girtî

bertî bertî heyran bertî
bertî bertî qurban bertî

kuma malê home li minra bertî
sala yek bû min dilke xwe girt
wê pîrokê ji dest min girtî
bertî bertî heyran bertî

bertî bertî qurban bertî
bertî bertî heyran bertî
bertî bertî qurban bertî

ava bîra germa û kelî
li ser peya bû hezret Elî
ez çûm dest linge wê kalî
gote dile eman dinê wi elî

pezî xweji oran meke
berî malê me ra derbaz meke
ez jinekî bi derd û kul im
van kulên min derva meke



AGAHDARÎYEKE GIRÎNG

Em dixwazin di her hejmareke xwe de, ji cil û bergên kurdên Anatolîya Navîn wêneyekî kevn di Bîrnebûnê de biweşînin. Bi vî awayî em ê hem bi tevgirêdana kurdên Anatolîya Navîn bizanin, hem jî em ê hay jê hebin ku kincên wan ên berê bi çi awayî ne.

Bi rîca û bi kêfxweşî em bi hemû kurdên Anatolîya Navîn didin zanîn ku: wêneyên kesên ji malbatê (jin-mêr), bi kinc û tevgirêdanên kurmancîyê li ba we hebin, ji kerema xwe ji me re kopîyekê bi rê bikin. Bi vî yekê em ê bi dewlemedîya tevgirêdana xwe bizanin û em ê wan kesan careke din bi bîr binin.

Redaksiyon

Helbest

Dil bi birîn im Zezê
Zozan zozan li te gerîyam Zezê
Nema hêvî
Nema girî
Nema pêşabûn nema Zezê
Bê te li vî bajarî ez bêkes im
Zanim cûdati jî ji evîndariyê ye
Bêje Zezê
Tu bêje ez çi bikim
Dil bi birîn im
Lê dil xwekujî ye
Mirov qe dilê xwe dike goristan
Şîn û girî di kîjan pirtûka pîroz da heye
Bêje Zezê
Kîjan Yezdan di dawîyê de zindî bi kuştin dan
Dil bi birîn im Zezê
Bi dilbirînîyê hemû tişt pûç û vala ye
Xewn û xeyal li bajarekî xerîbî
Dil bi birînî jîyîn li kolanên biyanî
Ax Zezê ax
Kenekî sexte li ser lêvan
Bi dilekî bi birîn
Çûyîna xerîbî bes ji xwe dan
Bûm qêrîn
Bûm senfonî ji dilbirînîyê
Bûm çîrok
Bûm nivîsa Mem û Zînê
Xewn û xeyal Zezê li bajarekî xerîbîyê
Dil bi birîn im Zezê
Dil bi birîn...

Adem Akat

Sîngê te

Sîngê te
Mîna esman fireh e
Lê wenda dibim

Sîngê te
Mîna azadiyek bêsinor e
Pê sermest dibim

Sîngê te
Mîna deryayek şîn e
Lê ajne dikim

Sîngê te
Mîna kendalekî ye
Xwe lê vedişêrim

Dil ma bi tenê

Roj wenda bû li esman
Hîv wenda bû li şevan
Bejna te wenda bû li ber çavan

Ne dengê pelên darê
Ne jî dengên pêlên derya hebûn

Dengê te li nav bêdengîyê
Awirên te li nav tenêtîyê berba bûn

Mûlla Evîndar

Dar bêkok, kok bêax nabe

"Şêro"

Mûlla Evîndar

Navbera gundê Xelika û Semûlê nê-zîkê 700 km ye (Kurdên Anatoliyê bi Stenbol / Îstanbulê re dibên "Semûl").

Hecî pezê xwe fîrot bazirganekî ji Semûlê. Niha ew ê pez bibe Semûlê ji bazirgan re.

Li zemanê berê pez bi çîre bi çîre dibirin Semûlê. Wext li dor salên 1920an bû. Hecî kerê xwe bar kir, kûçîkê xwe da hêla xwe, pez da ber xwe û kete rê.

Pez him diçerîya, him diçû. Bi ro diçûn, bi şev pez mexel dibû û Hecî jî radiket. Biqasî 30 ro şûn de ew hatin Semûlê.

Hecî hat goma bazirgan û pez teslîm kir, ker û kûçîkê xwe jî wek diyarî dan bazirgan.

Niha ew ê vegere gundê xwe, gundê Xelika. Bazirgan erebeya hespa amade kiribû ji bo ku ew heta îstasyona trenê pê here. Hecî xatirê xwe xwest û li erebeyê siwar bû. Karmendê gomê erebe diajot.

Dema ku ew ji goma pêz dûrket

kûçîkê wî meşîya û kete dû wî. Hecî bi çavên kelegirî li kûçîkê xwe nêrî, kûçîk heta erebeyê hat, li derdora erebeyê bazdida. Hecî erebe dawestand, jê dahat û destê xwe avêt ser stûyê wî. Go "Ez ê te jî bi xwe re bibim Şêro! Şûna te ne va dera ye".

Hecî bi kûçîkê xwe re digo Şêro. Şêro jî da ser erebeyê û çûn.

Hatin îstasyona trenê.

Rayedarên trenê destûr nedan ku kûçîk têkeve trenê. Qedexe bû. Hecî bi çavên kelegirî ji Şêro veqetiya. Şêro bêdeng, bêpeyv stûxwar ji îstasyonê derket û bi erebeyê re şûnva hat goma pêz.

Hecî vegeriya gundê xwe. Di serê wî de tim Şêro heye, qet ji bîr nake. Veqetîn li wî pir bi qar, zor hatibû.

15 ro derbas bûn.

Li berbangeke xweşik wek her rokê Hecî şiyar bû.

Çend kar û berxên wî hebûn, ew li seda (sibehê) tim dibirin ser çem. Dîsa wî seda zû, li wê berbangê kar û berx rakirin û ber bi roja ku hiltê, ro-

ja ku ewr diqelişîne çû. Rêyek zirav û
pir dirêj li hêla wî hebû, te digo qey
ew heta şûna ku roj jê hiltê dihere.
Kar û berx li wir diçêrandin. Hewa
hênîk û nermîk bû, bayekî xweşik li
rûyên wî dixist.

Hecî li wê rêya zirav û dirêj dît
ku tişteke bi toz û dûman ber bi wî têt.
Ew tişt nêzik bû, ber bi Hecî meşîya
û hat li ba wî dawestî.

Hecî nikarî ku deng bike, nikarî
ku bawer bike!

Ew Şêro bû!

Şêro bi kêfekî li nav lingên wî
dilîst, bi hembêza wî da hildikişîya.
Hecî ew hembêz kir û serê wî kire
qefesa sîngê xwe.

Ji Semûlê heta gundê Xelika
bi qasî 15 ro Şêro rê da ber xwe,
peya hat. Rêya ku biqasî 30 ro heta
Semûlê pê hatî wî şopand û 15 ro
şûn de li gundê xwe veşîya.

Şêro pir westiyabû, çû li kêleka
kar û berxan mexel bû û vesîniya xwe
heyna.

Hecî li çemên kesk, li kar û berxên
ku diçerîn û li Şêro nêrî, weha go:

"Dar bêkok, kok bêax nabe."

Li nav gund û zozanan belav bû,
her kesî digot: "Çawa dibe kûçîkek
ji Semûlê heta gundê Xelika ewqas
kîlometre têt û nas dike?"



Baqo û "Halkın Yolu"

Hızır Akbîna

Em kurdên Anatolîyê car caran bi halê xwe yê pê bigirîn, dike-nin. Bi halê xwe yê bikenin jî digirîn. Hekata Baqo jî halekî veng e.

Baqo jî wek her kesî tere Almanyayê ku li qezenca xwe mêze ke. Li bajarê Kolnê bi cih bibû. Museda li Almanyayê sand û 26 salan jî li wir ma. Ge kar kir, ge kêfê xwe kir. Mihtaca kesekî jî nebû.

Dem derbes bû û êdi Baqo salmezîzin bû, merivekî xwe jê re got: "Baqo tu edî pîr bûyî, tu nikanî bişûxilî, here gundê xwe kêfê xwe bike." Wî jî ew gotin qebûl kir, dest bi hazîrîya vegera xwe ya Tirkîyê kir. Yên bi ziman dizanîn alîkarîya wî kirin, serî li buroya xerîban dan, hatinên wî yên heta hîro jê hatin birîn ji dewletê girtin. Hesabên wî, deyn û dûyê wî dan. Jê re bileta wî kirîn. Ew roja hat û edî Baqo, êvarê vedigerîya welatê xwe.

Li Almanyayê rojêka ji rojên Xwedê, qet tev li polîtîkayê nebû. Yên di nav kar û barê polîtîkayê de ne, re digot: "Hûn jî vê polîtîkayê çî fahm dikin. Ez qet jî polîtîkayê hez nakim." Meriv jî çî hez nekir ew tê serî merivan. Li Baqo jî wer bû.

Roja xwe ya dawîyê siftê tere mehela Mulheimê, dûre jî tere Chlodwigplatzê qahvexaneya Sakallı Ahmet, xatirê xwe ji heval û dostan dixwaze. Li dawîyê jî hat ber Kilîsa Domê. Mêze kir li kêleka kilîsê 3-4 jin û mêr konek vekirine li ber kon bi hevdu re sohbet dikin. Baqo ciwantîya xwe tê bîrê û çav tiji dibin, demekê li wan meze dike. Xort wî ferq dikin. Yek ji wan dibê:

"Merhaba Yoldaş!"

Baqo jî:

"Merhaba, hûn li vir çî dikin?"

"Em van kovar û belavokan belav dikin."

Di nav wan de sohbetek dest pê dike. Cixarê ji hevdu re îkram dikin. Baqo rewşa xwe ji wan re dibê. Nezîkî seetekê sohbet dikin. Xortek dibêje:

"Yoldaş, em ji wan belavok û kovara bidin te bi xwe re bibe welat bide kes û nasên xwe."

Baqo di dilê xwe de dibêje: barê min tune ye, ez ê bi xwe re bibim û va defteran li zarokan belav kim. Dibêje:

"De hazir bikin, ez bi xwe re çendîkan bibim."

Xort li çavên hevdu meze dikin! Û

yek ji wan çend kovaran dide ser hev û dike paket û dide Baqo. Belavokekê jî dide Baqo. Ew belavokê dike berîka xwe. Sernivîsa belavokê jî veng hatiye nivisandin *“Halkın Yolu Alanlara İniyor”*. Yoldaşê xwe bi rê dikin.

Ji balefîrgêha Kolnê di seet 12an de difire û li Esenboxaya Ankarayê peya dibe. Dema di kontrolê re derbas dibe polis û leşker di berîka wî de belavokê dibînin.

Baqo dibin bûroyê, valizê wî jî tînin û kontrol dikin. Di valizê Baqo de kovaran dibînin. Dem jî dema îlonê her der dibin çavderîya leşkeran de ye. Ew tê derdestkirin. Serleşker dibêje: “Bu adam sıkıyönetimlik, bölgesine, Konya’ya gönderin orada işlemlerine devam etsinler.” Baqo bi cemsaleşkerîyê dibin Konyayê, lê ordîya 2ya Tirkîyê jî merkeza xwe li Meletîyê ye. Baqo bi balefîrê dişînin Meletîyê. Davêjin hepisxanê. Di hepisxanê de didin koxûşa merivên *“Halkın Yolu”* lê diman.

Kesên di koxîşê de bi meraq li dor Baqo dicivin. Baqo ji wan re hekata xwe eşkere dike. Dibêjin yoldaş! Mere koxîşa mahkûmên normal. Ew bi girtîyên nû eziyêtan dikin. Heta roja mehkema te, tu mêvanê me yî û cîh didin wî.

Xeber tê gund. Tê gotin ku Baqo ji dewaya rizgarîyê avêtine hundir. Bi-rayên xwe çî di mal da çî di çal de heyedifroşin, radibin terin Meletîyê jê re parezvanekî digirin. Baqo di girtîgehê de ziyaret dikin. Baqo ji wan re hertiştî eşkere dike. Parezvan savcî û dadger dibîne hekata Baqo ji wan re eşkere dike.

Ya hûn bizanin girtîyên me bi gotina wî mehekê pê merşa tirk ya milli û gotina *Türküm, doğruyu...* didin xwendin. Pê mesrefên mezin didin kirin. Roja mehkemê tê û derdikeve ber hakîmê leşkerîyê. Dedgar dipirse:

“Bakî Bey, Halkın Yolu ne demek?”

Baqo: *“Hakîm Bey ne olsun, benim, senin, onun geçtiği köydeki çığır yoldur. Başka ne olur!”*

Dadger dibêje: “Binivîsîne qîzamin. Ji ber ku heta niha bê sûc e, sabîqa xwe tûneye, ne merivekî van kar û baran bike ye, hatiye tespîtîkirin, ma girtî bê berdand. Beraat dikim.” Baqo tehliye dibe.

Baqo bi mesrefeka mezin ji hepisxaneyê xelas dibe û tê gundê xwe yî li Anatoliya Navîn. Li gund jê dipirsin, “Baqo te li hepsa Meletîyê çî kir?”

Digot:

“Korka sönmez bi min hevîsandindan. Yoldaşê min bûn, karê min va ye!”

Memdûh Selîm Begê Wanî¹

(1892-1976)

Cutyar T. Hawrami

Memdûh Selîm Beg ronak-
bîr, têkoşer, xebatkar,
nûser, rojnamenûseki jêhatî, yê
kurd bû.

Sala 1892 li bajarê Wanê ji dayik bûye. Xwendina xwe ya seretayî li Wanê temam kiriye. Paşê li Stembolê xwendina xwe berdawam kiriye. Li salên 1912-1914an yek ji endamên çalaktir yê "Komela Xwendkarên Kurd Hêvî" bû.

Li salên 1914-1918an dema Şerê Cihanê yê yekem dest pê kir, Dewleta Osmanî bû hevalbendê Elman, wê demê Memdûh Selîm Beg jî fena gelek lawên kurd ji neçarî dibe leşker û pileya efserîyê werdigre.

Di sala 1918an de gava ku dewleta Elman, Osmanî û hevalbendên wan şikestin, bajarê Stembolê ket destê hêzên serkeftî (bi taybetî, Brîtanya û Fransa). Kurdên ronakbîr û siyasetmedar jî wê demê ji cihên cuda li Stembolê dicivin û dest bi çalakîyên kulturî û siyasî dikin. Ji van xebatên wan çend komeleyên

siyasî û rewşenbîrî derdikevin holê. Çend mînak jê: Komela Pêşketina Kurdistanê (*Kurdistan Teali Cemiyeti*), Komela Kurd ji bo Belavkirina Zanîne û Weşanan (*Kurd Tamim-i Maarif ve Neşriyat Cemiyeti*), Partî Demokratî Kurd û hwd bûn. Van komeleyan, kitêb û belavokên kurdî çap kirine û li xelkê belav kirine. Di vê demê de kovara *Jîn* û paşê jî kovara *Kurdistan* derxistine.

Memdûh Selîm Beg, di van komeleyan de kesekî jêhatî û çalak bû. Bi nivîs û gotarên xwe jî beşdarî li kovara *Jîn* û *Kurdistanê* kiriye. Paşê jî bûye berpirsê kovara *Jînê* (hejmar 20-25). Gotar û nivîsên wî xwedî naverokek modern û milî bûn. Di çend gotaran de li ser mafê jina kurd radiweste, ji şêx û mela û desthilatdaran daxwaz dike ku rêzê li mafê jinê bigrin û tadê lê nekin.

Memdûh Selîm Beg û hevalên xwe di sala 1919-1921an de gelek peyamên ji bo mafên kurdên siyasî û neteweyî pêşkêşî demûdevezgehên

¹ Ev lêkolîna birêz Cutyar T. Hawramî bi soranî hatiye kirin. Bi hewkariya M. Ali Kut bi kurmançiya latînî hatiye nivîsin.



Ji kongreya XOYBÛNê Lubnan, 1927

cihanî kirine; serdana balyozxaneyê Emerîka, Brîtanya, Fransayê û welatên din li Sîtembolê kirine, bi nivîs û devkî peyamên xwe pêşkêş kirine. Di gelek belgeyên wê demê de nav û rola Memdûh Selîm Beg bi taybetî eşkere ye.

Wexta Komara Tirk di 1923an de hat avakirin, dewletên zilhêz qewetên xwe bi paş ve kêşandin, wê demê gelek ronakbîr û siyasethêrên kurd hatin destserkirin û ên ku karibûn, her yek bi cihêkî de revîyan. Memdûh Selîm Beg jî li gel mamê xwe (Nîzameddîn Kîbar) ve ber bi Misrê ve çûn, paşê jî çûn Libnan û dawîyê jî hatin li

Şamê niştecîh bûn. Wê demê Sûriyê di bin desthilata Fransayê de bû. Li wir Memdûh Selîm Beg li gel çend ronakbîrên kurd ên weke, Celadet Alî Bedirxan, Sureyya Bedirxan, Ekrem Cemîl Paşa, Qedrî Cemîl Paşa digihên hev û jî nû ve dest bi çalakîyên siyasî dikin.

Di hezîrana 1925an de Memdûh Selîm Beg li Bexdayê dibe mêvanê Dr. Mihemed Şukrî Sekban. Kowara *Diyarî Kurdistan* ku li Bexdayê derdiket (hejmara 7, 18/06/1925) û (hejmara 8, 04/07/1925) mîna kesayetîyek navdar û ronakbîrêkî kurd xêrhatinê lê dike. Her di vê demê de Mewlanzade Rifet û çend

kesên navdarên Çerkes ji li Bexdayê bûn. Tê texmînkirin ku serdana Memdûh Selîm Beg di wê demê de bi mebesteke siyasî bû, lewre ku Britanya û Iraq li hêlekê û dewleta Tirk li hêla din li ser Wîlayeta Mûsilê di xitlafê de bûn.

Di sala 1927an de XOYBÛN hate damezrandin. Memdûh Selîm Beg di nav XOYBÛNê de kesekî diyar, jêhatî û çalak bû, bi nasnavê Isken-der Beg di hate nasîn. Di civîn û hemî karên XOYBÛNê de bi xurtî beşdarî kiriye. Di wê wextê XOYBÛNê de bireveberîya serhildana Agirî dikir. Çend sal şûnde hêdî bi hêdî Fran-sa çalakîyên XOYBÛN û komelên kurd qedexê dike û kesayetiyan kurd sirgûnî cihên cuda dike. Yek ji wan ji Memdûh Selîm Beg bû. Lê wî pêwendî û danûstandinên xwe li gel hevalên xwe domandine.

Disalên 1930-1940an de Memdûh Selîm Beg demekê weke mamoste û paşê ji weke Mifetişê perwerdeyê li bajarên Heseke, Îskenderûn, Dera û çend bajarên din kar kiriye. Paşê ji teqawid dibe û tê li Şamê li taxa Muhacîrîn niştecîh dibe. Car car li gel kevneheval û dostên xwe civiyaye behsa rûdanên li Kurdistanê kirine û li birewerî serpêhatîyên xwe vegerîyane. Wekî din li mala xwe di nav kitêbxana

xwe de bi xwendin û nivîsê ve mijûl bû.

Di sala 1962an de Memdûh Selîm Beg nêzikî heftêsalî bûye, li ser pêşniyara dost û hevalên xwe li gel jinekê bi navê Wîldan dizewice. Hinek nîvîsîne ku ev xanim tirk bû û hinek ji îdia dikin ku çerkes bû.

Memdûh Selîm Beg, li gel zimanê kurdî, tirkî, erebî, fransî û ta radeyekê ji ermenî û yewnanî dizanibû. Beşek mezin ji nivîsên Memdûh Selîm Beg bi tirkîya osmanî û salên paşê ji bi erebî ne.

Nivîsên wî diyar dikin ku kesekî entellektuel, zana û şarezayê mejûyê kurd û kurdistanê bû. Çend mînak ji nivîsên wî:

* Wanli: M. M. Selim Begî, *Kurd hanimi*, Jîn, kovar, Sitebol, hejmar 14, Mart 1335, r. 6 - 10.

* Memdûh Selîm Begî, *Eyyam-i mexsuse-mizi tesbit meselesi*, Jîn, kovar, Sitebol, hejmar 16, 10 Nisan 1335, r. 5 - 8.

* Memdûh Selîm Begî, *Mem û Zîn-ek tabi munasebetile*, Jîn, hejmar 16, 10 Nisan 1335, r. 8 - 9.

* Memdûh Selîm Begî, *Kurdlerde Terekki Cereyanlari*, Jîn, hejmar 17, 27 Nisan 1335, r. 1 - 9.

* Memdûh Selîm Begî, *Hawar - Îmdad*, Jîn, hejmar 19, 22 Mayıs 1335, r. 1 - 4.

* Memdûh Selîm Begî, *iki eseri mebrur (Kûrd Kadınları Tealî Cemiyeti, Hêvî Telebe Cemiyeti)*, Jîn, hejmar 20, 4 Hazîran 1335, r. 4 - 10.

* Memdûh Selîm Begî, *Kûrdistan Tealî Cemiyetinde bir musahabe* (Kurd

Qilubinde bir musahabe), Jîn, hejmar 21, 18 Hazîran 1335, r. 1 - 7.

* M. S., *Istanbulda Kurd Amelesi*, Jîn, hejmar 25, 2 Teşrin-i Evvel 1335, r. 1 - 3.

* M. S., *Kawe yeumi mexsusi - 31 Tebax* (Agustos), Jîn, hejmar 25, 2 Teşrin-i Evvel 1335, r. 3 - 4.

* M. Selim Begî, *Bir Hakkiketi Tenwîr, Kurdistan*, Kovar, Sitembol, hejmar 8, 2 Mayıs 1335.

* Kurd Wanî (Memdûh Selim Beg), *Tarih Huzurunda bir Tashih, Dîyariyi Kurdistan*, Kovar, Bexda, hejmar 7, 18/06/1925, r. 40 - 43.

* Wanlî M. Selim, *Heyati İhtiyacler-mezdin Milli Tarih-Milli Cografiya, Dîyariyi Kurdistan*, Kovar, Bexda, hejmar 9, 28/09/1925, r. 25 - 32.

Bi baweriya min yek ji van gotaran wesîqeyeke girîng î mejûyî kurd e. Ev nivîs di dema li Bexdayê bû (1925), di kovara Diyarî Kurdistan de weşandiye. Di vê gotarê de gelek fakta û zanyariyên girîng di derbarê Komela Xwendekarên Kurd Hêvî (*Kurd Talebe Hêvi Cemiyeti*) û wê serdemê de destnîşan dike.

Li gor zanînan, piştî mirina Memdûh Selim Beg çî destnivîs û gotarên wî ên ku hebûn, legel arşîv û kitêbên wî nuha winda ne.

Memdûh Selim Beg xwedî kitêbxaneyeyeke zengîn bû. Li mala wî li Şamê di vê kitêbxaneyê de gelek pirtûkên bi zimanên cuda kurdî, erebî, tirkî, fransî hwd hebûn. Axilbeyê van kitêban di derbarê pirs



Ji bo hewalatî xom Kerim Rostem Beg nîşaney xwoşewîstî min e. Memdûh Selim 1925-9-14

û mejûyê kurd û Kurdistanê de bûn. Herweha gelek kovar û rojnameyên bêhempa û yekane ku wî bi xwe ji berpirsariya hinekan ji wan kiribû, di vê pirtûkxaneyê de hebûn. Mînak: Kovara *Jîn, Kurdistan, Rojî Kurd û Hetawî Kurd* hwd.

Di temûza 1971an de mamosta Mesûd Mihemed (1919 - 2002) weke endamê *Korî Zanyariyi Kurd* diçe Şamê, di bireweriyên xwe (Geştî Jiyanîm, 2009) de welê behsa vê seferê dike: "Êvara 10/07/1971 de ji Bexdayê hatim Şamê, çawa ez gihiştim balafirgeha Şamê, Rewşen Bedirxan, Memdûh Selim û Zuhêr

Zulfo li hêvîya min bûn. Li Şamê li otela Semîramîs bi cîh bûm. Li otelê me çend saetên xweş û geş bihurandin, Memdûh Selîm î ku kalekî li dor heyştê salan bû, ji temenê xwe gelekî ciwantir xuya dikir, zilamekî çavgeş û zindî bû. Memduh Selîm ji min re got: "Ji mêj ve min şevbuhêrkek welê xweş nebuhurandîye." Ew yek ji têkoşerên kurdên bakur bû, penaber bûbû, hatibû li Sûrîyê niştasih bûbû. Jiyanekê feqîrane derbas dikir. Li kitêbxaneya wî, her çi tiştêkî behsa kurda tê de hebû û bi dest wî ketibe, li wir diparast. Ji naçarî jineke tirk mehr kiribû û ji vê jî nerehet bû. Ji ber vê jî wexta xwe zêdetir li kitêbxaneyê derbas dikir. Bi axîn digot "ku ez rojekê bimrim, ev hemî çavkanîyên ku min bi xwîna dilê xwe peyda kirine, wînda bibin".

Min dixwest ku *Korî Zanyarîyî Kurd* vê kitêbxaneyê jê bikire. Ji bo parastina kitêb û nivîsarên ku tê de bûn û him jî ku ev pere di dawîya jiyanê wî de bi kêrî wî bîn. Lê hewldana min bêsûd ma. Heqîqetê jî gotinên wî rast derxistin, piştî çendsalekî dema ku mir, kitêbxaneya wî berteref bû.

Necmedîn Buyukkaya (1943 - 1984) ku ji nêzik ve Memdûh Selîm Beg nas dikir, gelek caran çûbû mala wî, serdana wî kiribû. Di derbarê

kitêbxaneya wî de nivîsiye: "Min xwest kitêbxaneya wî bikirim. Lê jina wî pir entike derket. Min çar hezarê Suri tê da, ne da. Xwest ji nav hin tiştan derxine hîn bide min, min qebûl nekir û ez hatim. Ku min bigirta YNK dê pere bida min. He- ta pênc hezar dan min jî. Lê ku em li hev nehatin. Min pereyên wan bi şûn de vegeandin."

Sala 1969an de Qedrî Cemîl Paşa (1892-1973) bi nasnavê Zinar Silopî, kitêbek jî 255 rûpelan bi tirkî, bi navê *Doza Kurdistan*, li Berûdê çap kiriye. Qedrî Cemîl Paşa yê ku dost û hevalê Memdûh Selîm Beg bû di vê kitêbê de, di çend cîyan de, behsa xebat û rola wî di bizava rizgarîxwazîya kurd û Kurdistanê de dike. Ji bo ewleyîya wan kesên ku di komele û rêxistinên kurdî de kar kirine, hemû hûrgulî eşkere nekirine. Di gel wê jî bi qandî ku mimkin bû hin rastî bi kurtî destnîşan kirine. Di wan cîh û rûpelên ku xwestiye behsa girîngî û rola xebata wî bike, carna ew bi nasnavê Iskender Beg (r.107, 178, 255) û carna jî bi navê wî yê rasteqîn Memdûh Selîm an jî Memdûh Selîm Beg nivîsiye (r.28, 37, 39, 59 û 60). Di dawîya kitêbê de welê sipasîya wî dike: "Di dawî de ez sipasîya birayê xwe î ezîz Iskender Beg dikim ku bi tebînî û

şiroveyên xwe ên giranbuha kêmasî û xeletiyên kitêbê berteref kirine, ew jî ew kes e ku bi dirêjahîya şêst salan bêwestan xizmeta rizgarîxwazîya miletê kurd kiriye.”

Mehmed Uzun (1953-2007) di sala 1989 an de romanek bi navê *Sîya Evîne* nivîsiye. Di vê romanê de jiyan, kesayetî û tekoşîna Memdûh Selîm Beg kiriye mijara sereke, bûyer û kesayetiyên wê demê jî bi şêwazekî fantazîya edebî hûnandine. Bi salan bû ku min di derbarê jiyan û kesayetîya Memdûh Selîm Beg de agahdarî kom kiribûn û romana *Sîya Evîne* jî xwendibû, çend car fersenda min çêbû ku li gel Mehmed Uzun rûnim. Di van hevdîtinan de me, behsa jiyan û kesayetîya Memdûh Selîm Beg û naveroka romana *Sîya Evîne* kir. Yek ji van hevdîtinan roja 30/03/2006 de bû: di van sohbetên me de, ez gihiştim wê qenaetê ku

Mehmed Uzunî nexwestîye hemî kesayetîya Memdûh Selîm Beg bi rasteqînî di romanê de vehûne. Tenê bi qasî ku bi kêrî romaneke edebî bê ji serpehatiyên jiyana Memdûh Selîm Beg îstifade kiriye. Ez vê ronkirinê jî bo çî dibêjim: ji ber ku di çendîn gotar û lêkolînan de romana *Sîya Evîne* weke jêder û çavkanîyeke biyografîk tê destnîşankirin. Lewra, ku divê em bizanin faktayên dîrokî û edebîyat du tiştên cuda ne û nabe meriv têkilhev bike.

Memdûh Selîm Beg salên dawîn ên jiyana xwe bi hejarî û tuneyî derbas kir. Perên teqawidîya wî têra debara wî û malbatê nedikir. Di gel vê jî, mirovekî nefsbêz, bi şikir bû û bi vê jiyana xwe ya asayî razî bû.

Paşnîvroya 25/07/1976 an de, li Şamê koça dawî kir û li goristana Şêx Xalidî Neqşibendî li taxa kurdan veşartî ye.

Çavkanî:

- 1- M. Emîn Bozarslan, *JÎN*, Cild 1, 1985; Cild 2, 1985; Cild 3, 1986; Cild 4, 1987; Cild 5, 1988, Weşanxaneyê Deng, Swed, Uppsala.
- 2- Necmettin Büyükkaya, Kalemimden Sayfalar, Hazırlayan ve Derleyen: Şerwan Büyükkaya, Stockholm, Apec-Tryck & Förlag, 1992.
- 3- Îzeddin Elî Mella, Taxa Kurda li Dimeşiq - Dinavbera sala 1250 - 1979, Çapxana Aso, Bêrût, 1998. (Be zimane Erebi).
- 4- Zinnar Silopî, Doza Kurdistan, Çapxana Stewr, Bêrût, 1969.
- 5- Qedri Cemîl Paşa (Zinnar Silopî), Meselet Kurdistan, Çak-kirdin û Peşeki-nivîsin: Îzeddin Mîstefa Resûl (Dr.), Bêrût, 1997. (Be zimane Erebi).
- 6- Zinar Silopî, Fî Sebil Kurdistan, Tercume: R. Alî, Kawa Förlaget, Stockholm, 1987.
- 7- Malmîsanîj û Mehmûd Lewendî, Li Kurdistanê bakur û li Tirkîyê rojnemegarîya kurdî (1908 - 1981), Weşanên Jîna Nû, 1989.
- 8- Kurd Wani (Memdûh Selîm Beg), Tarih Huzurunda bir Tashih, Diyarîyî Kurdistan, Kovar, Bexda, hejmar 7, 18/06/1925, r. 40 - 43.
- 9- Nameya Konê Reş derbarê biyografiya Memdûh Selîm Beg de (bersîva Konê Reş bo min 08/04/2005 ji Qamişlo nivîsiye û bi reka e-maile ve rê kiriye).
- 10- Mehmed Uzun, *Siya Evîne*, Weşanxana Orfeus, Stockholm, 1989. (Roman).
- 11- Mesûd Mihemed, Geştî Jiyanîm, Çapa Sêyem, Kurdistan, Koyî, 2009.

Çîrokeke almanî ji yên Grimm

Wergera ji almanî: Nuh Ateş

nuhates48@gmail.com

Gur û heft karik

Bizineke pîr heft karikên xwe hebûne. Mîna her dayikeke ku ji zarên xwe hez dike, bizinê ji karikên xwe gîştikan hez dikirîye. Rojekê, berî ku ew sewa peydakirîna yê here daristanê, wê bange her heft zarokên xwe kiriye û gotiye: „Zarokên delal, ez dixwazim herim daristanê, ma we hay jê xwe hebe, xwe ji gur biparêzin! Eger bikeve hundir, ew ê we bi çêrm û heştîyan va bixwe. Ew zîyankarekî bi sêhir û fenbaz e û pir caran çehrê xwe diguhere. Hûn ê wî di dengê wî yê ketî û lingên wî yên reş ra hema nas bikin“. Karikan gotine: „Dayika ezîz, em ê miqete xwe bibin, hûn dikanin bi dilrehetî herin!“ Bizinê kiriye mizemiz lê bi teselî bi rê ketiye.

Pir neajotiye kesekî li deriyê malê xistiye û bang kiriye, gotiye: „Dêrî ji hev bikin zarokên delal dayika we hat û ji her yekî ji we ra tiştek anî!“ Lê karikan di dengê wî yê ketî ra nas kirine ku ew gur e û gotina: „Em dêrî ji hev nakin, tu ne dayika me yî, dengê wê

narîn û xwaş e, lê dengê te xizokî ye, tu gur î!“

Gur çûye ba çerçîyekî û jê parçeyek gêç î gir kiriye. Wî ew xwarîye, pê dengê xwe zirav kiriye, dûv ra şûnda vegerîye, li dêrî xistiye, bang kiriye û gotiye: „dêrî ji hev bikin zarokên hezkirî, dayika we hatiye û sewa her yekî ji we tiştek anîye!“ Lê belê gur lingê xwe yê bi pirç daye ser pencereyê, zarok vê dibînin, bang dikin û dibên: „Em dêrî ji hev nakin, lingê dayika me ne mîna yê te reş e, tu gur î!“

Gur bi lez çûye ba nanpêjekî û gotiye: „lingên min li derekê ket tozikek hevîr tê bide!“ Ku nanpêj hevîr di lingên wî daye şûnda, gur çûye ba aşvan û gotiye: „Tozikek ard di lingê min bide.“ Aşvan xwe bi xwe gotiye, gur diwaze wî bixapîne û daxwaza wî bi cih neanîye. Lê gur ji aşvan ra gotiye: „ku te bi gorê min nekir, ez ê te bixwim!“ Aşvan tirsîyaye û lingê gur bi ard sipî kiriye. Aha, însan weng in.

Gur cara siseyan çûye ber deriyê

mala karikan. Wî dêrî kutaye û wer gotiyê: „Dêrî ji hev bikin zarokno, dayikina we ya ezîz hatiye mal û bi xwe ra ji daristanê boyî her yekî ji we tişteke anîye!“ Karikan bang kirine û gotine: „berê tu lingê xwe bi me binimîne, sewa ku em bizanin ka tu dayika me ya ezîz î!“ Gur lingê xwe dayiye ber pencereyê û gava ku wan dîtine ku lingê wî sipî ye, hingê ew bawer dikan tiştên ku wan bihistî gîşt rast in û dêrî ji hev dikan. Lê yê ku ketibû hundir gur bi xwe bû.

Dil li karikan qetiyaye û wan li ber xwe dayîne ku xwe veşêrin. Yekê xwe avêtiye bin maseyê, ya duyemin ketiye nav nivîna, ya seyemîn ketiye sobeyê, ya çaremîn xwe avêtiye mitbaxê, ya pêncemin ketiye dolabê, ya şeşemîn xwe kiriye bin destşoke û ya heftemîn jî xwe di kodika saatê diwêr da veşartiyê. Lê gur ew dîtine û bêteredut yek bi yek daqultandine. Wî tenê piçûktira wan ya ku xwe di kodika seetê diwêr da veşartibû, nedîtîye. Gava ku wî zikê xwe têr kiriye şûnda ew êdî ji wir bi dûr ketiye û li derva, li bin derakê li ser merga hêşin xwe dirêj kiriye û ketiye xewê.

Pir neçûye, bizina pîr ji daristanê vegerîye mal. Mala min ê, çi bi ber çavên wê neketiye! Deriyê malê li ser piştê vekirî bûye. Mase, qenepe

û sendelî wergerî û belawela bûne. Destşok şikestibû û parçeyên wê li vir û wê belav bûbûn. Lihêf û balîf ji ser nivînan hatibûn kişandin û her yek li derekê bû. Ew li zarokên xwe gerîyaye, lê raste wan nehatiye. Wê navên wan heldidaye lê tu kesî bersiv nedidaye. Nihayed, gava ku wê navê ya piçûktir heldaye, dengêkî nazik gotiye: „Dayika ezîz, ez di kodika seetê diwêr da me.“ Dayikê ew ji kodikê viderxistiye û wê ji dayika xwe ra kat kiriye û gotiye, gur hatiye û karikên din xwarine. Dayik pê ragêriyaye, hûn ê bikanin tesewir bikin ku ew çiqas bi ser zarokên xwe yê bextreş da gerîyaye.

Nihayed ew ji mal bi feryad viderketiye derva û karika piçûk jî bi wê ra meşiyaye. Gava ku ew hatiye ser mergê, gur li bin darê ketibûye û ji ber xorexora wî guliyên darê dilerizîne. Wê ji her aliyê da li wî vênariye û tê deraniyê ku di zikê wî yê tijî da

tişteke dilive. Ax Xwedeyo, wê xwe bi xwe gotiye, zarokên min yê xizan yê ku wî wekî xwarina êvarê dakultandibûn, dibe ku hîn ew xwaş bin? Gerek bû ku karik bimeşîya mal meqes, sênex û şûjin bianîya. Paşê dayikê hûrê wî cenewarî birîye û çêlê karikekê serê xwe viderxistiye û gava ku dayikê birin dewam kiriye her şeş

karikan di pey hev va ji zikê gur baz-
dane derva û giştik xwaş bûn û çima
ku gur ew ji ber çavbirçitiye daqul-
tandibûn, wan tu zîyan nedîtine.

Ev çi xenêbûnek bû! Wan dayika
xwe hembez kirine û baz didane mî-
na ku bibêji ew ê li şahîya dawetekê
bûn. Lê dayikê gotiye: „Aniha he-
rin û kevir û kurçikan berhev bikin
û binin, em ê wan biavanin zikê vî
heywanî bêxwedê, hîn ku ew bi xwe
nehesîyaye.“ Her heft karikan bi le-
zûbez kevirûkurçik kaşkirine anîne û
viqasî ku pê kanîne ew rind avandine
zike gur. Dûv ra dayika wan pir bi lez
zikê gur dûriye û girtiye, wî hay jê
nebûye û ew qet neliviyaye.

Gava ku têr raketiye şûnda gur
rabûye ser lingan. Kevirên di zik da

pir tîna wî radikirine û lewma wî
xwastiye ku here ser kanîyekê û avê
vexwe. Lê wexta ku wî hewl daye
ku bimeşe û xwe virda û wêda hê-
jandiye, kevirên di zikê wî da li hev
diketine û dengê xişînî û şiqînîyê vi-
serdiketiye. Wî bang kiriye û gotiye:
„Ma di zikê min da çi dike xişînî û
şiqînî? Li ba min ku ew şeş karik bûn,
lê niha gişt bûne kevir û kurçik.“
Wexta ku ew gihêştiye kanîyê û sewa
vexwarina avê xwe xwar kiriye, gi-
raniya keviran ew kişandiye nav avê,
ew perîşan bûye û fetisîyaye. Wexta
ku karikan va dîtine, bi lez hatine ba
wî û bi dengê bilind wengina bang
kirine û gotine: „Gur mir! Gur mir!“
û tev dayika xwe ji eşqa ra di dorbera
kanîyê ra govend gerandine.



Di kurmancîya Anatolîya Navîn de guherîna zayenda navan

Mehtab Îdelî

Ziman li ser hin awa û rêzanan ava ye, rêya van rêzanan, rêziman pêş me dike. Rêziman zanîna peyv û nivîsandinê ye, yanê rêzana peyv û nivîsandinê ya duruştir. Rêziman di her zimanên serbixwe de cuda ye. Lê dîsa jî di navbera zimanan de nêzîkatîyeke rêziman jî heye. Di kurdî de rêzimana zaravayên soranî, kurmancî û dimilî cuda ye. Lê mixabin, ji bo ku ziman qedexe bûye, ji aliyê rêziman va heta niha jî pir tişt li gora dema me nehatiye holê. Ez dixwazim îro di kurmancîya “Anatolîya Navîn” ya berfîratî de li ser zayenda navan/navdêran bi çi awayî bi kar tên, bisekinim.

Nav/navdêr:

Peyvên ku tişteki, lawirekî, an kesekî bi nav dike û ji cureyên din cuda dike û ew bi navê xwe nêvnas dibe. Nav xwedî wateyeke berfireh e. Loma jî di warê rêzimanê de “navdêr” tê bikaranîn. Navdêr di xwe de liv û tevgerê nahewînin, bi vî awayî ji lêkeran tên veqetandin. Û dem tê de tune. Yanê pêjna demê ji navan nayê. Ji aliyê wateyî ve navdêr wekî razber û şênber dabeş dibin. Navdêrên şênber wekî serenav, hevenav, komenav... Navdêrên razber jî wekî navdêrên dilovanîyê, nîgaşî, têkilîyan, pîvanan dabeş dibin.

Serenav:

Navdêrên taybet in, yanê bi tenê tişteki, lawirekî, an kesekî bi nav dike. Navên kesan, navên welat, nijad û dewletan, navên ol, ziman, eşîret, navên cî û waran, navên ajalan.

Mînak: Ezdîyatî, Evîn, Kurdistan, Ariya, Dicle, Cizîra Botan, Rojnameya welat, Partîya Azadiyê ...

Hevenav:

Navdêrên gelemper in, yanê tiştên li dinyayê ji wan gellekî hene.

Mînak: Kevan, hesp, bizin, behr, çiya, av, xanî, kevîr, dar, kulîlk ...

Komenav: Navdêrên komekê nîşan didin, tevî ku bi xwe piranîyekê di

nava xwe de di hewînin ji lê wekî yekjimar têne pejirandin. Wek “pez”. Dema em dibêjin; “pezê me” em qala pir pezan dikin, lê navdêr bi xwe yekjimar e, ji bo ku em peyvê bikin pirjimar divê qertafên pirjimarîyê pê ve bikin. Em dikarin çend mînakên din bidin.

Mînak: Pez, naxir, gel û hwd

Navdêrên razber:

Hebûna wan cure navdêran nayê rabihîstin, lê ji hebûna wan tê bawer-
kirin. Ew tiştên hestî ne.

Mînak: Bawerî, xem, tirs, rûmet, azadî, hêvî, daxwaz, dem, hiş, guneh, helwest.

Zayenda navdêran

Zayend di kurmancîyê de xwe bi rîya tewang û veqetandek û qertafên banglêkirinê dinimînin. Di kurmancîyê de zayend bi tenê di rewşa yekjimarîyê de peyda dibe. Her wiha ji bo ku zayend diyar bibe divê peyv an bitewe yan ji veqetandekê bigire. Di kurmancî de du cure zayend hene. Cureyê yekem di hemû zimanên de heye û zayenda biyolojîk e. Ji mirov û ajalan hinek nêr in û hinek ji mê ne. Zayenda duyemîn ji ya rêzimanê ye. Di kurmancî de ji bo navdêrê zayendek heye.

Zayenda biyolîjîk

1). Nêr: Law, ap, beran, dîk, Dijwar (navên jîndarên nêr), robar (avên herikok), kesk, sor, zer (navên rengan dema wekî navdêr bîr bikaranîn; keskê tarî, sorê sêvan), şîr, goşt, zêr, zîv (maden û metal cîwa ne tê de), hejmarên sifir, yek, milyon û milyarê ne tê de hemû jîmarnav, serî, ning, por, rî (organên derve yê laş), çermê maran, şîrê mîhan, goştê berxan (hemû berên ku ji sewalan bi dest dirabînin, hirî, liva, hêk, lorik, toraq ne tê de). Zebeş, qîtî, kundir (Şamamok ne tê de hemû berên bîstên), çiya, çakûç, sitirî.

2). Mê: Keç, jin, mîh, (navên jîndarên mê), mal, ode, çayxane (navên cîh û derên ku meriv li hundir diji), biroş, sênîk, tas (alavên meriv tiştên avî dixê hundir), stêrk, zîpîk, bahoz (ezman û ewr ne tê de hemû heyberên fezayî û qewmînên atmosferî mê ne), erebe, balafir, keştî, otobûs (makîneyên ragihandinê mê ne), sûv, kumpîr, firengî, mewîj (garis, genim, ceh, tirî ne tê de, hemû navên celebên beqleyan, fêkî û sewzeyan mê ne), Asya, Mêrdîn, Kurdistan (serenavên cografîk hemû mê ne), gol, welat, erd, newal, kanî (gund, bajar, welat, erd, cîya, zozan, çem, delav, gir, zinar,

kendal ne tê de hemû navên cografîk), dahol, def, daktîlo (amûrên muzîk û bûroyê giş mê ne), hatîna min, çûna te, vexwarîna xweş, ditîna wî (lêker dema wekî navdêr tîna bikaranîn), sêşem, adar, roj, hefte, meh, êvar, nîvroj, berban (navê roj, meh û salan, danên rojê giş mê ne), mêvandarîya wan, kêmasîya hevalan, mamostetîya wî (Navdêrên ku bi paşgirên mîna , “-î”, “-hî”, “-ahî”, “-ahî”, “atî”, “yetî”, “înî”, “tî” giş mê ne.

Zayenda rêzimanî

Zayenda rêzimanî navdêran di bin-yada xwe de ne xwedîyê tu zayendê ne, lê kurmancan ew wekî nêr an jî mê

diyar kirine. Loma jî hinek zimanzan wê wekî “zayenda derewîn” jî bi nav dîkin. Zayenda van navdêran bi riya tewang û veqetandekan tê nasîn.

Mînak: Dar, xanî, behîv, pêûs, sêv, çiya, welat kêrî, gul, bext û hwd di rastîya xwe de ne xwedîyê tu zayendê ne. Lê di kurmanci de hinek jî wan mê ne, hinek jî nêr in. Xanî, derî, kêrî, bext nêr in. Behîv, sêv, pirtûk, tîr, çek al, mijar mê ne.

Di rêzimana kurmancîyê de, bi riya tewangê zayenda bêjeya nêr û mê de qertafên wekî “-a”, “-e”, “-ê”, “-î”, di kurmancîya Anatolîya Navîn de tîna guhartin.

Mînak:

Kurmancî

(m) Min ji jin(a) xwe re cotek guhar stand.

(n) Mêr(ê) min xwarina xwe nexwar.

(m) Xasîy(a) min êdî pîr e.

(n) Xezûr(ê) min bê gopal nikare bimeşe.

(n) Şal(ê) wî ji min re fireh e.

(n) Şivan(ê) me îro pez li çolê şevîn kir.

(n) Hesp(ê) min qir û enîbeş e.

(m) Pisik(a) me mişîka naxwe.

Kurmancîya Anatolîya Navîn

Min ji jînik(ê) xwe ra cotek guhar stand.

Mêrik(î) min xwarina xwe nexwar.

Xasîy(ê) min (ê) êdî pîr e.

Xezûr(î) min bê gopal nikare bimeşe.

Şal(î) wî ji min ra fireh e.

Şivan(î) me îro pez li çolê şevîn kir.

Hesp(î) min qir û enîbeş e.

Pisik(ê) me mişîka naxwe.

Bêjeyên yekjimar “gwiz”, ”derî”, ” dar”, “mal”, “pênûs”, “helbest”, “sêv” bi alikariya qertafa “-an” dibe pirjimar.

Mînak:

Lawîn gwîz(an) dixwe.

Rojîn derîy(an) vedike.

Azad dar(an) hûr dike.

Hîva li mal(an) digere.

Dijwar pênûs(an) tûj dike.

Arjên helbest(an) dinivîne.

Ciwanên kurd sêv(an) mêxekrêj dikan.

Di kurmancîya Anatolîya Navîn de, bêjeyên yekjimar bi alikariya qertafa “-an” ne bi qertafa “-a” dibe pirjimar.

Mînak:

Lawîn gwîz(a) dixwe.

Rojîn derîy(a) vedike.

Azad dar(a) hûr dike.

Hîva li mal(a) digere.

Dijwar pênûs(a) tûj dike.

Arjên helbest(a) dinivîne.

Ciwanên kurd sêv(a) mêxekirêj dikan.

Çavkanî:

1. Rêzimanê Kurmancî, Samî Tan
2. <https://ku.m.wikionary.wiki/wiki/ferheng>

Qerfo

Stîleke nu ye. Bêhed, bêsansur û otosansur e. Rexne û henek in.
Bêtirs in, lê zik û hîsên kesî naêşînin. Çav û mejo vekirîye.

Seyfi Doğan

dinê dişewitê
ez herim
ber mala xwe pak bikim

mîrovên ku
ala kesk di deşt da
pesnandina sekularizmê dikine

hevalên minê
kurd ji hene
mala te ava be

di vitrînî
kîtêbxanê da
kîtêbên berg zer *Bîrnebûn* 79

gur yarî xwe
neavêja
kamufîlê

piştên peyvan
bi şorên xweş nêşên
barka barka ma here

Quto

rojê xwe avita
paş çiyê
sîh dirêj bûn

bayê payîzî
zirafakî zîz
koziya agir

li ser zinarî reş
dara şîlanê
hêlîne qertal

Seyfi Doğan

agir dada
xwe germ kir
senfonîya pêtiya

zarok
bi golê baranê
xenê bûn

Ey mirov!

Xizan Şîlan

Ez û tu berî deh hezar û sed hezar salan, ji neh mehan carekê me li ser axa Cîhanê çavên xwe vekir. Ne axa min, ne ya te û ne jî ya wî, doh ya me bû, îro jî ya me ye. Ev cîhan ya me hemûyan e, ya bav û dayika min û te ya pîr û kalên me ye. Bi hezar salan wekhevî li ser jîyan em.

Ey mirov, te bi destên xwe parçe parçe kir ev cîhan.

Devê birîneke kûr di kezeba cîhanê de vekir. Were carekê binêre, xweza çiqasî dewlemend e. Axa zevîyan tijî ye bi libên gulgeniman.

Lê ev çi tazîbûn û birçîbûna mez-lûman. Newal û kanî tijî ne bi ava çeman. Lê ev çi tîbûn û zîwabûna lêvan.

Ey mirov, te azadî ji destê min û xwe girt. Axaftin li bindestan qedexe kir. Lê nema tu dikarî tune bikî he-bûna zimanê şêrîn û qedîm, hebûna dîroka kevnar. Te li ser axa pîroz jîyan li min herimand. Axa bi hezar salan li ser jîyam, nema tu dikarî ji destên min bigirî. Gora ku cendekê

min di hembêza xwe de veşartî. Ke-virê li ber serê min hatî danîn û navê min li ser hatî nivisandin, nema tu dikarî rakî û tune bikî.

Goştê min dê bihele, di bin axa gora min de. Dê bibe tovê hêşinahîyê wek kulîlkên gulîstanan bi hezar rengan ji nû ve zîl bide. Li ser qefesa axa zêrîn, li ser çiya û zinaran, li deşt û zozanan dê bipîşkive.

Dîsa dê derbibe ava kaniyan û bi xuşexuşî biherike.

Ey mirov, ez dergûşek çarmehnî di malzaroka dayika xwe de, bi xwîna canê wê ya germ mezin dibim û wek gula kesk û sor û zer dipîşkivim. Di zîkê dayika xwe de serfiraz û azad digirim.

Hewl didim bigihêjim meha xwe yê nehan û bibînim ronahîya cîhanê, bijîm di xweşîyê de.

Ey mirov, tu bûyî kujer, bûyî cina-wirê xwînmij, kefterê harî dirantûj.

Min hê negirtibû pêsîra dayika xwe, hê nemêtibû şîrê spî. Te bombe barand li ser serê dayika min de, te gule berda sîng û berê min û wê. Te

mal li me wêran kir, te em fetisandin,
giyan ji me sitand.

Ey mirovê heramzade, mirina
min ya bi hezaran, li ser çiya û zina-
ran axîn dikişand bi qêrîn û nalînan.
Di bin peşkên barana dijjwar de, li
nav serma berfa cemidî, ling û çok

li min diqerisî. Beden dilerizî, dev
û lêv ditevizîn. Ji ber berjewendî,
dilreşî, hovîtî û bêdadmendîya te
dikim hawar û gazî.

Ma tu çima ewqas xêrnaxwez î?

Tu li ser axa min difirî û bi qedera
jiyana min dilizî.

Ez ê hilweşînim zagonên bextreşîyê
Biqelişînim dîwarê rûreşîyê
Biqetînim zencîra koletî û bindestîyê
Li xwe bibexşînim azadî û serbestîyê
Li bax û gulîstana dîlovanîyê
Bireşînim tovên hezîrinê
Daçikînim dara evînê
Biherikînim ava aramîyê
Bipişkivînim gulên ken û şadîyê
Bigerînim dîlana bextewarîyê
Û
Ez ê dagirim û binoşim
meya eşq û serfirazîyê

Wunda

Li xwe digerê wundayek
Li çileçepên çiyayên berz
Nola teyran daraz diajo li asîman
Vediçirê bêdengîya mirinê
Fena guleyek
Li xwe digere evdalek
Di tûrikê wî de kulmek hêvî
Nola çivîka ji refa xwe veqetî
Li dû qederek wunda
Li asîmanekî bîyanî
Li xwe digere wundayek

Bihara min tu yî

Ku tu kijan demsal bî bihara min ew e
Ezê werim li şaxên te venişim
Ne dibêjim zemherî ne dibêjim tavi
Ezê werim kona xwe li dilê te vedim
Ma ne tu bûyî
Yê asîmanê dilê xwe kirî star
Ma ne tu bûyî
Yê payîz li min kirî buhar
Ma ne tu bûyî
Yê ji êşên min re her şev nobedar!

Berîvan Keskin

Henek/Yaranî

Ferîdun

Axa û Remo

Axa yî li Remo neheqîyê dike, Heqê şîvanîyê wî kêr didê. Sal tîn sal terin, Axa yî dunê xwe digûhêre. Remo jî bi cimaetê re tere goristên. Dema ku cimaet ji goristên vedigere, bi rê da Hesî ji Remo dipirse; "Axê îşev çi biki?"

Remo şorê neke dudi;

"Ê ji ber zêbanîya dev bi çîyê de"

Hes û Remo

Kalekala havînê ye.

Kuçikên lingşewitî yê ji sîyekê direvine sîyekê. Qirikan devî vekirine û zimanî dirêj kirine. Remo yî kerîyê mîhên bi şîr tînê ser mala.

Rîya Remo di ber malê Hesê re derbas dibê. Hesî li sîyê xênî yî runiştîye, lingên ji bin xwe berdane cixarê dikşînê, Remo yî di bin çavan re li Hesê mêz dike. Hesî ji rewza Remo hez nake! "Remo, tê kîngê vê şîvanîyê çîh bilî?"

Remo yî westî ye, bêxew e, tî û birçî ye. Remo yî heta dêv hatîyê!

Remo yî bi xwe û xwe dibê;

"De tu were min û Hesê!"

Remoyî dizane ku Hes ji dêrî nebe;

– Çi bikim Hesê? Dîne gund ê ku li sîyan rûdinin, bêjmerim?

Li ber pêz

Remo û Hes ê li ber pêz in. Serî sibê kerî ji fêzê radikin û hemêlê dawiyê çîyê dikin. Du sê mîyan bi beroşê da didoşin bulxur tevê dikin û xurîniyê xwe dixwin.

Hesî henekbaz e. Hesî dibê; "Min bi xewn dît ku ez û rîsipîyêk li kevîyê çemekî bûn. Me piştên xwe dabûn darên sêvan. Her çeşît meywe habû. Dilê me çî dixwest me ew mêwe dixwar. Çem di kelekê me re zelal û zelal diherikî û avê xwe yê şîrîn bû. Meşrebên me yê ji zêr û zîv bûn. Dema ku em tî dibûn me destî xwe dirêj dikir û meşrebî xwe tiji dikir. Em ketibûn sohbetêke tîr."

Remo mat û mat li Hesê dinêre.

Hesî ji Remo dipirse:

– Te jî bi xewn dît?

Remo yî difikire, bêm û nebêm!

Hesî mêz dike ku Remoyî dudilî ye, î isrer dike.

Remoyî berjêr û berjor mêze dike û ê bin zimên dibê:

"Xewnê min ê doxînsist bû"

Helbest:

Ji malê dûr

Min çavên xwe vekir
Ketim nav dewranekî
Bextreşî hevrêyê min e.

Mirov min nas nakin
Ez vê welatî nas nakim
Sirgûntî nasnameya min e.

Jê bûme, ji kokê
Dem diçe û dide jibîrkinê
Bîrnebûn karê min e.

Derewan derdor pêçayî
Li dinyayeke xapînok
Heqîqet li ruhê min e.

Gur û çeql li dora min in
Navbera me de Çîyayê Xelîkanê
Çîya hevxiwîna min e.

Nabin mirov, nikarin bibin
Mirovahî ji bo wan bûye listokek
Mirovbûn para min e.

Min hewisî û ez gihêştim
Qelem li destekî, xençer li destekî
Êdî rizgarbûn qedera min e.

Rojvan Enes

were komê

xopanê dinê bişewite
gemar û qilêrî ye
şev yek e
diz hezar e
ciwanên te
yek bi yek û bi komasîyê ve
hedefên neyaran e
axa te agir û pêtî ye
were komê
vegere ser kokên xwe
çavên mîtra ma rîya te ronî bike
hişê vohu manah ji we (te)re bi rehber bin
rîya we ê dirêj e
xwedanê sebrê bûye mîrê misirê
dizanim
hûn ê mêrxas in û egît in
bi kêreke qo
hûn ê li ber ordîyekê bisekinin
lê dem ne ew dema ye
dinê di dest
barbaran, despotan
û tîranan da ye
ew pêxember bin
ê ayetan ji kurdan veşêrin
li bazara borsê
ne sondên dînan
ne jî peymanên bi devkî û nivîskî
qedr û qîymetên xwe hene
sifra xwînxware ye
mezbeha gelên bindest
û dewletên xizana ye
were komê
çiyayên piştên xwe didin piştên hevdu
berve ezman bilind dibin

Seyfi Doğan

Şare ew jin e ku li ser mirîyan bi melodîya dengê xwe, bi şîn û girîyê xwe re xweşgotinan li hev tine û davêje ser ewî kesê mirî. Ev fenomen weke edet û marîfet di serdema antik de jî hebûye: li rojhilata navîn, di nav kurdan de, li cem grekî û romayîyan jî hebûye. Herweha piştî wextekê ev hunera şaretî û şarebûnê li gelek deveran û di nav kurdan de jî dibe weke kar. Û kesên ku evî karê şînê dikin, bi navê şare li hinek deveran dibe karê debara rojane û parçeyek kulturî. Bi swêdî dibêjinê “gråterska” Heta salên şerê duduyan jî li Swêd û Finlandîyayê ev karê şaretîyê hebûye û dûre nemaye. Lê îro li Helsingforsa Finlandîyayê komeleyeka wan jî heye û dixwazin ev kultura şaretîyê wenda nebe.

Baş nayê zanîn ka li Kurdiştanê li dereka din ev kultura şaretîyê maye an ne, lê li cem me kurdên Anatoliya Navîn hîn jî heye. Ew kesên ku nikanin êş û hîsên ji bo trajediya mirîyên xwe der bikin, ew banî van şareyan dikin ku li ser mirîyên wan şînê girêdin. Û şare jî karê xwe dikin: bi heq, bi diyarî, an jî ji bo xatirê kurdûna xwe. Balkêş e, evî karê şaretîyê tenê jin dikin.

Piştî evê ritualê xwedîyê kesê mirî, bi xweşgotin û bi melodîya dengê şareyê êşa xwe sivik, ruhê xwe aram dibe ... û belkî êdî xwe zêde bêkes jî hîs neke.

(Bîrnebûn)



Şare Fata Xelê

Altun Başaran

Her gundekî şareyên xwe hene. Li gundê Altilerê Rewa Mestî Elî Begê, Eşa Hemê, Fata Xelê, ji Omera Ela Rehmê, Eşa Gulê, Besa Gulê, Hîcaza Mile, ji Bêşkardaşê Hela Hemdaşê, Fata Hemdaşê, ji Çoplîyê Zêva Xelê û hîn jî pir in. Min ji we ra çend kes gotin!

Ji vê hejmarê pê de, qesî ku ji min hat, ez a şareyeka ji kurdên Anatolîyê bidim naskirin.

Kesên ku kilamên şîna dibêjin, ji wan ra dibên, şare. Helbet ne hêsan e, herkes nikane kilamên şîna bêje. Fata Xelê ji gundê Altilerê, bi şewata xwîşka xwe ya ciwan û delal ku serberê ve tev çûn, agir bi Fatê

ket û got. Xwanga min a bi navê
Fata Xelê şareyeka bi nav û deng
bû. Fatê kilamên şîna ji mêr û jina
ra distiran.

Dengê Fatê pir xweş bû. Wexta
ku zirava heltîna barê malê eznî bi
cîran û merlixîyê ra parve dikir.

Wek li ba dibên, barî eznîya sivik
şîn şîrîn och aram dikirin.

Dawet û şîn bi vê kilam nabin.

Wexta Fatê deng bi xwe dixist
kesekî ku negîrîya nedima. Ortelix
li zimezim dihişt! Li ser xwûşka
xwe ya ciwan wiha digot:

were were Gulê were
ka mala ku kekê min çêkirî tu dayî berê
xwedê ji pênc sala bi şûn da dergûşeke da xwangê min
ê li xelkê bûye zelbere
gundo, Gulik çinga rind e
ê mîna meyakê xwe daye alî jor î gund e
xwangê min ê mîna zêrî mahmûdî, yıldız li ser e

Gulik bûka malê bavê
ê li goristanî Altîlerê ramedîye
bogirê li bê, enîyê li tavê
eza bi kurbana xwangê xwe kim
cotkeçikên metkê min, Zevê Xelê
sondxwarî ne di destî hev da li malê bavê

Gulik keçka Êma dînê
şerê felakê yê di taldî sancîya da li xwanga min têxîne
feleka malavayê
carekê misadeke
dergûşa koçnekirî ma bimêjîne

ji herdê xelkê mirî bûkek e
ji herdî min piştazîya kekê min î siwara ser mehîne
siwarî xwengê min î ketê rê va
bi cankurtlanê giran giran li qornê têxîne
î bi çoka dikeve herdê î li xwe va atirî ye
Gulê ji xwe bi şû va hiştîye
dergûşeka koçnekirî

Jimmy Tulpan

Nivîskar: Göran Tunström

Ji kitêba *Det sanna livet*

Werger: Hesenê Metê

Peyk bi peyk ez li kêleka Erbab bi wî re digeriyam. Carina li valahîyê xwe dida erdê û nika xwe dihavêt.

Min jê re digot:

– Ka tişteke bi ber nîkê nakeve, o Erbab.

Wî dixwest ew wusa bi nav bibe.

Bersiv dida û digot:

– Ji xwe wersir jî ev e.

Tiştên dûrî aqilan dikane meriv gelekî narihet bike. Carekê me nêzîkî li peykeke rengîn kir. Min gotê:

– Ev çi cîh e!

Erbab î ku kêman caran guhdarî dikir, welê dizanî ku min îşareteke pirsê li pişt "e"yê bi cîh kir. Loma bersiv da û got:

– Ev der dunya ye. Jiyan e.

Min bi mereqdarî gotê:

– Jiyan çi ye?

Lê ev îşareta pirsê jî min ji kubariya xwe pê ve keland û dûre min lê zêde kir û gotê: ez dixwazim hertiştî bibînim!

Erbab got:

– De ka tu ji bo min nan peyda bike, ez ê ji te re vebêjim.

– Û nan çi ye?

Di wê gavê de xweşbêhneke xurt ew valahîya dagirt.

– Xwe li evê bêhnê bigire û biçê. Ez li vir dipê.

Bi rastî jî wî gelek ji van hunerên sehîrbazane dizanibû. Û herweha wî ez pijiqandim û ji wir bi dûr xistim. Dûre xwe da erdê û dîsa nika xwe havêt.

Dema ku ez nêzîkî Dunyayê bûm, tişteki seyr qewimî: ez bi tişteki ve giran bûm ku dûre navê "Laş" lê danîn û her welê bi lêv kirin. Belbî jî eva ji babetan babeteke nexweşîya birovê ye. Meriv jê şermazar diket û hiş li min giran dikir. Dibe ku ev jî sedemek bû ez pê ber bi jêr ve daketama û têketama "atmosferekê". Pêşîyê ez çend caran li dora xwe çerx bûm û paşê hîn bûm ku bibînim. Dunya heta ber devê xwe tijî bû: Cemedankên xirabe, baxçe, pêşgîr, blanket, camên reşotankî, benzînxane, makîneyên teriqandina nan. Tişteki ku tunebûya tunebû! Li Jupîterê ne welê bû, ji makîneyên teriqandinê yek jî tunebû, na belbî jî hebû, baş nayê bîra min. Çend tişt li ser dezgehê aşxaneyê bûn, hinek li daristanan û

hinek jî di serê xelkê de bûn. Ya rastî tiştên ku di serîyan de hebûn, ji yê der zêdetir bûn. Di wan de argûn û balafirgeh, rojname, makîneyên dirûna gîyê, şer, ommelet hebûn, lê serî ji ommeletan piçûktir bûn. Rojekê rasterast ez ji jor ve ketim erdê û min dest bi bêhnvedanê kir. Dema ku min bêhn vedida, dîsa bêhna ewî nanî ber bi min ve dihat.

Sibeheke zû bû. Dema ku mij û ximam hinekî sivik bû, min dît ku ez li peravê rûbarekî me û ji aliyê din î rûbarî bêhneke xweş difûriya. Ew kaş û kendalê ku hêj bi şilî û nedawa rojê bû, ez jê daketim jêr û min xwe berda nava avê, av di binê min de li hev digeriya. Gelek laşan li ber tava xewirî û di wê avgera xurt de kincên xwe dişûştin, deng ji şonikên wan bilind dibû, kincên xwe li ser keviran radixistin û bi gelek rengan çirûsk vedidan. Komek masiyên zivînî di nava çipên min re dibiriqîn, pelapîtikên reş li dora serê min çerx dibûn û ev hemû tiştên ha min ji nişka ve û ji ber evî "Laşê" nû dizanîbû. Li hêla din jî meydana hebû. Meydaneke mezin, meydanake jar, bi darên hişk û deviyên vemirî. Di rûyê erdê re ber bi pêş û paş ve laşek diçû û dihat.

Min got:

– Tu çi dikî?

Deng bi Laş ket û got:

– Ez cot dikim.

– Çima?

– Ji bo ku ez bikanim çandinîyê bikim.

– Tu ê wê çi bikî?

– Ji bo ku nan jê derxim.

– Baş e, min gotê, wê çaxê ez ê li vir bipê.

Laş got:

– Ew ê gelek wextê bigire.

Min pirsî û gotê:

– Wext çi ye?

Got:

– Welê diyar e tu yekî dîn î.

Min got:

– Ma çênabe ku meriv yekî dîn be?

– Belê, çawa.

Min got:

– Wê çaxê bibêje ka wext çi ye?

– Wext, got, dema ku ez li ser na-fikirim dizanim bê çi ye, lê dema ku ez li ser difikirim ténagêhijim çi ye. Ez bi xwe jî dînekî bi têra xwe me.

Min got:

– Lê ne dînekî bi qasî min.

– De tu jî gotinên vala meke, got û textebenkek dewusand hundurê devê xwe, textebenkeke bi têra xwe qelew bû. Anuha wexta şivê ye, ka navê te çi ye?

Li ser evê yekê nefikirîbûm. Lê Erbab tiştêkî welê fêrî min kiribû.

– Ew sor î ha çi ye?"

”– Ji wê Tulpanê re dibêjî? Ew Tulpan⁽¹⁾ e.”

”– Lê ew î ha?”

”– Hesp? Ew Jimmy e.”

– Belê, min gotê, navê min Jimmy Tulpan e.

A wê çaxê ez hatim hundurê Malekê. Dîwar, Ban, Raxer, Mase û Sandalîyên wê hebûn, Derîyekî wê jî hebû ku li pişt min hate girtin. Cih li min teng bû û giranîyeke mezin bi min ket. BI QASÎ SED Û PÊNCE KÎLOYÎ, di serê min de got, ji ber ku li pêş min laşekî gelekî seyr û bi çavên mezin sekinîbû. Di destekî wê de xweşbêhnek hebû.

– Ez Jimmy Tulpan im, min gotê û min bi destan jî xwe nîşanî wê da, ez ber bi wê ve çûm, di ser ewê xweşbêhnê de xwar bûm û min gezeke xurt li dorê xist, heta ku bêhn têde hebû min cût û min hinekî din jî xwest.

Lê wê got:

– Ev nanê dawîn bû û qediya. Û eva ne ji bo te bû, Jimmy Tulpan.

Min pê dizanîbû lê min ji bîra kiribû.

– Ne ku min, lê laş ev tişt xwest. Û laş hinekî din jî dixwaze.

Û laşê min bi laşê wê bû, pir û pir

westiya û ewqas mezin bû ku diviya bû ez jê pirs bikim:

– Ma te jî navek heye?

Wê got:

– Samantha ye, lê ez nizanîm bê çima.

– Ez dixwazim te bibînim, Samantha.

– Erê, got, lê palikên çavên te heta nivî girti ne.

– Dibe ku ji ber evê yekê ye.

Wê çaxê wê xwe ji nava wan tiştên bi navê kincan derxist û Tazî rêya Nivînekê rohnî kir. Li ber ronahîya wê min jî xwe tazî kir.

Min got:

– Ma tu hertim mîna xwe ya nuha yî?

– Kesekî ev yeka mereq nekiriye û ez bi pîrsa te nizanîm.

– Li jêra çoga te şûna birînekê heye.

– Em ji warên cîhê û cuda tîn, birînen me hene, em wan bi xwe re digerin. Anuha divê em westa xwe bigirin.

Wê xwe bi min ve şidand û ew hemû deverên ku bi navê Jimmy Tulpan bû, wê destê xwe lê peland. Tilîyên xwe hêdika li ser der û hundurê Jimmy Tulpan gerand, dema

¹ Tulpan: Bi swêdî tê maneya laleya kurdî, an jî laleya farisî ye ku bi tirkî jî dibêjinê lale. Ji ber ku di vê novelê de *Tulpan* tenê weke nav bi kar hatiye, ez ê jî neguherînim û wê weke nav bi kar bînim. Û herweha *Jimmy* jî li rojava navekî edetî ye. Lê meriv evî navî ji bo hesp, pisîk û kuçikan jî dikane bi kar bîne.

ku wan tiliyan mîna tava serê sibehê
sîng, mil û çîpên wî tevdan, a wê çaxê
li ber Jimmy Tulpan hemû tiştan reng
li xwe veguhertin, bû tarî û bû ronahî,
kelegerm û hênîk bû û hertişt bi carekê
re li Jimmy Tulpan çêbû û bû Ez û Tu.

Çîroka Jimmy Tulpan û laşê wî
welê bû.

Li derveyî me qurtequrta dengê
kevok û papaxanan, berbang ji hev
diqelaşt û dunya şiyar dikir. Û li
dunyayê bi çarşefên kesk û sor jin
hebûn, li nava zevîyan digeriyan, li ser
çogan rûdiniştin û paliya birincê diki-
rin, dikutan û ka û kapol jê dineqandin,
dikenîyan û dengê xirxalên wan bilind
dibûn. Li dunyayê mêr hebûn, garanên
gamêşan ji gund derdixistin, li dunyayê
agir û dengê avkêşên ser devên bîran
hebû, dema ku ji cîh dilivîyan çireçira
dengê gironekên gerdûmên gamêşan
hebû. Li dunyayê kergeden hebûn ku
bi şev diketin nava zevîyên şelîman û
dengê zingên nobedaran ji kozikên
bircên wan bilind dibû, li dunyayê
bêhna dareke hejîrê hebû, dara ku di
ser pencereyê de ditewiya û dixwest
têkeve hundur.

Samanthayê got:

– Pêşîrên min zarokekî divê.

Min gon dayê.

Şevêkê za û zarok çêbû, me pîroz

kir û kêfa xwe pê hanî û dûre wê got:

– Anuha demek li me buhurî.

Wê zor da min ku ez ji ser evî baxê
sîngûberî rabim.

Min got:

– Maneya evê yekê çi ye?

Wê got:

– Divê tu dakevî nava zevîyan, Jim-
my Tulpan, zarokê te nan divê.

Derve gelekî bédeng bû. Bûbû ser-
ma.

– Anuha ne wusa bû!

– Lê anuha pir ji mêj ve hebû.

Samanthayê Şev dabû min. Û
anuha jî Roj dirêjî min dikir: Wê ez
bi dara xizan a mirovatîyê ve patrome
kiribûm. Ji laş dûr, li aliyê din tişteki
din hebû ku min ji bîr kiribû û ez pê
dêşiyam, belbî jî vatiniyek. Min xwe
negihande wir. Hemû tiştê ku li vir
hebû, laş bû, karûbar bû.

Tiştên ku yên din didîtin, min jî ew
didîtin. Dewarên ku berî berî rêyan ling
li dû xwe dikişandin, berateyên wan ên
ku bi çogan diçûn toza erdê û careke
din ranedibûn, sîsalekên ku vediniştin
ser wan berateyan û ji hestiyên wan
goşt dirûçikandin, mişkên ku li ke-
waran dicivîyan û ew tiştên dawîn ji
dadiqultandin.

Raberdû weke evê palasê li hev
qulipandî ye, palasa ku ez ji bo bêhn-

vedana êvarê bi xwe re dibim binê wê terebînta⁽²⁾ rût ku li hêla din î hişkediwarê gund e.

– Li erdê min tiştêk hêşîn nabe, Samantha.

Ew laş û ew merivbûyîn e ku evê çetiniyê dide, çetiniya ku baranê dipê, nan dipê, çavên jina xwe dipê!

Wek kulilkek ku bi gilîyê xwe ve biçilmise, zarokê me jî bi kulimekên wê ve daketibû, milên wî li ba diket, ji birçîna zikê wî ketibû hev, a herî xirab jî çavên wî: Du deriyên mezin di qes-reke bêkes û bêxwedî de, li wê derê ti bayek li ti darekê rast nedihat.

– Min nan nîne ez bidim, Samantha.

Bi tenê yek merivek bi evan hemû zimanan dipeyive! Wusa xuyabû ku ew gotinên min qet jî ne ji bo wê ne, lê di çavên wê de ji reşikeka xurt teyrek veniştibû, ew ji Birçîbûnê hatibû û em herdu jî reşqelem kiribûn, dema ku destê min li wê geriya, li peykeke mirî sekinî.

Reş û reşotankîyekê girte nava daran û lê belav bû, bêhnvedan li min sivik bû û nizm ket, êvarê dema ku em rastî hev hatin, mîna ku di navbera du peyvikên çirokekê de hişkî nazelal hebe, lê hîn jî ji agirê jiyanê çîkek pê

re mabe, ev jî welê bû. Ev yeka di ewê kêlîka beriya peyva Amîn a lavayê de bû, lavayên ku anuha êdî kêr daran dibin.

Kevirên ku erd nixumandibûn, min ew felqe kirin, lê dilopeke avê jî xwe tê de veneşartibû. Ji Hemêz û Birinca Xweş min gotin ber bi Wextê ve virvirand û di wê gavê de hewa ji gotinên kevirbûyî tijî bû.

Çima tu bûyî xwedîyê evê jîrîyê, Jimmy Tulpan, Bîreke dunyayî û Xwejbîrîyeke asîmanî!

Hatineke nerm û xweşik, belê. Narihetîya nezanîyê û kêfxweşîya li peraveke bi xêr û ber.

Lezeta wan gotinên nûzayî, bêguman belê.

Di binê kelekela tîna royê de sîbera avrêla yeka mê, bêguman erê.

Em li ber agirê xwe rûniştibûn û min ji xwe re bi hestîyekî sipî ji hestiyên dewaran, arî tevdida. Lal bû, tiştêk bû ku ji demê derketibû, min ji xwe re got: Ne gengaz e ku meriv ji jiyanê hez bike. Tiştêkî ji vêya zêdetir tune: Erd bi kar hatiye, peyv bi kar hatine, ez bi xwe jî weke kerpiç hişk bûme.

Samantha bêliv e, ji bo Teyrê Birçîbûnê hêlînek e.

² Terebînt: Babetek ji babetên daran e. Latîniya wê *pistacia terebinthus* e. Navdarî û pîrozwerîya evê darê jî ew e ku dema Xwedê bi hezretî Îbrahîm re dikeve galegalê û erdê welatekî beşî wî dike, ew jî radibe tê û li nêzî Hebronê konê xwe di nav daristaneke ji evê dara terebîntê vedigire û li wir peresgehêkê ava dike. Hinek dibêjin, ev dar dara kizwanê ye.

– Li min û bêdengîya min bibore, Samantha.

Belbî jî dereng ketibû.

Lewra ew barana ku ji baranên caran xirabtir dakete xwarê jî, ewê şevê bû. Asîman ji hev vebû û herkesî kire kêf û qêrîn, bîr tijî bûn û dûre jî çem. Em li gorîgeha xwe civiyan û me ji Xwedayan re, ji wan dekorasyonên li perê laşê xwe yên birçî re şikir kir.

Gorîgeh di avê de wenda bû, pêşî li bend û berajan filitî û rê di binê avê de man. Dema êdî herkes gêhîşt ewê bawerîyê ku ev diyarîyên bexşê têr dikin, rabûn hîn jî zêdetir kirin. Ew gundê li ser mitikekî xwe î piçûk, bû weke giravekê. Hinekan dest bi çêkirina kelekan kirin. Pêwîstiyên xwe yên hûr û piçûk tê de bi cih kirin, zarok û kal û pîr jî lê siwar kirin. Dema ku kelek ber bi dûr ve liviya û li dora xwe çerx bû, wan bang kirin û gotin: em ê zû vegerin, em ê ava bikin û ji nû ve dest pê bikin.

Em yên ku li wê derê man, em li ser dara mezin civiyan. Wekîdin tu rêyeke din tunebû. Li nêzîkan, ne çiyayek hebû meriv hilkişê ser û ne jî qûç û birceke ji keviran. Me holik çêkirin, me kir ku em bi parçetextên qezajentiyê serê wan bigirin. Kal û pîran bi keser digotin: "Ya dara diloan,

ma te em hindik caran xelas kirine!" Dareke mezin bû, li jora giliyên sitûr tebeqeyên xaniyan hebûn, weke refekî gabelekên avê şev û roj em li wir ketin lîsê. Xwarin nema. Dûre kal û pîr ketin xwarê, mîna dilopan diketin nava avê, ava ku li jêr li hev digeriya û diçerixî. Laşên mayî pê re zîz dibûn, diherikîn, bi qasekî li derekê asê diman û dûre ew jî wenda dibûn. Û ez, ez î ku hîn Jimmy Tulpan bûm, min mêze kir ku Samantha û zarok herdu jî ketin. Min xwe li pey wan havêt, min destê xwe dirêjî kujê çarçefa wê ya sor kir ku bernedim. Lê min pê re negihand, ez ketim û ji ser hişê xwe ve çûm.

Ez veciniqîm ser xwe û min dît ku Erbab tayê nêçira xwe dikêşe û bi serê nîka wî ve jî ez heme. Wî hêdî hêdî tayê xwe hil kir û weke xwe î hertimî bi deng û tevgereke bêyî bal got:

– Nanê ku min ji te daxwaz kir, ka?

– Nan???

Wî ruhê min î seyr û sivik ji nîka xwe filitand. Min gotê:

– Belê, ez çûm Dunyayê, ez bawer im, û ketim...

Erbab got:

– Erê lo, de tu jî rabûyî çîrokên min ji min re vedibêjî. Ma em gera xwe nedomînin?

Kovara Bîrnebûn

Abdulkakî Xalîsînan

Wa vekir çixirek
Wa go ji fikirek
Wa jî kir xizmetek
Kovar, hûn bîrnebûn.

Tu bû dengê kurmanca
Nivîsandin li gor xwe ra
Tu bû kitêb, mekteb nîce
Kovar, hûn bîrnebûn.

Anatolya Navîn kî ne
Tarixa wana bîne
Lêkolîn şûn dîne
Kovar, hûn bîrnebûn.

Kovar e nivîskar
Pir pir vefakar
Ro û şev xizmetkar
Kovar, hûn bîrnebûn.

Ewropa bû qismet
Kurmanca bikin xizmet
Va jî ma ra himmet
Kovar, hûn bîrnebûn.

Înşallah hîn dewamkin
Nivîskara kêr nekin
Hûn jî me ra sewab kin,
Kovar, hûn bîrnebûn.

Te em derxistin holê
Li Antolyê ortê
Na go çiya, na kortê
Kovar, hûn bîrnebûn.

Kovar tu bi xêr be
Hejmara te pir be
Tu tim jî gir be,
Kovar, hûn bîrnebûn.

Quncikê şagirdan:

Tîyatro

Xostin

Sala xwendinê ya 2016-2017 bû. Ez li Fittjaskolan-Stokholmê mamoştayê zimanê kurdî bûm û 12 şagirdên min yên sinifa neha hebûn. Heft keçik û pênc lawik. Mîna xebata dawîyê ya dersa zimanê kurdî me bi hev re -ji bilî dersên şemayê- ji bo xebitîna li ser beşên cuda yên kultura kurdî projeyek amade kir. Min 8 babetên kulturî yên cida pêşkêş kirin û her du şagirdan babetek ji xwe re hilbijart. Diviyabû di hundirê tatîla zivistanê û heta meha dawîya meha nîsanê her grup li ser babeta xwe lê bikole û di dawîyê nîsanê de encama lêkolîna xwe mîna POWER POINT pêşkêşî sinifê bikiraya. Babetên ku şagirdan wê li ser lêkolîn bikiraya: di civaka kurdî de xwastîna keça-nîşanîdol/dîlan û dawet/sê xwarinên kurdî -şîni- muzîka kurdî û stranbêjên navdar -edebiyata kurdî-

Ji bilî pirtûk û kovarên kurdî yên li dibistanê, dêûbab û malbatên şagirdan, GOOGLE, pirtûkên bi swêdî, pirtûk û tekstên îngilîzî û tirkî,

merivên şagirdan yên li welatên cida dijîn, serkanîyên şagirdan bûn.

Bêguman diviyabû zimanê xebata wan bi kurdî bûya û şagirdên min dizanîbûn ku ya girîng bi kurmancîbûna hevok û cumleyên wan bûn. Sererastkirina rastnivîsîna tekstan me dê bi hev re bikiraya.

Pîştî gelek pirs, guhertin, lêzêdekirin, peyda kirina resim, xwendina tekstan bi dengê şagirdan û munaqeseyan, di meha nîsanê de xebata wan ya li ser babetên wan amade bûn.

Her şeş grupan babetên xwe li sinifê ji bo şagirdên sinifa 7-8 û 9 pêşkêş kirin. Bêguman pir kêfa şagirdan ji vê xebatê re hat. Wekî mîna mosta bêguman ez jî bi xebata wan û bi wan serbilind bûm. Lê balkêş bû, rexne, dîtîna û sihetên şagirdan piştî wê jî berdewam kir û gotin hat ser rewşa malbata di dema xwastîna keça, di dema nîşanî û dawetan de. Şagirda zarî dê û bab û merivên xwe kir. Kêfa her 12 şagirdan pir ji xebata POWER POINTa XWASTINA KEÇA

re hatibû û tim qala rewşa xwastinên ku ew bûbûn şahid, yan bihistibûn, dikirin.

Min pêşniyar kir ku em teksta xwastinê bikine 2-3 perdeyên şanoyê (tîyatroyê) û bilizin. Gişa qebûl kir û me tevde tekst vegerand ser metneka tîyatroyê. Şagirda biryar da, 2 malbat hebin: 1- Mala lawik (zava) û 2 Mala keçika ku were xwastin (bûk). Şagirda hem di dersên zimanê kurdî de, hem li malê, piştî 3 hefteyan metneka şanoyê amade kir. Di destpêkê wek 3 beşan hatibû fikirîn, lê mixabin

bi tenê 2 beş amade bûn. Me her du beşên şanoyê dawîya sala xwendinê, wek beşên pîyesekê pêşkêşî şagirdên zimanê kurdî yê dibistanê kir. Ev metna şanoyê ew metn e ku şagirdên min amade kiribû. Hêjayî gotinê ye ku her 12 şagirdên min jî ji kurmancên Anatolîyê, ji gundên Omera, Celeplî, Yencova, Bulduxê bûn. Zimanê metnê zimanê şagirdan e, me zimanê şagirdan neguherandîye.

Remzî Kerîm (Celal Sönmez)

Mala bûkê

Bûk: Şeval Kibar

Anê bûkê: Rumeysa Bardakci

Bavê Bûkê:

Xunga Bûkê: 1 – Şeval Akcay

Xunga bûkê: 2 – Yaren Polat

Mala zava

Zava:

Anê zava:

Bavê zava:

Xunga zava: 1

Xunga zava: 2

Dede:

3 perde:

1: Mala bûkê

2: Mala zava

3: Xoştin: Mala bûkê + mala zava

Gotinên zimandirêjîyê:

terbîyesiz

bes e

eyb e

tu keçik î

seqet

ozurli

namusiz

pîs

qanser

ez ê bi te va dim

devê xa tev ke

zimandirêj

zimanê te 2 metre ye

tu fedî nakî

kero

kerê

eşek oğlî eşek

Perde 1

Mala zava

Kî dilîze: Zava, anê zava, bavê zava, xunga zava1, xunga zava2, dede, dotmama zava

BZ: Hela werin rûnin, werin. Em mecbûr deng kinî. Va keçka çing e, ter-bîya xa çing e. Çi îş tike. Tere mektewê, nare mektewê. Jinka mala ye ya na. Em mecbûr deng kinî.

AZ: Tu dizanî keçik kî ye. Tu mala Quço nas tiki. Em gî wan nas tikinî lo.

XZ1: Avalê min û li mektewê. Ez û ew aynî sinifê wun.

XZ2: Avalê min wû. Aynî sinifê. (*Alayli deng tike*)

DZ: Avalê min jî bû, nuha bişt salî ye, mîna min

AZ: De tu huşê lêê. Aynî sinifê wûn. Gî dunya mala Quço nas tike.

Keçikê lîse teva kirye. 20 salî ye. Îş digere. Melîke digot îş diye diye. Belkî îş bike. Maaşê xa çêbe.

DZ: Ez dibêm li Mc. Donaldsê îş tike. Nizam ez nizam.

XZ2: Na na, îş nedîye.

AZ: Keçê tu huşê. Mêz ke wala wala, em herin mala Quço, tu li wir devê xa jev kî, ez ê zimanê te jêkim.

(*Lawik tê îçerî*)

XZ1-XZ2-DZ: Tilîlîlîlîlîl zava hat zava hat tilîlîlîlîlîl

BZ: Lawkê min were, were rûne. Te va keçka mala Quço diye ya na?

Z: Erê bobo.

BZ: Li kur, te li kuderê diye.

AZ: (*Qizmîş dewê*) Îca li ku derkê? Ma lawkê te û keçik nehe sala çûn aynî mektewê. Tu hîn va jî nizanî?

XZ2: Nehe sala neçûn aynî mektewê. Delîl diçû sinifa heşta, keçik diçû sinifa pêncê.

AZ: (*Ters ters li keçika xa mêt tike.*)

Dede: Bes e bes e. Wala serê mi teqî. Ez gêj wûm.

BZ: Ez çing bizanim kî bi kêva çûye mektewê. Ka rûne, rûne. Sakîn be tiskî. Niha em ê 3 royê din herin mala Quço. Ka em ê çi hedîye biwin, çi newin. Em mecbûr bizanin. Tu mecbûr herî dukana bigerî, biştinî.

AZ: Ax axx. Hîn tu nizanî merî çi hedîye heyne xoştinê?

BZ: Na wele ez nizanîm. Va cara siftê ez ê herim xoştinê.

XZ1: Merî zêr heyne zêr. Bazin, gerdex, guhar.

AZ: De huşe terbiyesizê, huşe. Zêr heyne zêêêr.

Z: Anê qizmiş newe. (*Ji xunga xa ra dewê*) Keçê tu jî deng meke lêêê.

XZ2: Temam, tamam. Metirse ez ê yardimî te bikim.

AZ: Dînlemiş ke. Zêrek li ba min heye. Ji çeyîza min. Em ê zêrekî û çend paket çikolata ba û taximekî kincê rind û ba biştinî û herin. Tu dixozî ji dukanê mêwe falan jî biştinîm.

XZ1: Waaaaaww. Zêr, kincê biha, çikolata biha, mêwe?

DZ: Tu huşe weee.

AZ: Keçê ez ê bi teva dim haaa. Devê xa tev ke. Terbiyesiz!

XZ1: Merî waqa tişt dolê jî naştinê.

Z: (*Ji xunga xa ra dibê*) De bese lêê.

AZ: (*Ters ters li qîza xa mên tîke*)

XZ1: Temam tamam iiii ihhhi (*Destê xa dewe ser lêvên xa*)

XZ2: Temam tamam iiii ihhhhhhi. Anê tu nizanî va keçka te çi terbiyesiz e. Şi nake devê xa tev ke.

DZ: Erî wala bila şî nake.

BZ: Em kî, em ê herine xostine?

AZ: Tu jî tişteki nizanî. Tu kultura xa jî nizanî. Tu terî tu. Tu bavkê zava yî. Yarabî ya îlahî. (*Serê xa dihejîne*) Tu, ez, Melîke û mênkê xa, birangê min Robîn û jinka xa, mala Hesen gî û va terbiyesiza. (*Li keçka xa mên tîke*)

BZ: Ê lawkê te? Lawkê te neyê?

AZ: (*Dengê xa bilind tîke, mîna qizmiş bûye.*) Te li kur diye zava çûne xoştinê haaa. Te li kur diye, li kur biştiye? Tu hatî xostina min? Na. Bavkê te û anê te û meriyên te hatin.

BZ: Wala neyê bîra min. Ema tê bîra min, anê min nehişt ez werim.

AZ: Hûn ê ji mera tiştê ecer derxin. Zava çima here xoştinê. Eyb e. Xelkê çi bê poşîngê.

Z: Anê ez tixozim werim.

AZ: Na lawkê min, na berxikê min. Anê te qurbana te be (*Serê lawkê xa paç tîke*.) poşîngê xelk ji me ra çi dibên.

XZ1: Xelk çi dibên, xelk çi dibên. Hertim xelk xelk xelk. Çima tu me duşunmîş nakî em çi dibên? Hertim xelk hertim xelk (*Qizmîş tewe*)

AZ: Keçê qanser. Devê xa tev ke. Wala ez ê bi teva dim. Kerê, terbiyesizê.

XZ1: Ez ne ker im, ez ne terbiyesiz im. Birangê min doxrî dewê. Anê tu bi Xudê kî anê ew jî were.

XZ2: Erî, e jî ne terbiyesiz im. Anê tu hertim dewê xelk xelk. Em ji xelkê ra yaşamîş tewin?

DZ: Wala hûn her du jî terbiyesiz in hhhhh

Z: Erê anê. Çi diwe. E jî werim. Vira Îsveç e, ne gundê anê. (*Li bavê xa mês tîke mîna ku yêrdim tixoze*)

BZ: Ez dibêm Delîl jî were. Tişt nawe. Xelk tişkî nabên. Lawik tixoze were, bila were.

AZ: Eyb e lawkê mi, eyb e. Xelk gî bizanin tu hatî. Poşîngê bèn mês ke mês ke mala Hesênê Lalo lawkê xa bir xoştinê.

XZ1: Xelk nabên nabên. Sala çûnî lawkê mala Zeynepê jî çû xoştinê.

BZ: Temam. Perê te heye? Qerta xa mês ke. Wî zêrî derxe. Perê te tunebe, ez ê pere têxim ser hesabê te, so here taximekî kincê rind û 5-6 paket çîqolata biştîne. Poşîngê ji dukana vir mêwe, qola, fanta falan jî biştîne. Gîya hazir bike.

AZ: Perê mi heye. Ema tu jî 2000 qeyme têxe ser hesabê min.

BZ: 2000 qeyme?

AZ: Erî. Tu nizanî kincê rind biha ye. Çîqolata rind jî pir biha ye. Eyb e ez narim çîqolata herzan naştinîm. Belkî ez çend kilo paqlawa jî biştînim.

XZ2: 2000 qeyme kinc, çîqolata, paqlawe. Va keçka qiral e?

Z: Tu pir deng tiki lêê. (*Li xunga xa mês tîke*)

AZ: Tu huşe, kerê tu huşe. Te ez dîn kirim haaa.

BZ: Temam temaaam.

AZ: Tu nawînî. Her tiştî qarişmîş diwe. Her tişt. Tu keçîk î, eyb e deng meke, deng meke zimandirêjê.

XZ1: Temam tamam iiiii iiihhhiiii (*destê xa dewe ser lêvên xa*)

DZ: Wala maşala dedê min genc e. Em mecbûr jinekê heynin, hhhhhh

Dede: De bes e. Torinê min ewlenmîş be. Barbar ne lazim e. E jî bi tenê me. Kes nawê dede tu jî jinekê tixozî, hhhhh

BZ: Bobo eyb e, tu hertim dibê jinik jinik. Çi bûye bi te?

Dede: Çima eyb e? Tu keçkên xa nabîsî. Zimanê xa çar metre ye. Çima eyb e. Ji mi ra jî jinkekê bixozin.

XZ2: Erî dede eyb e eyb e, tu 70 salî yî.

Dede: (Ters ters li torina xa mêt tîke)

BZ: Ya rebî, ya îlahî. De bes e bobo bes e. (*Li jînkê xa mêt tîke*) Ji Melîkê û mêrkê wê ra bê, ji bîr nekin 3 royê din em terine mala Quço. Ji Robîn ra jî bê. Ez ê telefonî Hesên bikim jê ra bêm.

AZ: Temam.

BZ: Ez ê herim rakevim, ez so zû terime îş.

Z: Ez ê herim oda xa. Xewa mi tê anê.

(Bav û lawîk memnûn ji şûnê xa radîbine. Xunga zava Yaren tixoze tîlîlîlî bike, ema şî nake. Gî tîkenine)

XZ1: Anê ez fîstanekî ji xara biştînim. Min li MQ fîstanekî pir pir rind di. Anê, qurban anê.

AZ: Çing e? Qut e?

XZ: Na anê, ne qut ne dirêj. Kesk e. Ema modela xa pir rind e.

AZ: Çend qeyme?

XZ1: (naxaza bê çend qeyme. bi pêçiyên xa gosterîmîş tîke. Didû)

AZ: Du hezar qeyme? (*şaşîrmîş dewe*) Pir biha ye, keçka min. Qubanê.

XZ1: Anê pir rind e. Qubanê anê. Fîstanê min tune. Birangê min ê bizewice.

AZ: Temam ez ê ji keçka xa ra biştînim.

BB: Temam, temîzlixê bikin. Ez jî tiştê biştînim.

XB1: Mal temîze anê. Ne lazim e tu mîna hertim ji serî heta binî temîz kî.

AB: Tu huşê keçê. Tu çi zanî temîzlix çi ye. Kîngê mala te çêwû, tu mala xa temîz ke.

BB: Mês ke. Wexta werin, tu nebê: hediye ne rind in, va çi ye û va çi ye temam? (*Li jîna xa mêt tîke.*)

AB: Va çi ye? Wala keçka mi lîse teva kirye. Înşala yaqînda îşekî jî biwîne. Îş bike. Maş heyne. Hediyên ne rind û hindik heynin, ez qebûl nakim.

XB2: Erî anê, qebûl meke. Çima qebûl bikî?

AB: Tu jî huşê lêê. Ji tera ne lazim e. Tu çima qarîşmîş dewî?

XB1: Doxrî dewê. Çima hediye herzan heynin.

XB2: Wexta Leyla xoştin, bazinek, guştîlek û guhar heynan. Du taxim elbîse û paqlewe, çîqolata hooo pir tişt heynan.

AB: Ez zanim keçka min. Ez anê te me. Wala ez dizanim Melek xanim anê zava temah e. Bavkê xa ne temah e. Ema Melek dunyayê de en birîncî temah e. Wala ez qebûl nakim. Ez ji keçka xa ra bazin tixozim, guhar tixozim, du taxim elbîse tixozim, meres tixozim.

BB: Hoho tu jî. Va xoştine. Ne do le. Ne nîşanî ye. Bazin mazin guhar muhar çi ye? Werin keçka te bixozin, em ê jî sozî bikin temam. Poşîngê wexta nîşanî û dolê zêr bixoze. Ema ne nuha.

DB: Wala serê mi teqî. Keçê rabe rabe, îlaca mi heyne. Hem serê mi hem piştê mi têşe.

AB: Çima keçka te seqet e? Ne jîna mala ye? Maşala wala keçka mi şî tîke 3 mala îdare bike. Çima çi keçka min ji keçkê xelkê hindiktir e?

XB1: Erî. Çima wexta Leyla xoştin pir zêr heynan.

BB: Tu huş be, terbîyesiz.

XB2: Çima bobo doxrî.

DB: Axxx axxx. Mi çi bîrîya nenê we kiriye.

BB: Hala hala. Hûn anlamîş nakin, hûn ozurlî ne yawo. Ez dibêim va ne nîşanî ye, ne dol e... va xoştin e xoştin. (*Dengê xa bilînd tîke.*)

DB: Wala serê min teqî, bile serê mi teqî. Çima hûn barbarê tikinî?

AB: Temam temam, dirêj meke. Me anlamış kir.

(*Bûk tê îçerî. Mîna fedî bike yawaş tê li ser sandaliyê rûtine*)

AB: Were qubanê, were berxika anê xa. Tu weştî?

XB2: Were were xanimê. Em xostina te kat tikine.

XB1: Erî tilililililililî.

AB: Huş be keçê, huş be. Cîranê me bibîsin. Eyb e.

XB1: Çima eyb e. Xostina xunga min e.

XB2: Erî çima eyb e?

AB: (*Ters ters li keçka xa mês tîke.*) Bes e lêê. Duso mecbûr hûn yardim bikini em malê temîz bikin. Poşîngê em ê herin Skerholmenê çîqolata û paqlawe biştînin.

BB: Temam de xêr e însala. Bû dereng, ez mecbûr rakevim, soda zû terime îş. Şevbaş.

AB: Temam tu here rakeve. Ez mecbûr va terbiyesiza ra deng kim.

B: Anê hûn ê çi biştînin?

DB: Ez dibêm mi bîrîya nenê we kiriye. Kes nabîse.

XB1: Ohooo tu çi bixozî?

XB2: Çîqolata, paqlawe, şekir, mêwe, qola fanta hertişt.

B: Anê ez çi li xa kim? Fîştan ya şal?

AB: Keçka min şal eyb e belkî. Fîştanekî dirêj rind e.

XB1: Çima şal eyb e, anê?

XB2: Erî çima şal eyb e?

AB: Nizam, ema fîştan rind e. (*Li her du xungên bûkê mês tîke.*) Mês kin, pir mîvan têne û gî mêrik û jin û kurik in. Mecbûr hûn paqil bin. Pir deng mekin. Ji mîvana ra rind û terbiyelî xizmet bikin. Bavkê we, amcê we rûniştiye, hûn deng mekin. (*Tîşki daweste*)... .. Haaa ningê xa jî danenin ser qoltuxê, ya ningekî ser ningê din danenin.

XB2: Çima anê? Em mîna robota rûninî?

XB1: Erî em robot in. Mecbûr em aîla xa duşunmiş kin. Xelk nebên keçkê mala Quço terbiyesiz in.

XB2: Erî. Deng meke, rind rûne, nexu, meke. Çima kultura kurmanca gî li ser keçka ye?

AB: Huşe zimandirêjê, huşe. Tu ê mi qanser kî qanser. Wala wala wê şevê tu deng kî, ez ê bi te va dim.

B: Anê te negot, ez ê çî li xa kim? Fîştanê min tunene.

AB: Temam keçka min, ez qubanê. Em ê herin Skerholmen ji te ra fîştan biştînin.

XB2: Meres jî. Taxima maqyaj jî.

AB: Temam maqyaj jî. Fîştanekî ji we ra jî biştînim.

XB1: Maqyaj?

AB: Kerê kerê. Nawe hûn xa pir maqyaj kin mîna palyaço her derê xa boyax kin.

XB2: Çima anê em keçik in, em gir bûne. Herkes maqyaj tike.

AB: Temam maqyaj bikine ema ne pir, maqyaja sivik. Ema en muhîm em mecbûr mala xa temîz kin. Xelk nebên mala Quço gemar e, ne temîz e.

XB2: Temam anê tu mereq meke. Em ê malê bikine mîna camê. Her derî temîz kin, rind kin. Parlamîş biwe.

XB1: Erî mîna camê parlamîş biwe.

AB: Aferîm. Keçkê min ez qubana we bim, berxikên anê xa.

XB2: Anê em şî tîkin şeva xostîne çîqolata bixunî? (*Hh h h h h tîkene.*)

AB: Naa. Min ji bîr kir. Berî mîvan bixun. Wexta mîvan tixune hûn nexun. Ez înanmîş nakim Melek xanima temah pir tîşt heyne. Ema hûn mecbûr daştin. Siftê mîvan tixune, paşîngê hûn. Temam?

XB2: Erî anê zavê me temah e. Tililililililil. Çîqolata herzan biştîne tilililililil.

XB1: Tililililililil.

AB: Yawaş yawaş: Eyb e, hûn keçik in, eyb e.

XB1 û XB2 tevda radibine ser xa û govendê tîkinî û dibên: tilililililililil.

Ji klasîkên kurdî

Mem û Zîn & Sîyabend û Xecê

li gel pirtûkên xebatê

Mem û Zîn a Ehmedê Xanî

Ji nû ve nivîsandin: Mistefa Uzun

Îlustrasyon: Wolf D. Köpfer

Weşanxaneya Apecê, 2017

ISBN: 978-91-88333-20-9

Ehmedê Xanî

Ehmedê Xanî yek ji helbestvanên herî navdar yê kurdan e. Weha tê bawerkirin ku ew sala 1651ê li gundê Xanê yî bi ser Colemêrgê ve hatiye dinê. Ehmedê Xanî di jîyana xwe ya kin de pir berhemên edebî nivîsandine. Berhemên ku îro li ber dest in ev in:

Mem û Zîn,

Eqîda Îmanê,

Nûbihara Biçûkan



Sîyabend û Xecê

Jinûve nivîsîn: Mistefa Uzun

Îlustrasyon: Necmedîn Bîrî

Weşanxaneya Apecê, 2020

ISBN: 978-91-88333-67-4

Destana Sîyabend û Xecê yek ji klasîkên folklorê kurdî ya herî bi nav û deng e. Îro li seranserê Kurdistanê, gelek çîrokbêj û dengbêjên kurd, bi gelek varyantên cuda vê destana nemir, distirên û vedibêjin.


Destana Sîyabend û Xecê bi gelek varyantan ve hatiye nivîsîn, fîlmên wê hatine çekirin û wek tiyatro hatiye listin.

Min jî destana Sîyabend û Xecê ji bo zarokan ji nû ve nivîsî.

Di vê xebatê xwe de min pirtûka

Ahmet Aras ya *Sîyabend û Xecê mitolojiya kurdî de destaneke evînî* ji xwe re wekî bîngeh û referens girt. Birêz Ahmet Aras jî pirtûka xwe li ser varyanta dengbêj û çîrokbêj Sebriyê Gundê Xellê (ji Bilanixê) nivîsiye.

Mistefa Uzun





Canbegên Çankiriyê ji gundê Ağzibüyük-1944